Arşîva Bîra Kurdan: Ji Elizabeth Picard gotara; "Li kevîya şer Kurd asta daxwazên xwe bilind dikin!" (Tîrmeh-1985) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Hezîran 2011 - Hejmar 19 www.lemonde-kurdi.com • info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

**Gérard-François Dumont**
Nifûsa cîhanê her ku diçe kêm dibe an jî zêde dibe? Rêjeya zayîn û mirinan îro çawa ye? Metirsîya "Divê em ji teqîneke mezin a nifûsê bitirsin" tê çi wateyê?
▶ R. 6

**Jean-Luc Racine**
Piştî kuştina Usama Bin Ladin, di têkiliyên Amerîka û Pakistanê de derzên çawa xwe dan der? Amerîka, çima ne bawerîya xwe bi Pakistanê tîne ne jî têkilîyên xwe jê qut dike?
▶ R. 16

**Xavier Monhéard**
Dijminên kevin, Amerîka û Vîetnam, piştî sê milyon kuştî, xanîyên wêrankirî û malbatên parçekirî dê bi saya peymanên bazirganîyê karibin bibin dost û hevkarên nû?
▶ R. 18

**Jean-Marie Chauvier**
Li Rûsyayê, peyker û remzên Stalîn yên mayî jî yeko-yeko ji holê radibin; lê nîqaşa li ser wî hîn berdewam e. Civaka rûs, dê di derbarê Stalîn û mîrata wî de çi biryarê bide?
▶ R. 20

**D. Pinsolle - A. Rindel**
Berhemhênanên xelekên televizyonan yên amerîkî, çawa bi rêzefilmên mijarkûr û felsefîk, ji bilî temaşevanên ji rêzê, bala rewşenbîr û xwendevanan jî dikşînin ser xwe?
▶ R. 22

Di vê hêjmara hezîranê de Le Monde diplomatique gelek rûpelên xwe ji bo dosyayeke fireh a nifûs û demografîyê veqetandiye. LMd-kurdî jî di vê çarçoveyê de cih daye gotara nivîskar û lêkolînerê Kurd Osman Aydin ku bi sernavê "Li Kurdistana Bakûr struktura demografîk" nivisandiye (Nivîsa li jêr). Gelo li welatên dêw yên cîhanê ên wek Çîn û Hindistanê û herweha deverên din rewş çi ye? Li alîyekî, li hin welatan tirsa kêmbûna serjimarîyan û li hin welatên din jî fikarên mezinbûna para pîrûkalan rû daye û dide. Nivîsarên têkildar yên dosyayê weha ne: Gerard-François Dumont (R. 6), Isabelle Attané (R. 7), Georges Minois (R. 9), Youssef Courbage (R. 11)

# Li Kurdistana Bakûr struktura demografîk

OSMAN AYDIN *

Struktura demografîk, nexşeya civakî ya 'gen'ên civakekê ye. Têgihiştina struktura civakî ya civakekê, ku li erdnîgarîyeke diyarkirî dijî, bi daneyên rêk û pêk ên demografîk û bi nirxandina rast a van daneyan mumkun e. Daneyên demografîk pêşandina hemû taybetmendîyên mirovan e û ya herî girîng jî karakter û tevgerên gelheyî yên li cografyayekê ne. Di çarçoveya vê gotarê de ev mijar dê werin nirxandin.

## I - Gelhe û karaktera gelheyî ya Kurdistana Bakur

Encamên fermî yên serjimarîya dawî ya li wan 24 bajaran (**), ku kurd lê dijîn û li erdnîgarîyeke blok cih digirin (anku cîranên hev in) weha ne:

| | |
|---|---|
| 1985 | 11.129.594 |
| 1990 | 12.036.243 |
| 2000 | 14.388.784 |
| 2010 | 14.931.904 |

Li dû van encaman, gelheyên di navbera salên 2000 û 2010ê de zêdebûneke gelek kêm tê dîtin. Ev ne rewşek e, ku rastîyê nîşan dide. Sedema sereke ya vê ferqê ew koç e, ku li vê herêmê rû daye. A duyemîn jî, ji ber ku serjimarîya duyemîn (a sala 2010ê) li ser esasê îqametgehê hatibû li dar xistin, encam nêzîkî rastîyê nînin. Sedema sêyemîn jî, ji ber ku hêza lêşkerî, ku ji herêmê hatiye vekişandin, di nav hejmarên dawîyê de cih nagirin û herweha çekdarên hêza leşkerî, ku hîna li herêmê ne, li ser îqametgehên xwe yên li bajarên jê tên hatine nivîsîn. Heger trenda asayî û zêdebûna gelheyê ya li herêmê werin nirxandin, diviyabû ku gelheya herêmê bibûya **16.400.000**.

Dema ku gelheya vê herêmê û ya Tirkiyeyê digel daneyên cur bi cur werin nirxandin û tesnîf kirin, hejmara kurdan jî dikare bê bi dest xistin. Hejmara kurdan, a li 24 bajarên, ku kurd lê dijîn; ya ku li derveyî van bajaran û li derveyî welêt dijîn, kêm zêde wekî **19.970.000** derdikeve. Berfirehîya vê cografya blok, ku kurdan dihewîne, 225.000 km² ye. Gol û bendavên 6.000 km²yî ku li herême ne, di nav vê berfirehîyê de nîne.

## I - Karaktera demografîk a gelheyê

Tevahîya nirxandinên jêrîn li ser gelheya 24 bajarên li vê cografya blok, ku kurd lê dijîn û li ser daneyên sala 2000ê hatine kirin.

**I.1) Belavbûna gelheyê li gor qada jîyanê:** Ji gelheya bajarên kurdan, ku 14.388.784 e, % 57.55 li bajaran û % 42.45 jî li çolteran (derveyî bajaran)

▶ R. 5

**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
**Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

# Paşxaneya xwepêşandanên başûrê Kurdistanê

ARAS SOBER *

Berîya ku em bêne ser naveroka nivîsarê, divê em ronahîyê bidin ser çend paşxane (background) û wêneyên xwepêşandanan da ku xuya bibe bê arîşe û kêşeyan ji ber çi rû dane û çawa berbelav bûne û ber bi ku ve çûne?

"*Em venagerin berîya 17 Sibatê*"... Ev ew helwest e ku hêzên muxalif ên başûrê Kurdistanê; Bizava *Goran,* Bizava *Yekgirtî ya Îslam a Kurdistanê* û *Komela Îslamî ya Kurdistanê* dixwazin bikine destpêka qonaxeke nû ya siyasî li wî parçeyê Kurdistanê.

Hin ji çalakvanên civaka sîvîl berê destûr wergirtibû da ku roja 31.01.2011ê *li Silêmanîyê* li dijî çaresernekirina arîşeya elektrîkê ji alîyê hikûmetê ve xwepêşandenekê saz bikin. Digel wan bûyerên dramatîk ku hatine serê *Tûnis* û *Misir* û hin welatên herêmê, hêvîya wê yekê hate kirin ku di demeke kurt de ev yek di Kurdistanê de jî kar bike. Lê ev hêvî jî zêde nedomîya.

Roja 29.01.2011ê Bizava *Goran* bi serokatîya Newşîrwan Mistefa beyannameyeke 7 xalî ji raya giştî re ragihand ku bi vê yekê krîza siyasî li Kurdistanê şarand û bi riya komeke pêşniyazan bo derbasbûna vê qonaxê, daxwaza bernameya çareserîyê kir. Yek ji wan daxwazan hilweşandina hikûmet û parlementoyê û danîna hikûmeteke hevbeş a demî ya sê mehî bû da ku amadekarîya hilbijartina pêşwext bê kirin û wezîrên pêşmerge û navxweyî û darayî û samanên siruştî bi kesên teknokrat bêne guhertin, ji bo ku encamên hilbijartinê nekevin bin karîgerîya rasterast ya partîyên desthilatdar.

Her wiha di beyannameyê de bal kişandibûn ser dûrxistina rola partîyan di hikûmetê de û vegerandina tevahîya mulkên giştî bo ser mîlaka hikûmetê ku partîyên desthilat dest bi ser de girtine, wekî din serwerîya qanûnan û vegerandina hin ji wan biryaran ku parlamentoyê derxistine ji bo ku cardî bêne nirxandin ku ya herî girîng qanûna xwepêşandanan e. Ev yek bo desthilatê rûbirûbûneke (qayişkêşaneke) mezin bû û hikûmeta herêm xiste bin ceribandineke gelek dijwar li ser danûstandina digel muxalefetê.

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser kaxezê, 21 x 29 cm

Ev beyanname bû sedema tirsa têkçûna rewşa başûrê Kurdistanê ku di dawîyê de xwepêşandana roja 31.01.2011ê ji alîyê sazkarên wê ve hate betal kirin da ku nebe ciyê tundûtîjî û dijwarîyê.

Her du partîyên desthilatdar, *Partîya Demokrat a Kurdistanê* û *Yekîtîya Nîştimanî ya Kurdistanê* piştî beyannameya *Goranê* bi çend saetan civîneke awarte li ser asta serokatîyê saz kir û bi dijwarî li vê helwesta *Goran* vegerand. Medyaya her du alîyan, ya desthilat û *Goranê* dest bi êrişkirina ser hev kir; her ku diçû rewş aloztir dibû. Serbarî vî keş û hewayî, sazkarên xwepêşandana 31ê rêbendanê bangeke nû hildêra bo xwepêşandekê da ku roja 17ê sibatê li *Berderkî Sera* li Silêmanîyê piştgîrîyê li raperîna gelên *Tunis* û *Misir* bikin.

Serê pêşîn xwepêşandan li gor rê û rêzana xwe bû, lê piştre ber bi alîyekî din ve çû ku bû sedema peydabûna rewşeke gelek aloz li başûrê Kurdistanê bi giştî û li parêzgeha Silêmanî bi taybetî; ku bêhtirî du mehan domîya.

Hin ji xwepêşanderan ku piranîya wan genc û nûhatî (herzekar) bûn,

▶ R. 3

www.arsivakurd.org

# Bîrbirineke bêhiş

SERGE HALIMI

Her kî rabe û li ser îmtiyazên olîgarşîyê, hertiştfiroşîya sînornenas a çînên rêveber ên fransî, diyarîyên ji bo bankayan tên kirin, serbestfiroşîyê û meaşên bi bahaneya reqabeta navneteweyî tên kêm kirin, gotineke nebaş bibêje û rexneyekê bike, bi carekê weke *populîst* tê reş kirin. (1) Û bi ser de jî tê gotin ku ev kes bûye *"lîstoka rastgira tundrew"*.

Ji ber vê yekê, gava dadgerîya New-yorkê xwe neda ber qebûlkirina muameleyeke taybet ji bo gerînendeyê giştî yê ***Fona Diravî ya Navneteweyî*** yê ji ber tecawuzekê li hoteleke luks a ***Manhattanê*** tê sûcdar kirin, şirovekarekî li gor dilê çîna rêveber a fransî, siyasî û medyatîk, dilê xwe girt û ji ber *"şideta dadgerîyeke wekhevîparêz"* pir gazin kirin … Wî wekî din ev gotinan li şiroveya xwe zêde kirin: *"Yekane tiştê ku mirov dikare jê piştrast be, ew e ku hestên dij-bijarte yên bi vê sosretê hê gurtir bûne, di hilbijartina bê de şansê qezenckirina **Enîya Neteweyî** ya **Marîne Le Pen** zêdetir dikin."* (2) Parastina "bijarteyan" û siyasetên wan ên li hemberî komeke muhtemel a parsek û pêxwasên bihêrs wê bibe formeke tenduristîyê ya demokratîk… Tirsa ji îslamê, li ***Tûnis***ê deshilata hov û dirinde ya **Zeynel Abidîn Ben Alî** rewa kiribû; ya ji *"marksîzmê"* li Îtalyayê serfirazîyên **Silvio Berlusconi**. Heman çerxa bîrbirinê wê karibûya bihişta ku li ser navê tirsa (rewa) ji *Enîya Neteweyî*, hemû siyasetên vê enîyê dijberîya wan dike, ji bo pêşîlêgirtina *"21ê nîsaneke din a nû"* bi awayekî xweber dibin siyasetên pîroz. (3) Gelo gel li dijî lîstika siyasî ya kilîtkirî derdikeve? Bersiva ku ji vê pirsê re tê dayîn ew e ku protestovan faşîstên xwenenas in.

Destûrdana helwêst û livûtevgerên wisa har a ronakbîrî, wê bibe dînîtîyeke siyasî. Lewre rastgira tundrew a fransî wisa hesap kir ku îdeolojîya wê ya kevin a ***thacherî***, kîna wê ya ji karmendan û ji *poujadizma* wê ya bacî ji ber kûrbûna newekhevîya civakî û dîsa ji ber rizîna xizmetên gelemperî, têk çûne. Ji ber vê yekê rastgira tundrew êdî bêdûdilî li mijarên ku ji mêj ve çep pê ve mijûl dibe, xwedî derdikeve. Berî bîst û pênc salan, **Jean-Marie Le Pen** rejîma ***Vichî,*** generalên xaîn ên Cezayîra fransî pîroz dikirin û ji bo ku karibe xwe bigihîne **Ronald Reagan** û li tenişt wî di fotoyekî de xuya bike, kesên li derdorê bi enîşkên xwe dehf didan. Keça wî, bi xwe, êdî bê dudilî ji **Charles de Gaulle** gotinan werdigire, *Tevgera Rezîstanstê* bi bîr dixe û ji nû ve neteweyîkirina enerjî û telekomunîkasyonan pêşniyar dike. (4) Bingeha sosa dijminatîya li hemberî bîyanîyan li nav civakê têra xwe berbelav bûye û ji alîyê desthilatê ve jî hatine rewa kirin da ku ji niha û şûn ve karê esasî yê propagandaya rastgira tundrew li deverên din tê meşandin.

Berpirsiyarîya vê desteserkirina mîrasê ne tenê dikeve ser milê çepa dezgehî, burjûwazîbûyî û xwespartî nav hembêza cîhanîbûna lîberal. Qelsîya stratejîk a "çepa çepê" û nekarîna wê ya yekkirina kom û derdorên piçûk ên ku wê pêk tînin, dîsa ji alîyê xwe ve di vê xetimînê de xwedî rol in. Têkoşîna li dijî rastgira tundrew, sirf ji ber ku rastgira tundrew jî li wan mijaran xwedî derdikeve (û wan li gor berjewendîyên xwe bi kar tîne), bi her halî nayê wateya lidijderketina mijarên pêşverû, lê belê tê wateya afirandina derfeta vekirina xetimîna siyasî ji bo girseyekê ku ji hêrsan, bi awayekî mafdar li ber teqînê ye. Dûrî du partîyên bingehîn ên spanî, xwepêşandêrên ***Puerta del Sol*** gelo daxwaza tiştekî din dikin?

1 *Cf.* "populîzm, ha ji we re dijmin!", *Le Monde diplomatique*, gulan 1996

2 Dominique Moïsi, "The Strauss-Kahn earthquake", *International Herald Tribune*, 18 gulan 2011

3 21ê nîsana 2002yê, namzedê sosyalîst ê serokkomarîyê Lionel Jospin, ê ku Jean-Marie Le Pen jê derbas bû, nekarî di tûra duyem de bibe raqîbê Chirac ê ku bi rêjeya ji % 82 dengan careke din bû serokkomar

4 Binêrin li nivîsa bi sernavê "parastina xizmetên gelemperî, hespê nû yê şerê partîya lepenisît", *Le Monde*, 21 gulan 2011

Wergera ji fransî: Baran Nebar

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## PKK=Ergenekon?

Rojnameya **Radikalê** di 25ê gulanê de gotara Cengiz Çandar weşand û tê de dihat gotin ku *'Ên dibêjin ku PKK, rêxistina taşeron a Ergenekonê ye, wan ne PKK ne jî pirsgirêka kurd fam kirine.'* Sebaret bi manşeta rojnameya ***Sabah***ê ku tê dihat îddîa kirin ku rêxistina ***Ergenekon***ê çûye ***Qendîl***ê û lê digel PKKyê hevdîtin pêk anîye, **Çandar** weha dinivîse: *'Herçend li dij rastbûna van nûçeyan dernakevin jî heger helwêsta siyasî ya zêdeyî 2 mîlyon dengdarên kurd û daxwazên kurdan ên ji bo mafên wan, wekî Ergenekon=PKK an jî PKK=Ergenekon were teng kirin, ev yek dê pirsgirêka kurd weha bêçareserî bihêle, ku pirsgirêk dikare pişta Tirkiyeyê bişkîne. Ev yek teşhîseke nerast e û nikare tedawîya rast jî peyda bike. Êdî ne razek e ku di navbera PKK û rayedarên dewletê de, ku hin ji wan leşker in û wekî 'Ergenekon' tên bi nav kirin, têkilîyên operasyonel hene. Jixwe, îfadeyên **Öcalan** ên piştî 1999ê û notên hevdîtinan bi baldarî werin xwendin, ev yek diyar e. Lê belê binavkirina PKKyê wekî rêxistina taşeron a Ergenekonê tê wateya famnekirina PKKyê û pirsgirêka kurd û ji bilî hewldanên pûçkirina daxwazên mafdar û meşrû yên kurdan pêvetir xizmeta tiştekî din nake. Dibe ku ev yek ji bo serokwezîr bibin alavên polemîkê ku li meydanên hilbijartinan bi kar bîne û dengên AKPyê hinekî zêdetir bike, lê belê çareserîyê nemumkin û pirsgirêka kurd jî dê kangren bike ku malîyeta vê bêçareserîyê ji sûda zêdekirina dengên AKPyê gelek zêdetir be.'*

**Çandar** di nivîsa xwe de wekî din dibêje çawa ku endamên ***Ergenekon***ê, ku li gor hesabên xwe yên navxweyî digel endamên PKKyê hevkarîyê dikin, nake neteweperestên kurd, wan endamên PKKyê, ku bi hesabên taktîk digel hin endamên Ergenekonê hevkarîyê dikin, PKKyê nake taşerona Ergenekonê.

Di dawîya gotarê de **Çandar** bal dikişîne ser daxuyanîyên serokê PKKyê **Öcalan** û dibêje çapemenîya tirk mebesta wî fam nake û gotinên wî wekî gefxwarinê dibînin, lê belê Öcalan bang li ***BDP*** û li ***PKK***yê dike ku ziman û siyaseta xwe biguherînin. Ew herweha welatên cîran jî hişyar dike û dibêje dibe ku kurd hewlê bidin ku digel Sûriye û Îranê re li hev bikin, lê divê ji wan welatan re were gotin ku bila tu kes plan neke ku kurdan li gor berjewendîyên xwe bi kar bîne.

## Pêngava CHP ya ji bo pirsgirêka kurd

Heman rojê gotarnivîs **Oral Çalışlar** jî di kuncika xwe ya di rojnameya ***Radikalê*** de daxuyanîyên serokê CHPyê **Kemal Kılıçdaroğlu** nirxandin, ku di mîtînga Hekarîyê de ragihandibûn. Di bernameya nû ya CHPyê de tê gotin ku perwerdehîya bi zimanê dayîkê dê serbest be, *Şertên Ewropî* ya ji bo *Xweserîya Rêveberîyên Herêmî* dê bi giştî were qebûl kirin û benda hilbijartinê ya ji sedî deh were kêm kirin.

**Çalışlar** dibêje '*CHPya **Deniz Baykal** pişta xwe dabû mîlîtarîzm û despotîzma burokratîk û tu caran li çareserîyeke demokratîk nedifikirî û vê yekê jî CHP kiribû netewe û dewletperest û di dawîyê de partî têk çûbû. Lê belê **Kılıçdaroğlu** lê hay bûye ku rewşê biguherîne û lewma peyamên bi vî rengî dide'*. Nivîskar bi baldarî şirove dike û dibêje helbet ev yek nayê wê wateyê ku CHP ji kokê de hatiye guhertin, lê belê ev nîşane ne ku CHP ji guherînê re vekirî ye û van gotinên berîya hilbijartinan dikarin piştî hilbijartinan jî berdewam bikin.

Çalışlar wekî din dinivîsîne ku serokwezîr ji ber van gotinan rexne li CHPyê digire û Kılıçdaroğlu bi nakokîyê rexne dike. Lê belê gotarnivîs lê zêde dike: *'AKP hikûmeta xwe ya yek partî garantî kiriye û hewlê dide ku ji bo guherîna destûrê têra xwe wekîl derxe, lewma jî niha zimanekî 'dewletperest' bi kar tîne. Lê belê ev yek zirarê dide îmaja 'guherînhez' a partîyê û çareserîyê dijwartir dike.'*

## Xwepêşandanên li Kurdistana Başûr

Rojnameya ***New York Times*** di 18ê gulanê de derbarê xwepêşandanên li Kurdistana Başûr gotareke dirêj nivîsî. Di nivîsê de tê gotin: *'Xwepêşandanên ji bo demokrasîyê, ku li cîhana ereb pir bi lez belav bûbû, berî sê mehan gihîşt herêma nîv-xweser a Kurdistanê ya li Iraqê, ku îlhama xwe ji raperînên Tûnis û Misirê stendibû. Lê belê xwepêşandanên vê derê jî wekî yên li Bahreyn û Ummanê bi dawî hatin, ji alîyê hikûmetên otorîter ve hatin tepisandin.'*

***New York Times*** dinivîse ku piştî dagîrkirina Iraqê ya ji alîyê amerîkîyan, herêma Kurdistanê bûye herêma herî seqemgîr a welêt û gelek sermîyandarên bîyanî jî lê kar dikin. Rojname herweha dinivîsîne ku *'Lê belê herêm ji alîyê du partîyan ve bi pergala deshilatdarîyeke mayînde tê bi rê ve birin.'* Û cih dide gotinên rojnameger **Çinar Muhammed** (33 salî) ku di xwepêşandanan de ji destê xwe birîndar bûye. Muhammed dibêje: *'Baasî berê çawa tevdigerîyan partîyên niha jî bi heman rengî tevdigerin.'*

Tepisandina xwepêşandanan, ku di encamê de 10 kes ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve hatin kuştin *'ji bo dîplomatên amerîkî, ku li hember şideta domdar û bikêrnehatîbûna siyasetê ya li Iraqê, wekî herêmeke seqemgîr bawerîya xwe bi Kurdistanê dianîn, dijwarîyeke negumankirî bû.'* NYT herweha dinivîse ku li meydana bajarê **Silêmanîyê**, ku lê her roj xwepêşandan pêk dihat, efserekî artêşa amerîkî hatiye dîtin û ev yek bûye sedem ku xelk bawer bikin ku Amerîkayê li hember bersiva tund a hêzên ewlekarîyê xwe kor û kerr kiriye.

Peyvdarekî sefareta amerîkî ya Îraqê jî diyar kiriye ku wan bang li hikûmeta Kurdistanê kiriye da ku guh bidin daxwazên meşrû yên xwepêşandêran, lê belê hikûmeta herêm heta niha tu reform nedane dest pê kirin, *ku gelek kes vê yekê wekî kêmbûna bandora Amerîkayê ya li ser hikûmeta kurd dibîne, nemaze di van rojan de ku vekişîna leşkerên amerîkî nêz dibe.*

Ji ***Enstîtuya Brookingsê***, bisporê ewlekarîya neteweyî **Kenneth Pollack** jî gotiye: *'Kurd hevgirên girîng ên Amerîkayê ne û rewşa navxweyî ya Iraqê jixwe gelek hessas e û Washington jî bi îhtîyad tevdigere ku keştîyekê, ku jixwe bê îstîqrar e, nehejîne.'* Birêz **Pollack** herweha dibêje *bersiva Amerîkayê ji bo tepisandina xwepêşandanên li Kurdistanê, wekî yên welatên din e, nemaze wekî li Bahreynê ye, ku Amerîka pê re têkilîyeke stratejîk a demdirêj danîye.*

## Projeya zirdînok a Erdogan: "Kanal Istanbul"

Rojnameya ***Financial Times*** di 19ê gulanê de sebaret bi 'projeya zirdînok' ya nû ya hikûmeta Tirkiyê ya bi navê ***Kanal İstanbul*** weşand, ku wê hefteyê ji alîyê serokwezîrê tirk **Recep Tayyip Erdoğan** ve li pêşîya çapemenîyê hatibû aşkere kirin. Rojname dibêje projeya Erdoğan ne projeyeke nû ye û armanca wê jî gelek basît e: Di deh salên pêşîya me de hilberîna petrolê ya li *Deryaya Xezarê* dê xwe du beraber bike û ev yek jî hejmara tankerên ku di ***Bosfor***ê *(Tengava Stenbolê)* re derbas dibin, ku niha rojane dora 27 e, dê bi xwe re du beraber zêde bike û ger qezayek rû bide, ev yek ji bo Stenbolê dê bibe sedema karesateke jîngehî.

Gotar herweha bi bîr tîne ku projeya xeta lûleyê ya ***Samsun-Ceyhan*** hîna jî di rojevê de ye, ku mebesta vê xeta lûleyê jî ew e ku petrola Xezarê bigihîne ***Deryaya Spî***. Di vî warî de hikûmeta tirk li bendê ye ku hem ***Kanal İstanbul*** û hem jî xeta lûleyê encax herdu bikaribin têrê bikin, lê gotar bi bîr dixe ku heta niha garantî nedane da ku waadên xwe ya projeya Samsun-Ceyhan pêk bê.

***Financial Times*** wekî din dinivîse ku bi vê projeyê re Tirkiye hêvî dike ku ***Peymana Montreuxê*** (Montrö) ji muzakereyê re veke, lê belê Rûsya dê ji muzakereyan bireve. Di eynî demê de, ji ber ku Rûsyayê soza xwe ya ji bo pêkanîna projeya Samsun-Ceyhan negirtiye, Tirkiye dê vê kanalê ji bo ku zorê bide Rûsyayê bi kar bîne. Rojname herweha lê zêde dike: '*Bi rastî jî proje ji bo serokwezîr di heman demê de reklameke hilbijartinê ye jî.'*

Di dawîya gotarê de ***Financial Times*** dinivîse ku debara kanalê dê herî kêm 10 mîlyon dolar be û ji ber ku ***Bosfor*** (Tengava Stenbolê) dê belaş be, keştî dê kanalê tercîh nekin. Gotar weha tê girê dan: *'Di vî warî de ev projeyeke wêrek e, lê belê divê neyê ji bîr kirin ku di dema avakirina **Kanala Panamayê** de şirketa avakar du caran îflas kiribû û **Kanala Suveyşê** jî di destpêkê de hatinîya ku jê dihat hêvî kirin, nedabû. Heger projeya serokwezîr Erdoğan pêk bê û kanal were ava kirin, ev yek dê ji kîsê mukelefên bacê yên tirk derkeve.'*

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent
Kurdish Media Group GmbH
ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Luqman Guldivê
Simko Destan

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish
Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000
2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.arsivakurdi.org

# Paşxaneya xwepêşandanên başûrê Kurdistanê (Dewama rûpela 1)

berê xwe da Liqa 4 a Partîyê (1) û dest pê kir dirûşmeyên li dijî gendelî û hikûmeta Herêmê hildan, heta gihîşte wê yekê ku Liqa 4 bidin ber keviran. Zêrevan û endamên Partîyê jî bi bikaranîna çekê bi dijwarî li xwepêşanderan vedigerînin û kesekî bi navê Rêjwan Elî (13 salî) dibe qurban û 55 kes jî birîndar dibin.

Ew tiştê ciyê balpêdan û pirsiyar e di vê bûyera diltezîn (dilşewat) de rola Yekîtîyê ye. Ev hemû alozî li Silêmanîyê rû dide û dezgehên ewlekarîyê yên bajêr jî deng nabin xwe; ew zêrevanîyê ne li xwepêşanderan, ne li Liqa 4 dike, ne jî dibe rêgir ku xwepêşander xwe li tundûtîjî û dijwarîyê negrin. Her çend e serokatiya *Partiyê* ji asayîşa Silêmaniyê dixwaze ku baregeha wê ji xwepêşanderan biparêze, lê bêhelwestiya *Yekîtîyê* dibe ciyê pirsyareke mezin.

*Partîyê* di kongreya xwe ya sêzdemîn de meha kanûna duyem li sala 2010ê biryar dabû ku nîvê serkirdayetîya xwe bîne Silêmanîyê. Tevî stratejîya wê ya hevbeş a digel Partîyê, bi tu awayî ev biryara *Partîyê* bi *Yekîtîyê* xweş nehat. Yekîtî, li alîyekî di parçebûn û bendîbendbûna nav refên xwe de mabû û li alîyê din jî li *Silêmanîyê* rikeberekî dijwar lê peyda bûbû ku kiribû nîvê şax û beşek ji cemawera wê rû jê badin. Şîyana rûbirûbûneke siyasî ji wê zêdetir nedikir ku xetereke giran bo hebûna Yekîtîyê durist kiribû. Veguhestina enîya şerê digel *Goranê* ji sengerê xwe ve bo alîyê *Partîyê*, hiştibû ku Yekîtî ji vê krîzê rizgar bibe, lewma di vê bûyerê de deng nebir xwe.

Piştî 17 sibatê bi çend rojan armanca xwepêşanderan guherî, bû tolhildana ji Partîyê di ber wê xwîna ku hatiye rijandin de. Her ku diçû hejmara xwepêşanderan zêde dibû. Ji bo vê mebestê jî *Liqa 4 a Partîyê* bû armanc û hedef û wan ji çend alîyan û cadeyên cuda ve berê xelkê dida liqê, lê Partîyê bi tevahîya hêz û karîna xwe berevanîya wê avahîyê dikir ku li Silêmanîyê sembola Partîyê bû.

Jixwe heke xwepêşanderan bi ser *Liqa 4 a Partîyê* de bigirta, wê ew bişewitandaya, ji ber ku şewitandin li ba civaka me bûye kultur. Ji berê de heke nexweşî ketiba navbera du kesan an du malbatan û nekarîbana zora hev bibin, her du jî têdixebitîn dexl û zad an axir û tewla terş û talan yan jî malê yê din bişewîtinin. Şerê çend salî ya *Birakujîyê* jî, çi li çîyan çi li bajaran, ew kultur beloqtir kir. Ji van partîyên deshilatdar kîjanê şax û baregeh û mala tagirên dijberê xwe talan nekiriye û neşewitandiye?! Kê ji wan ev derb lê neketiye?! Her çend Liqa 4 a Partîyê nehate girtin û şewitandin, lê Partîyê pirê şax û dezgehên ragihandinê yên *Goran*ê ku li deverên bin desthilata wê ne, şewitandin bêyî ku li wan deveran xwepêşandanek hatibe kirin.

Di berbanga 20ê sibatê de nêzîkî 50 çekdarên rûpoş *(bimaske)*, ku hin jê ser bi hêzên *Pêşmerge û Dij-Teror* bûn, *Kanala Nalîya* şewitand ku televîzyoneke ehlî (taybet) û serbixwe ye û tenê 15 deqîqe bû ku dest bi weşana xwe kiribû. Tew hin ji êrişkaran tûşî şewitandinê bûn û li nexweşxaneyeke jinan ya li *Hewlêrê* bi zêrevanî û çavdêrîyeke tund û hûrbînî dihatin dermankirin. Gava ku ciyê wan aşkere bû, nehiştin ku tu kes wan bibîne û bi bayê bezê ew veguhestin ciyekî nediyar.

Rûberê xwepêşandanan her ku diçû zêdetir dibû. *Helebce, Kelar, Qeladizê, Ranye, Çemçemal, Koye û Derbendîxan* ji bo ku piştgirîya *Silêmanîyê* bikin serê rojê derdiketin ser cade û kolanan ku di hindekan de senaryoya pêşberî *Liqa 4 a Partîyê* dubare dibû.

Her çend e *Bizava Goran* radigihand ku xwepêşandan xweber (xwerist) in û karîgerîya wê li ser tuneye, lê cemawera wê roleke berbiçav tê de pêk dianî.

Partîyê jî ji bo ku berevanîya baregehên xwe bike hêzeke pir a Zêrevanîyê ber bi Silêmanîyê ve bi rê kir, lê ji ber razînebûna hin ji serkirdeyên Yekîtîyê rê nedan ku bêne nav Silêmanîyê.

## Çima?

Bûyerên 31ê Tebaxê yên sala 1996ê ew yek di bîra Yekîtîyê de hiştiye ku armanca Partîyê bi şandina hêzan bo Silêmanîyê ew e ku serdestîya xwe nîşan bide û xelkê deverê û neyarên xwe bitirsîne, bi taybetî jî *Bizava Goran*, lê ew ji wê yekê jî piştrast e ku di vê leşkerkêşîyê de zerermendê yekem her *Yekîtî* bi xwe ye. Rast e, niha *Goran* li deverê xwedî bêhtirîn cemawer e, lê ev der berê keleha kesk a *Yekîtîyê* bû û niha jî ew ji alîyê cemawerê ve di rêza duyem de ye. Her ji ber vê hindê anîna wê hêzê alozîyê dixe nav wê deverê ku ew lê serdest e. Ev yek di demekê de ye ku vê partîyê – *Yekîtîyê* - qet derfet û delîveyeke rastîn nîne ku li deverên bin desthilata Partîyê de liv û lebatê bike. Ji ber van sedeman û cemawera *Goran û Yekîtîyê* jî ku heman nêrîna negatîf heye li beranberî Partîyê, nehiştin hêzên Zêrevanîyê bikevin nav bajêr û ew çend rojên din vekişiyan Hewlêrê.

Xwepêşandanên li Silêmanîyê heroj berdewam dikir, lê bi awayekî nû. Heroj piştî nîvro xwepêşander li pêşberî Sera li Silêmanîyê, ku wan peyra navê *Seray Azadî* lê kir, li hev diciviyan û dirêjîya sê saetan nerazîbûn û daxwazên xwe bi gotar û bangewaz û helbestan didane xuyakirin ku pirê caran ji wan peyv û amajeyên birîndarker bêpar nebûn ku li dijî desthilatdaran dihatin gotin.

Ji bo ku arasteya daxwazên xwepêşanderan bêne formûle kirin, hin ji çalakvanên civaka sîvîl û rewşenbîr û hunermend û alîyên muxalif, *Encûmena Demî ya Meydana Azadîyê* durist kir. Gelek ji mamosteyên zanîngehan û rojnamevanên azad û rewşenbîrên elît piştgirîya xwe bo daxwazan ragihand û bûn beşek ji xwepêşanderan ku hêzeke manewî û rewşenbîrî bexişî wan kirin. Vê rewşê zor li *Parlamentoya Kurdistanê* kir û ew neçar kir civîneke awarte saz bike û nûnerên xwe bişîne pêşberî *Berderkî Sera li Silêmanîyê* da ku ji nêzîk ve li daxwazên xwepêşanderan guhdarî bike.

Roja 23.02.2011ê wê biryarnameyek derxist ku ji 17 xalan pêk hatibû û ya diyartirîn vegerandina hêzên gerpêxistî (bihereketêxistî) bo ciyê wan û serbestberdana girtîyan û qerebûkirina ziyanlêketîyan û bêalîkirina hêzên Pêşmerge di qayişkêşanan (milmilaneyan) de û destgîrnekirina tu kesan bêyî biryara dadgehê, spartina encamderên şewitandina *Kanala Nalîya* û radyo û televîzyona *Goran* li Hewlêrê bo dadgehê, herwiha bangkirina serokê hikûmetê û wezîrên navxweyî û Pêşmerge bo jêpirsînê û cihxweşkirin bo danûstandina nîştimanî.

Piştî vê yekê bi pênc rojan, *Encûmena Demî ya Seraya Silêmanîyê* daxwaznameyek pêşkeşî parlamentoyê kir ku ji 11 xalên aktuel û 25 xalên bingehîn pêk hatibû. Her çend piranîya xalan ew daxwaz bûn ku heroj xelk qal dike û daxwazên rewa ne, lê tu carî nedihate hêvî kirin ku desthilat yek ji wan xalan bi cih bîne, hetta (tew) biryarnameya parlementoyê jî tê de. Jê bêhtir wê dixwest demê bike faktorekî ji bo bêzarkirina xwepêşanderan û wan vegerîne malên xwe da ku rewş aram bibe her wekî berîya 17 sibatê bêyî tu encam û akaman!

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser tûwalê, 40 x 60 cm

Hevrûniştin bi her awayî bi têra xwe hatibûn xurtkirin, li parlementoyê, di navbera desthilat û muxalefetê, nûnerên rêxistinên sivîl û partîyên siyasî de, lê belê vê yekê qet nearamî û alozî kêm nekir!

Rêxistinên muxalefetê hatibûn araste kirin ku digel xelkê nerazî di civînên cemawerî de çalakane amade bin da ku zoreke bêhtir li desthilatê bikin û heta jê bê daxwazên xwe pê bidine bi cih anîn. Koma *Zanîngeha Silêmanîyê* û fakulte û peymangehên tevahîya bajar û bajarokan di vê yekê de roleke berbiçav hebû. Dîmena balkêştirîn dîmenên roja înê yên Sera bûn ku xelkekî pir ji bo nimêjkirinê û guhdarîkirina gotara înê lê diqesidîn (berê xwe didanê), bi taybetî li wan gotarên rexnegir ku li desthilatê dihatin kirin.

Tevahîya wan xebat û hevrûniştinên ku hatine kirin tu çareserî pêk neanî, bi taybetî ku piştî Serokkomarê Iraqê Celal Talebanî û cîgirê serokê Partîyê Nêçîrvan Barzanî di wan bizav û hewlên xwe de serneketin gava çûn Îranê da ku bi riya rayedarên (karbidestên) wî welatî zorê li partîyên îslamî bikin ji bo ku xwe ji *Bizava Goran* dûr bigrin. Her ji ber vê hindê piştî ku vegeriyan liv û bizavên hêzên ewlekarîyê dest pê kir. Wisa xuya bû ku partîyên desthilatdar biryar dabû dawî li vê rewşê bînin.

Rojên 15 û 16ê nîsanê komek ciwan 400 metro dûrî *Berderkî Sera* û nêzîkî *Mizgewtî Gewre* bi hêzên ewlekarîyê re radibin hev (pevdiçin). *Encûmena Seraya Azadîyê* ragihand ku wan xwepêşanderan pêwendî bi wan re nîne û destikê desthilatê ne da ku wan bike hincet ji bo êriş bibe ser xwepêşanderan. Li alîyê din desthilatê ev kes parçeyek ji xwepêşanderên alozîkar bi nav kir.

Roja 17ê nîsanê hêzên ewlekarîyê di destpêka *Cadeya Pîremêrd* de li xwepêşanderan rabûn û gaza rondikrêj bi kar anî. Derbarê berbelavbûna vê rewşê de li ser cadeyê behsa wê yekê dihate kirin ku hatina wê hêzê planeke pêşwext bû bo valakirina Seraya Azadîyê. Desthilat jî di wê bawerîyê de bû ku destê dereke xwepêşandanan bi gerê dixe û rewş gihiştiye asteke tirsnak ku pêwîst e dawî lê bê anîn.

Êvara 18ê nîsanê, piştî ku xwepêşandan diqede, hêzeke ewlekarîyê bi cilên sîvîl diçe ser sekoya xwepêşandanan û wê dişewitînin û hemû wêneyên qurbanîyan û posteran jî jê dikin. Her wê şevê jî, hêzeke serbazî ya bêhejmar navenda bajêr û piranîya kuçe û kolanan û serbanan digre, tevî danîna yekîneya serbazî li derdora *Cadeya 60 Metreyî* û li derwazeyên bajêr û liv û lebata yekîneyên gerok yê *Dezgeha Dijî Teror*. Di heman demê de asayîşê dest bi operasyonekê kir bo girtin û gerandina şopa wan kesan ku di xwepêşandanan de roleke çalak hebû. Her wekî Silêmanîyê, hêz bo tevahîya bajar û bajarokên dîtir jî hate bi rê kirin.

Xwepêşandan li 17ê sibatê dest pê kir û 19ê nîsanê bi zerba hêzê (bi destê zorê) dawî lê hat, lê van 62 rojên xwepêşandanan qet tiştek bi ser nexist, ji 10 kuştî û bi sedan birîndar û bêndereke ji rik û gir pê ve.

## Hewlêr di cografyaya guherînan de

Silêmanî, li Kurdistan û Iraqê jî bi wê yekê hatiye nasîn ku bajarekî tijî liv û bizav e. Liv û bizavek ji bo ku ji wan

www.arsivakurdi.org

hemû bazineyên biçûk û mezin rizgar bibe ku di dirêjîya dîroka kurt ya vî bajarî de bi mebesta tengavkirinê (xefekirinê) ji alîyê dagîrkeran û hêzên xwemalî ve hatine kêşan. Tevahîya hikûmetên Iraqê nekarî daxwaza akincîyên vî bajarî ya bo azadîyê vemirînin. Ev yek li ba xelkê vî bajarî bûye kultur. Li gelek deverên cîhanê jî ev taybetmendî heye. Bo nimûne, bajarê Der'a li Suriyayê pêşengîya raperînan kir û stû li ber fişar û zordestîyê netewand. Ji deverên kurdan jî, Qamişlo her wekî jê dihate hêvîkirin, zû hate ser cade û kolanan û dirûşma azadîyê hilda.

Li gor Silêmanî û deverên dora wê, hewlêrî sade û hêmintir in, lê di kar û bazirganîyê de serkevtîtir in. Di dîroka nêzîk de ew roj gelek kêm in ku li vî bajarî alozî û nexweşî peyda bûbe. Demên herî nexweş yên Hewlêrê dikevin navbera salên 1994-1996ê ku her yek ji Yekîtî û Partîyê xwestin bi riya şer kontrola bajêr tenê bixin destê xwe.

Iraq 18 parêzgeh e, li 16an li dijî gendeliyê xwepêşandan hate kirin. Tenê wan her duyan ev yek nekir ku di bin rikêfê Partiyê de ne; Hewlêr û Dihok. Bûyerên Tunis û Misir û Lîbya û Yemen û Surya û xwepêşandanên 62 rojî yên Silêmaniyê, qet karvedaneke (reaksiyonek) li Hewlêrê ranekir.

Bi riya malperên Înternetê bangeke pêşwext bo xwepêşdana li Hewlêrê hate kirin. Partîyê tevahîya hêzên xwe yên çekdar û rêxistinên xwe bi gerê xistin, tevahîya cade û park û kolanên bajarî girtin, ablûqeya trafîk xiste ser paytextê. Wê bi riya Yekîtîya Qutabîyan, zanîngeh û peymangeh gişt daxistin û av û elektrîk li wargehên xwendkaran birî û otobus jê re anîn û ew şandin deverên wan. Pirs ji serokê zanîngehan û wezîrê xwendina bilind û serokê hikûmetê nehate kirin û peyre jî wan tu helwestek nîşan neda.

Di wê rojê de ku pêwîst bû li Hewlêrê xwepêşandan bê kirin, li Silêmanîyê kuştîyek û gelek birîndar hebûn, lê li Hewlêrê tenê du kesan kir wê bêdengîyê bişkênin ku piştî çend çirkeyan ji alîyê peyayên Parastina Partîyê ve hatin girtin. Yek jê endamê *Partîya Komunîst ya Karkerên Kurdistanê* bû û ewê din hewlêrîyekî xwedî pasaporta Awistralyayê bû. Piştî şkencekirinê, ji ber fişareke pir a navxweyî û dereke hatin berdan. Partîyê di wê rojê de ji bo jihevxistina (bêtesîrkirina) her keş û hewayekî awarte tagirên xwe bi wêneyên serok û alaya partîya wî xiste ser cade û kolanan û navê *Înîya Şadîyê* li wê rojê kir.

Rêjeya xelkê nerazî li Hewlêrê qet ji Silêmanîyê kêmtir nîne, lê ji ber tirsa têkçûna rewşa Hewlêrê û çaverêkirina karvedana dijwar a Partîyê ya li hemberî her nerazîyekê, hişt ku encama wê bi qezenca Partîyê de be.

Yek ji dîmenên balkêş ên Berderkî Sera, peyama keçekê bû ku li ser kartonekî nivîsîbû: Hewlêr bibe hevalê min li dijî gendelîyê.

## Îslamî...

Yekgirtîya Îslamîya Kurdistanê û Komela Îslamî ya Kurdistanê du rêxistinên ji binema (prensîp) îslamî û ji alîyê ramanî ve cuda ne.

Yekgirtû, xwe wekî rêxistineke reformîst dizane û Birayên Musilman (Îxwanul Muslîmîn) ên Misrê û avakarê wê Hesen El Benna wekî çavkanî û mamosteyê xwe dizane. Serê pêşîn bi riya wan karên xêrxwazîyê hate nav qada siyasî ku çavkanîya wê ya darayî ji welatên Kendavê dihat. Dema ku hejmara wan zêde bû xwe wekî rêxistineke siyasî ragihand. Ew bêçek in û wekî ew bixwe bangeşe bo dikin dil dikin bi riya binemayên demokratîk tevî jîyana siyasî bibin.

Gava pêşîn ya muxalefetbûnê li Kurdistanê bi wan dest pê kir û grûba yekem jî bûn ku bi lîsteyeke cuda ji lîsteyên partîyên kurdistanî beşdarî di hilbijartina sala 2005ê a Parlementoya Iraqê de kir. Vê helwesta wan hişt ku Partî li Dihokê êriş bibe ser şaxên wan û çend endamên wan bikuje. Yekgirtû, ji tevahîya 325 kursîyên Parlementoya Iraqê xwedîyê 4 kursîyan e.

Heçî *Komela Îslamî* ye, baskekî cudabûyî yê *Bizava Îslamî* ye û Elî Bapîr emîr *(Partîyên îslamî ji dêvla sekreterê giştî vê peyvê bi kar tînin: wergêr)* û avakarê wê ye. Ew dixwazin bi riya dînê îslamê xizmeta gelê kurd bikin. Hêza wan ya çekdarî hebû û car caran bo nîşandana hêza xwe, tetbîqeta serbazî dikir. Sala 2003ê û digel destpêkirina *Prosesa Azadîya Iraqê,* baregehên wan, ku li devera *Xurmalê* bûn, her wekî ên *Ensarûl Îslam* ketine ber êrişa moşekên Amerîkayê, lê van tu karvedaneke dijwar nîşan neda, ji dêvla ku ber bi Îranê ve birevin, hêdî hêdî vegeriyan nav bajaran. Piştî demekê, gava Elî Bapîr ber bi Hewlêrê bi rê dikeve, li nêzîkî bajarokê *Dukan* hêzeke Amerîkayê wî digre û dibe. 22 mehan wî tevî serkirdeyên rejîma Baas di zîndanê de dihêlin û peyra serbest berdidin. Komel, di Parlementoya Iraqê de xwediyê 2 kursiyan e.

## Sê xal hene ku divê mirov li ser raweste...

A yekem: Ew tirs û fikara Partî û Yekîtîyê ku rojekê ew berbelav bibin û hewl bidin bi riya hêz û tundûtîjîyê desthilatê bi dest bixin, ji ber ku me di dema xwe de ezmûna *Ensarul Îslam* dît ku çawa bi 500-600 çekdaran karî derbeyeke dijwar li hêzên Yekîtîyê bide û keş û hewayekî tirsnak û nearam li deverê durist bike.

A duyem: Hebûna *Yekgirtû û Komel*, ku heta vê gavê jî miyanrew (nermrew-mutedîl) in, heta radeyeke zor, bûne rêgir li ber rabûna rêxistinên îslamî yên tundrew.

A sêyem: Tirsa du partîyên desthilatdar ên başûrê Kurdistanê ew e ku hebûna ew hejmara pir û çalak a melle û peyayên dînî ên li ser şeqam, bibe sedem ku karta dînî –ku karteke karîger e li civakên paşmayî de– ji destê van du partîyan derînin, bi taybetî ku her yek ji wan, rêxistinên wan ên taybet hene di wî warî de, wekî *Yekîtîya Zanayan û Mamosteyên Ayînî* û çawa dil kirine ew wisa bi gerê xistine.

Ev du rêxistin îslamî ne. Serbarî wê hemû fişara van çend salan ku ji alîyê Partî û Yekîtîyê ve lê dihate kirin, ji alîyê çendanî û çawanîyê ve heta radeyekê geş û xurt bûn. Rewşa piştî 17ê sibatê ji wan re derfeteke lihev bû da ku bêne ser şeqam û nêrîn û dîtinên xwe yên li ser desthilatê, siyaset, qanûn û civakê xuyanî bikin, qet nebe hin ji wan gumanan verevînin ku li ser wan hene.

Bi vî awayî ew ji girêya tirsa derketina rasterast rizgar bûn. Êdî ew ne tenê ne li hemberî wan du partîyan ku çend sal in piranîya derîyan bi rûyê wan de girtine. Wan ev derfet ji dest neda û bê dudilî ciyê xwe li *Berderkî Sera* û tevahîya qad û cade û kolanên nerazî xweş kir. Ew li ba muxalefeta sekûler (laîk), rewşenbîr û hunermendan û tev komûnîstan jî amade bûn. Gotarên wan ku mohra dînî kêmtir û mohra rexne û çaksazîyê (reforman) bêhtir pê ve diyar bû, ji yên melle û peyayên dînî formeke cuda hebû ku di hizr û bîra me de mane. Ev cara pêşî ye sînorê di navbera gotara meleyekî û rewşenbîrekî laîk ewqasî kal (beqem) dibe ku derfetan ji bo peydakirina nêrîneke guncayî (lêhatî) bo arîşeyên hevbeş pêşkeş dike.

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser kaxezê, 21 x 29.5 cm

## Arîşe û çareserî

Hemû alî, du partîyên desthilatdar jî tê de, di wê bawerîyê de ne ku sîstema birêvebirinê li Kurdistanê ketiye krîzeke piralî, ku hin jê paşmayîya serdema xebata çîyan û şerê birakujîyê ye ku heta îro û piştî 20 salên îdareya serbixwe ya kurd nehatiye xwestin ji dil bo çareserkirina wê gav bêne avêtin. Arîşeyên civaka kurd pirê wan ji zarokên partîyan diqewimin. Partî ne ku bi wê pêkhate û şêwaza dinyaya hevdemî ku hey di prosesa nûbûnê de ye, tevdigerin, bêhtir bi wê modela ku em li Kurdistanê dibînin tevdigerin ku armancên wê ji bo berjewendîyên mal û malbatan hatine dariştin.

Nehiştina wate û rol û armanca partîyên siyasî, bi awayekî dîtir kuştina sazîyên demokratîk û sîvîl ên civakê ne, betalkirina qanûnan e ji erk û serwerîyên wan. Di dawîyê de partî û di ser wê re jî îradeya pawanxwaz (monopolîst) ya serokê wê hemû stûnên civakê hildiweşînin. Wî bawerî bi lihevparkirina desthilatan nîne, ew xwe xwedîyê wî mafî dizane ku gotina dawî û biryara dawî ya wî bi xwe be.

Xuya ye, ku li ku dera dinyayê serok pîroz bû dadgeh stûxwar dibe û ev yek jî parlementoyeke bêîrade û hikûmeteke şeht (kûd) tîne pê.

Ew derdor gelek in ku wisa dikin bêhêvîtîya welatîyên Kurdistanê beloqtir bibe. Me hemûyan dît ku wan çawa li parlamentoyê ji 75 endaman bi dengê 45 ji wan, berqanûna xwepêşandanan derbas kir û ji serokê herêmê re şandin da ku îmze bike. Qanûnasan û rewşenbîran, rêxistinên mafên mirovan û civaka sîvîl, dost û hevalên gelê kurd ên li derve ji serokê Herêmê xwestin ku berqanûnê li parlementoyê vegerîne da ku kêmasî û xalên lawaz ên wê bêne sererastkirin û bibe qanûneke serdemîyane…

Ji bilî sedema wê, awayê revandin û kuştina Serdeşt Osman trajedîyeke mezin bû, encama lêkolînên Partîyê jî malwêranî.

-Serbestberdana firokevanê tawanbar -Tarîq Remezan- ji alîyê Serkomarê Iraqê ve ku tawanbar e bi kîmyabarankirina Helebceyê û lihevanîna senaryoyeke erzan li ser revîna wî, digel xemsarîya heta bêjî bes ya serkirdeyên kurdan li beranberî milletê xwe.

Talankirin û firotina milkê giştî, liv û lebata tenkerên petrola qaçax bo ser sînoran û aşkerenekirina dahata wê, dataşîna mûçeya fermanberên di bin desthilata *Yekîtîyê* de bo 7 salan, pirbûna mîlyoner û milyarderan, bazirganîya siyasetmedar û bazineyên nêzîk ên desthilatê, hebûna leşkerekî mezin ê bêkar ku bêhêvitîyê laşê takekesên (ferd) wê vegirtiye û berbelavbûna gendelî û nebûna tu hêvîyan ji bo çareserîyê, kir ku volkana hêrsê hilteqe.

Ew hemû êş û azarên ku gelê kurd dîtin, nebûn handerên cemserên desthilatê da ku bi kêmanî xelkê ji wê yekê piştrast bikin ku di civakekê de dijîn, takekesên wê û paşeroja wê, xema deshilatdaran e.

Di wî parçeyê nîvçe azad ê Kurdistanê de, du cure partî û hikûmet û mercî û dam û dezgeh û reng hene ku xwedîyên sînorekî hevbeş in. Ev mistek in ji wê bêndera bêedalet û bêserûberîyê ku Kurdistan tûşî şêrpenceyê kiriye.

Çareserî ewqas aşkere û diyar in, mecal tê de nîne mirov xwe jê vedize. Piranîya projeyên çaksazîyê wan xalan vedigirin ku pêwîst e desthilat têbixebite ji bo berbendkirina rûdana her alozîyekê di paşerojeke nêzîk de ku yên herî giring ev in:

-Dûrxistina partîyan ji destdirêjîya di kar û barê hikûmetê û dadgehan de.

-Bêalîkirina hêzên Pêşmerge, yekkirina asayîş û *Parastin û Zanyarî* (2) û *Dezgeha Dijî Teror* di nav sazîyeke nîştimanî de.

-Vegerandina milk û malê giştî ji alîyê partîyên desthilatdar ve.

-Pêkanîna hilbijartineke dûr ji saxtekarîyê.

-Vegerandina projeya destûra Herêmê bo parlementoyê ji bo guherandina hin ji birgeyên (madde) wê.

Ev stûnên serekî yên her projeyeke çaksaziyê ne li Herêma Kurdistan; xemsarî û sersariya li beranberî her yekê ji wan dê bibe sedema herifîna ezmûna Başûr ku bi rîtmekî gelek xav (sist) bi pêş ve diçe.

* Çavdêrê siyasî

1 Nîşeya wergêr: Partîya Demokrat a Kurdistanê

2 Nîşeya wergêr: Rêxistina Îstixbarata ya bi ser Yekîtîyê ve

Wergera ji soranî: Mazlûm Doxan

www.arsivakurd.org

# Li Kurdistana Bakûr struktura demografîk (Dewama rûpela 1)

dijîn. Bi ya daneyên sala 2010ê tê dîtin ku gelheya bajaran hê zêdetir bûye.

**I.2) Belavbûna gelheyê li gor zayendê:** Li Kurdistana Bakur, rêjeyên gelheyê di warê zayendê de nêzî hevdu ne û ev yek digel rewşa giştî ya li Tirkîyeyê jî li hev dike. % 51.42yê gelheyê mêr û % 48.58 jî jin e.

**I.3) Belavbûna gelheyê li gor komên temenî:** Piranîya gelheya Kurdistana Bakur gelheyeke ciwan û dînamîk e. Gelheya giştî ya wan kesan, ku temenên wan di navbera 0-9ê de ne, % 27.99ê hemû gelheyê, yên 10-19 salî % 24.49ê, yên 20-29 salî % 17.47ê, yên 30-39 salî % 11.55ê hemû gelheyê pêk tînin. Rêjeya komên temenên din gelekî kêmtir e.

**I.4) Belavbûna gelheyê li gor asta perwerdehîyê:** Hejmara kesên perwerdebûyî yên Kurdistana Bakur, hem di warê çendînî û hem jî di warê çawanîyê de, li jêr asta naverast a Tirkîyeyê de ye.

**I.4-i) Kesên nexwenda:** Di komê de 2.827.658 kes hene, ku % 23.30ê gelheyê pêk tînin. % 12.14ê wan mêr, % 34.88ê wan jî jin in.

**I.4-ii) Ên ku dibistana seretayî qedandine:** Kesên ku di vê komê de cih digirin 3.727.373 kes in û % 30.72ê gelheyê pêk tînin. Di vê komê de herweha rêjeya mêran % 61.54 û ya jinan jî % 38.46. Ev dane, li ser esasê dibistana seretayî ya pênc salî hatine hesab kirin.

**I.4-iii) Ên ku dibistana navendî qedandine:** Rêjeya wan kesan, ku di vê komê de cih digirin, gelek kêm e. Hejmara wan 707.638 kes e û % 5.83 gelheyê pêk tîne. Di vê komê de rêjeya mêran % 73.58 û ya jinan jî % 26.42 ye.

**I.4-iv) Ên ku dibistana amadeyî (lîse) qedandine:** Hejmara kesên ku lîse qedandine 1.236.579 e û 10.19 derseda gelheyê pêk tîne. 71.10 derseda vê jî ji mêran, 28.90 dersed jî jinan pêk tê. Di nav van lîseyan de lîseyên pîşeyî jî hene. Li vê derê xalek heye ku balê dikişîne. Rêjeya û hejmara wan kesan, ku lîse qedandine, ji wan kesan, ku dibistana navendî qedandine, gelekî zêdetir e. Ev ferq ji ber gelheya dembuhurî derdikeve holê ku ji leşker, hêzên ewlekarîyê û karmendan pêk tê, ku ne ji herêmê ne.

**I.4-v) Ên ku lîsansa qedandine:** Di vê komê de 331.358 kes hene. Rêjeya van kesan li gor gelheya giştî % 2.90 e û % 73.29ê wê ji mêran % 26.7ê wê jî ji jinan pêk tê. Lê belê kesên ku di vê komê de cih digirin bi tevahî ne ji cografya blok a kurd e. Piranîyeke wê ya berbiçav dadger, dozger, rêveberên îdarî, efser û polîsên payebilind e. Lê belê piranîya kurdên ku lîsansa xwe ya bilind qedandine, li derveyî cografyaya Kurdistanê dijîn.

**I.4-vı)** Daneyên sebaret bi hindikahîyên olî û zimanî gelek kêm in û yên hene jî gelek kevin in. Ji ber vê yekê, li ser esasê azîne û daneyên cur bi cur mumkin e ku mirov nexşeya van her du mijaran derxe. Dema ku min pirtûka xwe ya li ser demografîyê amade dikir, ez çûm hema hema hemû bajarên Kurdistana Bakur. Dema ku daneyên min, ku min di van 8 salan de berhev kirin, û koçberîya heta sala 2000ê bi hev re werin nirxandin, encam weha ye: Bi ya sala 2000ê li Kurdistana Bakur % 6.54ê gelheya kurd a Kurdistana Bakur bi zaravaya dimilî (zazakî) dipeyive. Dîsa li gor heman daneyan % 6.07ê gelheya kurd a Kurdistana Bakur bawermendên alewî ne. Ji ber ku gelheya suryanî, keldanî û kurdên êzîdî di dumahîya şer de cih û warên xwe terikandine, derbarê wan de daneyên bi rêkûpêk nînin.

## II -Tevgerên gelheyî

Divê tevgerên gelheya ku li ser vê cografya diyarkirî dijî û nemaze jî li ser guherînên demografîk ên ji ber koçberîyê werin şirove kirin. Ji ber gelek sedeman gelheya hem di nav vê cografya diyarkirî de koç dike, hem jî koçberî derveyî vê herêmê dibin. Lê belê ev yek di xebateke demografîk de dikare li jêr sê serenavan de bên kom kirin:

a) Tevgerên xwezayî yên gelheyî. Ev yek; bûyerên wekî jidayîkbûn, zewicîn, hevberdan û mirin in ku di nav jîyanê de rû didin û sebaret bi statu, cih guhertin, tevkarîya di jîyanê de gelek daneyên din pêşkeşî me dikin. Lê belê ev sedem, di asta gelek bilind de rê li tevgerên gelheyî venakin. Civak bi piranî seqemgîr dimîne.

b) Karesatên xwezayî û teknîk. Karesatên xwezayî ku nikarin werin pêşbînî kirin, (erdhej, şewatên mezin, karesatên rabûna avê û qezayên radyoaktîf) li gor mezinbûna xwe dibin sedema tevgerên gelheyî û gelheya ku ji ber van sedeman neçar dimînin ku cihê xwe biguherînin, pirî caran di nav cografya xwe de dimînin, yan jî piştî demekê vegiderin ser warê xwe.

c) Koçberî. Mezintirîn tevgera gelheyî ku ji ber mezinahî, armanc û sedemên xwe di warê civakî, sîyasî, aborî, çandî û hwd. de bandora herî mezin a civakî pêk tîne, koçberî ye. Koçberî, xwedî wê taybetmendîyê ye ku dikare struktura civakî biguherîne û ji bo kurdan jî xwedî cihekî taybet û dîrokî ye. Civakên ku koçberî hatiye serê wan di her warî de tûşî serûbinbûnekê dibin. Ev serûbinbûn çendîn caran hatiye serê kurdan yan jî anîne serê kurdan.

### II.1) Sedemên civakî û aborî yên koçberîyê

Civaka kurd bi rêxistina xwe ya civakî û bi şêwaza xwe ya jîyana aborî, ji demeke gelek dirêj ve di nav liv û tevgerekê de ye. Di pêvajoya dîrokî de tê dîtin ku kurd naxwazin cografya xwe biterîkînin û li cografyayeke din bi awayekî mayînde bi cih bibin. Koç û mişextbûnên girseyî yên kurdan herî zêde di sedsala 20emîn de pêk hatine. Di sedsala 20emîn de ji her alî ve xizanbûna Kurdistanê û koçkirina gelheyê ji ber sedemên dîrokî yên xwedî bandorên girîng in: Yek ji wan ew e ku di 1915ê de ermenî ji alîyê Îttîhat ve Terakkî ve hatin qetl kirin û tûşî tehcîrê bûn, anku ew ji cografya ku lê dijîyan hatin dûrvekirin; ya duyemîn jî parçebûna Kurdistanê ya di pêvajoya Lozanê de ye.

Parçebûna Kurdistanê egera bingehîn e ku kurd ji ber sedemên aborî koçber bûn. Piştî ku Kurdistanê yekparebûna xwe ji dest da, bazar û têkilîyên neteweyî yên kurdan bihevrebûna xwe jî wenda kir. Piştî ku Kurdistan bi ***Peymana Lozanê*** re û di pêvajoya piştî peymanê de hat parçe kirin, navendên girîng ên bazirganîyê yên Kurdistanê wek ***Xarpêt, Erzirom, Wan, Bêdlîs, Sêrt, Diyarbekir, Nisêbîn, Cîzirê, Bazîd, Qamişlo, Ûrmîye, Makû, Mûsil, Silêmanî*** û ***Kerkûk*** her çû xizan û piçûk bûn. Di nav van navendan de têkilîyên aborî, civakî û çandî hatin birîn, bazar hat parçe kirin. Bazirganîya li ser sînoran, ku di van demên dawîyê de dest pê kir, ji bo kurdan bû nostaljîyeke ticarî û li bajarên ser sînoran jî livîneke nisbî hat dîtin. Ev yek bivê nevê, rewşa neyînî ye, ku ji ber parçebûnê pêk hat. Kurd encamên herî mezin û giran ên vê yekê di warê neteweyî û di qada sîyasî de dijîn. Ev yek egerên sereke yên koçberîyên kurdan in, ku di çaryeka pêşîn a sedsala 20emîn de pêk hatin.

Ji sala 1950ê û pê ve Tirkîyeyê hewl da ku bikeve nav pergala aborî ya rojavayî û têkilîyên xwe yên kapîtalîst xurttir kirin û vê yekê bi awayekî nisbî bandora xwe li ser Kurdistanê jî kir. Di vê serdemê de nemaze piştî ku di warê çandinîyê de mekîneyîbûn berbelav bû encamên bandorkar jî derketin holê: Çawa ku ji bo wan kesan, ku xwedî erd û zêvîyên piçûk bûn, çandînî nema rantabl bû û herweha ev erd û zêvîyên mîratmayî her ku çû piçûktir bûn. Ji ber vê yekê êdî ne mumkin bû ku xelk debara xwe bi çandinîyê bike; û daku debara xwe bikin, bêgav man ku koçî bajaran bikin. Piştî ku xwedîyên erdên fireh dest bi çandînîya mekîneyî kir, piranîya malbatên rênçber, ku li ser erd dixebitîn, karên xwe ji dest dan û koçberî bajaran bûn daku ji xwe re derfetên jîyanê peyda bikin. Xwedîyên erdên mezin, ku têkilîyên wan ên digel dewletê baş bûn, derfetên çandinîya mekîneyî bi kar anîn û mêrg ji xwe re kirin zêvî û ji ber vê yekê kesên ku debara xwe bi xwedîkirina pez û dewaran dikirin, ji van deran bi dûr ketin û ev yek bû sedem ku him hejmara wan kêm be, him jî ev kes xizan bin. Berfirehîya mêrgên li Tirkîyeyê, ku di pêncî salan de 44 mîlyon hektar bû, îro daketiye 12 mîlyon hektaran. Ev kêmbûna mêrgan li ***Kurdistan***ê bi awayekî berbiçav tê dîtin. Ji bilî kêmbûna mêrgan sedemeke din jî heye ku xelkê ku heywan xwedî dikirin, xizan bin. Ev yek jî ew e ku dewletê polîtîkayên xwe yên ji pêşdebirin û islaha xwedîkirina heywanan xurttir nekir.

Bûyerên bi vî rengî li Kurdistanê bûn sedem ku xelk ber bi bajaran ve koç bikin. Ev koçberî piranî ji gundan ber bi bajarên kurdan ve pêk hatin. Sedemên koçberîya vê demê, ku di navbera 1950 û 1980yê de ye, civakî û aborî ne.

Ji ber ku koçberî tevgereke gelek girîng a gelheyî ye, heger bi awayekî tund were jîyin, dibe sedem ku di struktura civakî de guherînên girîng pêk werin, ku encamên wan ên girîng jî hene. Koçberî ne tenê li cografya terikandî lê herweha li wê erdnîgarîyê, ku xelk koç dike, xwedî karakterekê weha ye ku dikare hevkêşîyên civakî yên heyî xera bike. Ji ber ku koçberî bi mirovan ve têkildar e; hemû nirx û guherîn, ku bi mirovan re têkildar in, di nav vê rûdanê de cih digirin. Lewma di koçberîyê de, koçberîya hêza karkirinê, sermîyan, çand û mêjî û hwd. hemû bi hev re pêk tên û li cografya terikandî dibin sedema kêmbûna gelheyî û xizanî.

Her çend cografya terikandî di her warî de xizan dibe jî, cografya ku xelk koç dike, digel çendîn pirsgirêkên aborî û civakî, dikare zindîbûneke aborî bijî. Li van deran pirsgirêkên wekî kar, xanî, debar, perwerdehî û tendurustî bandora xwe li ser komên koçber dike. Heger koçber çûne cografyayekê, ku lê struktureke cuda ya zimanî, çandî û etnîkî heye, ji bo koçberan pirsgirêka herî mezin entegrasyon, dejenerasyon û asîmîlasyon in.

Di rewşeke weha de koçber di nav dudilîyekê de dimînin; yan çand û adetên xwe bi awayekî hesûd bijîn û berdewam bikin, yan jî bi demê re nirxên çanda nû bipejirînin. Di rewşa pêşîn de, koçber wekî getto û kolonîyan bi awayekî nedîyar û lidervehiştî, lê belê herweha bi awayekî resen dê bijîn. Di rewşa duyemîn de jî ew nirxên çanda cografya nû çiqas pir bipejirînin, dê ewqas dev ji nirxên xwe yên çandî berdin û di demeke dirêj de di nav çerxa asîmîlasyonê de bibin xwedî şêwazeke nû ya jîyanê. Ev yek dê lihevnekirin û pevçûna navbera nifşan jî bi xwe re bîne. Di vê rewşê de civak dê di navbera entegrasyon û asîmîlasyonê de tengezar bibin û ev her du mijar dê hertim bên nîqaş kirin. Dîrejahî û tundîya vê pêvajoya êşbar bi mezinbûna koma koçber, rêxistîbûn û daxwaza wan a berxwedanîyê re girêdayî ne. Kurd li wan derên ku koç kirine, di vê serdemê de, wan her du rewşa bi hev re dijîn.

Koçberî, ne tenê parçebûna civakî, lê herweha perçebûna malbatî jî bi xwe re tîne. Ev parçebûn li gor mezinbûna koçberîyê dikare bibe sedema parçebûna neteweyî jî. Ji ber vê yekê ji bo kurdan koçberîyê, pirsgirêk û encamên gelek girîng derxistine holê. Ji ber ku kurd pirtir tûşî deportasyonê bûne, travmaya civakî ku di nav civaka kurd de tê jîyîn, gelek mezin e.

### II.2 ) Sedemên siyasî yên koçberîyê

Piştî 1920ê li Kurdistana Bakur ji bilî sedemên aborî û civakî, sedemên din ên koçberîyê hene. Bi ragihandina komarê re hebûna kurdan li Tirkiyeyê hat înkar kirin. Kurd, ku li gor îdeolojîya fermî ya dewletê tune dihatin hesibandin; di rastîyê de li ser warên xwe bi ziman, çand û pêkhatina xwe ya civakî û şêwaza xwe ya aborî dijîyan.

Dewletê dest bi bernameyeke bi navê **Şark Islahat Planı** (Bernameya Islahatê ya Rojhilatê) kir. Bi vê bernameyê re dewletê di warê kurdan de konseptên nû yên sîyasî, civakî û aborî ava kirin. Ev konsept dikarin li jêr serenavên asîmîlasyon, mişextî û qirkirinê werin kom kirin. Berîya her tiştî, hemû riyên ji bo trên û makîneyan ji rojhilatê ber bi rojavayê ve hatin ava kirin. Bi vî awayî berê kurdan dan hin bajarên rojava. Wê demê, herçend di xeta bakur û başûr de di navbera cihên herî nêzîk de jî çûn û hatin ne mumkin bû, lê belê xeta rojava û rojhilat pir hêsan hatibû çêkirin. Herweha li Kurdistanê nebûna sermayeguzarîyê bûye sedem ku kurd ber bi bajarên rojavayê ve koç bikin.

Sedema hemû tiştên kirî û tiştên nekirî, ku diviyan bihatan kirin, siyasî ne. Ên herî girîng di qanûnên mişextî û îskanê de ku ji alîyê dewletê ve hatin derxistin û sepandin. Bi qanûnên hejmar 1097, 1505, 2510, 2584 kurd bi darê zorê bi awayekî girseyî li hin bajarên rojava hatin îskan kirin (deportasyon) û di şûna wan de xelkê bi eslê xwe tirk hatin bi cih kirin. Kesên mişextkirî li derveyî cografya Kurdistanê hatin bi cih kirin, ku li wan deran de jî diviya bû gelheya wan bi ser % 5ê nekeve.

Koça herî mezin û sereke ji ber darbeya leşkerî ya sala 1980ê û şerê li dû wê ye. Reftarên li Kurdistanê nehiqûqî û bêrehm bûn. Gelek gund hatin şewitandin û vala kirin. Mêrg û çêrandina heywanan li gundîyan hatin qedexe kirin. Li gelek qadên fireh destûra xelk lê bijî nehat dan. Li gor rapora sala 1998ê ya Komîsyona Lêkolînê ya Parlementoya Tirkan, 3428 gund û mezra hatine vala kirin. Gelheyeke zêdeyî 3 mîlyon ji warên xwe hat rakirin û hin ji wan koçî bajarên Kurdistanê û hin ji wan koçî rojavaya Tirkîyeyê kir. Gelek nîşane û sedem hene ku piranîya van kesên koçber dê nema vegerin. Sedema sereke ya koça li Kurdistanê, ku di 30 salên dawîyê de pêk hat, şer e û plana dewletê ya bêkurdkirina herêmê ye ku şer ji xwe re kiriye hincet.

Nifşên ciwan ên koçber, ji ber li wan bajaran li jêr standartan jîyanê dijîn, bi hêrs in û wan şer jî bi xwe re bir wan bajaran. Niha metropolên Tirkiyeyê jî bûne qada şer. Ev yek nîşaneya teqînên mezintir ên civakî û siyasî dide.

Ji ber ku dewletê di 20 salên dawîyê de struktura demografîk a gelê kurd ewqas xera kir, ev yek dê di dahatûyê de hem ji civaka kurd û hem jî ji bo civaka tirk pirsgirêkên nû bîne rojeva sîyasî û civakî. Di vê merheleyê de weha xuya dike ku ne civaka kurd, ne jî dewleta tirk xwedî planên aşkere yên çareserîyê ne. Jê girîngtir, weha diyar e ku dewlet di vî warî de ne xwedî tu niyetan e. Dema ku ev pirsgirêk her du alîyan ji nişka ve, bêyî ku tu amadekarîyên wan hebin, zeft bike panîka ku derkeve dê çareserîya pirsgirêkê dijwartir bike.

* Nivîskar, lêkolînêr

** Bajarên ku li vê cografya blok de cih digirin ev in: Semsûr, Agirî, Ardahan, Batman, Bingol, Bêdlîs, Diyarbekir, Elazîz, Erzincan, Erzirom, Entab, Ixdir, Hekarî, Qers, Meletî, Mereş, Mêrdîn, Mûş, Sêrt, Sêwas, Şirnex, Dêrsim, Riha, Wan.


1 Ismail Beşikçi, Bicihkirina bi darê zorê ya kurdan, Weşanên Yurt, 1991 Ankara

2 Enstîtuya Îstatîskî ya Dewletî, Bultenên Serjimarîyên Giştî

3 Amke Dietert Scheuer, Li, Komara Tirkîyeyê Derfetên Çareserîyê ji bo Pevçûnê, Deutsches Orient Institut, Hamburg 1998

4 Erhard Franz, Li Tirkîyeyê Polîtîkayên Gelheyî, Deutsches Orient Institut, Hamburg, 1994

5 Mehrdad Izady, Kurd, Weşanên Doz, 2004, Istanbul

6 Osman Aydın, Demografîya Kurdistanê û Tevgerên Gelheyî yên li Kurdistanê, Apec Förlag AB, Stockholm, 2004


Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser kaxezê, 50 x 70 cm

www.arsivakurdi.org

## HEJMAR Û MIROV

# Derbarê nifûsa cîhanê de tesbîtên xapînok

GÉRARD-FRANÇOIS DUMONT *




Demografî çiqas tiştên klîşe li ser navê te tên gotin…

*"Rêjeya zêdebûna nifûsa mirovahîyê pir bêserûber e"*. Na, ne rast e, lewre ev bi dehan sal in, rêjeya zarokanînê bi awayekî zelal kêm dibe û li her derê, li bin tesîra tiştê ku weke "veguherîna nifûsê" dikare bê bi nav kirin û di wê pêvajoyê de rêjeya zarokanîn û mirinê ya ku berê pir bilind bû, kêm dibe

*"Divê em ji teqîneke mezin a nifûsê bitirsin"*. Bila dilê me rihet be: Bombe wê neteqe. Mezintirîn diyardeya sedsala XXIem wê ne mezinbûna bilez a nifûsê, lê belê wê pîrbûna nifûsê be.

*"Em ê li cîhaneke li bin giranîya serjimara zêde perçiqî, bijîn"*. Ev nêrîn jî ne rast e, ji ber ku bi pêşketina bajarbûnê zêdebûna nifûsê li ser erdên piçûk, dibe sedema kêmbûna serjimarê li herêmên din.

*"Pêlên koçberan yên Başûr-Bakur wê di nêzîk de bi ser me de bigirin"*. Îdîayeke wisa jî xwe dispêre bêparmayîna ji zanîna bîrbirinên nû yên koçberîyê dibin sedemê bigewdebûna livûtevgerên ber bi her alîyî ve û koçberîyên Başûr-Başûr jî beşeke wan a pir girîng e.

Bi kurtî, tiştekî weke "şênîya cîhanê" tuneye: Ev têgeheke gilover a bêwate ye; ev giloverbêjîya heqîqetên wisa ci daye ji wê yekê ku îfadekirina wan dişibe tevlihevkirina potikên paqijîyê û destmalan. ***Gîne*** û ***Portugal*** kêm-zêde xwedî heman nifusê ne (10,8 milyon û 10,7). (1) Baş e di vê rewşê de gelo mirov dikare bigihîje wê encamê ku ev her du welat di demografyaya cîhanê de heman cihî dagir dikin? Dibe ku ne wisa be. Ji ber ku hemû nîşaneyên wan ber bi hêlên dijber ve diçin: Rêjeya zêdebûna xwezayî ya nifûsa ***Gîne***yê, bo nimûne, têra xwe erênî ye (+ 3%) û ya ***Portugalê*** neyînî ye (- 0,1%).

Berpêşkirina nîşaneyên derbarê rewşa nifûsa cîhanê de, tê wateya nixumandina dînamîkên xweser: Dînamîkên welatên xwedî rêjeya bilind a zarokanînê û temenkurtîyê *(weke li **Nîjer** û **Maliyê**)* an jî dînamîkên welatên ku rêjeya wan a zarokanînê wisa qels e ku nagihîje rêjeya mirinê *(weke li **Rûsya** û **Japonyayê**)*. Li Japonyayê, bilindbûna berbiçav a rêjeya mirinê salên 2000ê xwe naspêre helwêstên xwekujîyê an jî rizîna pergala tenduristîyê, lê belê bi temamî xwe dispêre pîrbûnê. Rewş li Rûsyayê cuda ye.

Cîhan ji gel û şênîyên pir curbicur, ji nîşaneyên demografîk ên cihêreng û awayên kombûnên rengareng pêk tê, weke ku guhertoyên awarte yên gurbûna nifûsa hin deveran jî vê yekê nîşan didin *(mesela li **Bangladeşê** li her kîlomterekareyekê 1 141 kes, li **Gabonê** li her kîlometrekareyekê 5,9 kes dijîn)*. Lê belê li vir jî; xwegihandina encamê bi xwespartina van agahîyên navînî yên guhertoyan, dibe sedemê tesbîtên herî şaş.

### Nifûsa dinyayê di sed salan de 4.5 mîlyar zêde bû

Sedsala 20ê bû şahida veguherîneke bêhempa: Şênîbûna cîhanê çar qat li xwe zêde kir *(şênîya ku di sala 1900ê de 1,6 milyar bû, di sala 2000ê de gihîşt 6,1 milyaran)*. Vê zêdebûnê ji ber encama çar diyardeyan xwe da der. Ji dawîya sedsala 17ê ve êdî rêjeya mirina şênîyên, hin welatên li hêla nîvkureya bakur, berejêr bû (zarokî, zarok-ciwan û dayikan) û di sedsala 19ê, dûre jî di sedsala 20ê de, li tevahîya welatên Başûr ew yek bû rewşeke gelemper *(mesela li **Hindistanê**, ji salên 1920ê û vir ve)*. Sedem jî ev bûn: Pêşketina tibbî û dermançêkerîyê, berbelavbûna awayê jîyana sihî û pêşketina teknîka çandinîyê ya ku rê li jîyaneke pir bi rêkûpêk û cihêreng a xwarin û vexwarinê vekir. Di du sedsalan de, rêjeya nûzayîyên ku berîya bigihîjin yeksalîya xwe dimirin, bi navincî ji sedî 80 daket, lê belê li welatên herî pêşketî ew rêje 50 caran ji berê kêmtir bû. Rêjeya mirinê ya zarokên ciwan û yên gihîştî hê kêmtir bû û hetta, ya jinên li ber zayînê jî gihîşt encameke ku di dengeya cinsan de guherînek pêk anî: Zayenda ku "qels" dihat zanîn ji alîyê demografîk ve bû ya herî xurt –ev yek berê di dîroka mirovahîyê de ti caran pêk nehatibû.

Li alîyê din, ji salên 1970yê ve bi xêra pêşdebirin û başkirina dermanan û bingehên tenduristîyê û dermankirinê, kesên bi temen niha pir direjtir dijîn. Têkûzbûna mekanîkî ya hin pîşeyan jî li alîyê din şertûmercên pir baş ên xebatê afirandin û bi kêrî direjbûna temenê mirovan hatin. Temenê mirovan di nav sedsalekê de hema bêje bi qasî du qatan li xwe zêde kir *(temenê mirovekî yê ku di 1900ê de 37 sal bû, di 2010ê de gihişt 69 salan)*.

Daketina dîrokî ya zarokanînê dibe sedemê kêmbûneke bilez a nifûsê: Rêjeya salane ya zêdebûna navînî ya di dawîya 1960ê de ji çendeya herî bilind a dîrokî ya zêdetirî ji sedî 2, (gelek welat hingê tam li nîvê pêvajoya raguherîna xwe ya demografîk bûn) di 2010ê de daket ji sedî 1.2. Di pênci salan de, nifûsa cîhanê bi vî awayî ji sedî 142 zêde bû: 2.5 milyar di sala 1950yê de, 6,1 milyar di sala 2000ê de. Li gor projeksîyona navînî ya ***Rêxistina Neteweyên Yekbûyî*** (RNY), tê payîn ku ew ê di sala 2050yê de hilkişe 9,1 milyaran. Gelo hê jî pêwist e behsa fûrîna nifûsê were kirin? Eger van 9.1 milyar kesan gişan koçî Dewletên Yekbûyî kiriba û tevahîya xaka cîhanê li pey wan weke çolistan bimaya, gurbûna nifûsa dewletên Yekbûyî wê ji ya herêma ***Ile-de-France*** ya niha hê jî firktir ango ji alîyê gurbûna nifûsê ve kêmtir bûya...

### Pîrbûn wê bibe diyardeyeke nû ya sedsala 21ê

Pîrbûn wê bibe diyardeyeke nû ya sedsala 21ê. Ew dikare were pîvan, geh bi zêdebûna rêjeya kesên bi temen *(li gor pêşbînîyên RNYê: 5.2% sala 1950yê, 7.6%, sala 2010ê û 16.2% sala 2050yê,)* (2), geh jî bi veguherîna temenê navînî *(24 sal di sala 1950yê de, 29 sal di sala 2010ê de, û bi qasî 38 sal di sala 2050yê de)*. (3) Li alîyekî, direjbûna jîyê mirovan, xeleka nifşê temenê sêyemîn jî firehtir kir. Li alîyê din, kêmbûna zarokanînê hejmara nifşên ciwan daxist; bi taybetî li welatên li qonaxa "zivistana demografîk" tesîrên vê yekê pir mezin in; li wan welatan rêjeya zarokanînê ji dehan salan û vir ve ye têrê nedikir ku şûna nifşên berê dagire *(ango serê her jinê bi hesabekî navincî 2.1 zarok)*. Li van welatan, tenê pêngaveke pir mezin a zarokanînê *(û ne pir bi derengî, lewre hejmara jinên di temenê zarokanînê de bi awayekî berbiçav kêm dibe)* an jî pêlên mezin ên koçwergirîyê yên ciwan û zayok dikarin wan bigihînin sînorê şûngirtina nifşan a besît.

Di nav tevahîya nifûsê de pîvana beşa zêde dibe ya kesên navsere, pîrbûna civakê diyar dibe. Lê belê wekî din, nirxandina zêdebûna hejmara mutleq ya kesên temenê wan şêst û pênc û jortir jî –ev yeke weke "mezinbûna para pîran" tê bi nav kirin– pîvaneke ji bo diyarkirina pîrbûnê ye: 130 milyon sala 1950, 417 milyon sala 2000ê de, û dibe ku di sala 2050yê de ew bigihîje 1.486 milyaran. Ev ferqa di navbera pîrbûn û mezinbûna para pîran de, welat bi welat diguhera û dibe sedemê peydebûna veguherînên pir nakok û dijber. Mesela li bin tesîra, pergeleke koçwergir a nifûsên ciwan pêşwazî dike û yên pîrûkal dûr dike, li hin welatan ev her du diyarde bi heman awayî venaguherin.

Bajarwarî weke diyardeyeke sereke xuya dike, ji ber ku di sala 2008ê de, li gor hejmarên ***Neteweyên Yekbûyî*** *(ji alîyê şeklî ve hatine guftugokirin lê belê ne ji alîyê cewherî ve)*, niştecîyên bajaran cara pêşî ji yên gundan zêdetir bûn. (4) Ev e paradoksa mezin a sedsala 21ê: Ti caran nifûsa cîhanê ewçend zêde qelebalix nebûbû û ti caran li qadên ewçend teng û piçûk li ser hev kom nebûbû: Cîhan li bin tesîra cureyekî motora sê demî bi awayekî bêperwa vediguhere *"metropolbûnê"*. Motora yekem dixwaze li qadên bajarên herî qelebalix, giranîyê bide mezinbûna sektora xizmetê û dixwaze hatinîyên diravî yên berdestbûyî yên ji zêdebûna berhemdarîya çandinîyê pêk tên, vekişe nav vê sektorê. Di çarçoveya pirbûna cureyên pîşeyan, livûtevgera pîşeyî ya tê hêvî kirin, an jî ji neçarî û herwiha ji ber xizanîya li cîhana gundewar, motora duyem giranîya xwe dide mezinkirina karûbarên avahîlêkirinê yên ji bo zêdekirina derfetên îstîhdamê. Herî dawî jî, metropol dibin xakên ku bersiva herî baş didin pêdivîya bicihkirina "qada cîhanî", bi taybetî jî bi hêsankirina pêwendî girêdanan. Li alîyê din, ew pêwendî girêdan bi karaktera xwe ya vekêş a girêdayî asta wan a deshilata siyasî ya têkildarî statuya wan a dezgehî *(paytextê herêmî, neteweyî, biryargehên dezgehên gelemperî yên navneteweyî)* û şaxên bîyanî yên fîrmayên navneteweyî bi giranî li bajarên mezin bi cih dibin.

Gurbûna liserhevkombûna bajarwarî li gor her welatî diguhere û xwedî dîmenekî nakok e: Li Hindistanê ji sedî 29ê welatîyan li bajaran dijîn, li ***Kongoyê*** ev rêje ji sedî 33, li ***Almanyayê*** ji sedî 79, û li ***Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê*** ji sedî 79 e. Egerên vê yekê jî pir guhêrbar in. Rêjeya bilind a ***brezîlyayî*** xwe dispêre mîrateya mêtingehîya ku giranî daye sazkirina bajarên bi pêkanîna kontrola siyasî û aborî ya welêt wezîfedar kirî û bi navendîkirina tevahîya danûstandinên bi ***Portugalê*** re. Rêjeya kêm a ***çînîyan*** a bajarwarîyê jî xwe dispêre egera pergala komunîst a ku demeke direj karkerên gundewar diyar kirin; di vê çarçoveyê de, ***Pekîn***, bi 12 milyon niştecîyên xwe, di eslê xwe de paytextekî ji alîyê nifûsa xwe ve pir firk e dema ku nifûsa pir mezin a vî welatî li ber çavan were girtin. Li deverên din, pevçûn û şeran gundewar xalî kirin û di encamê de nifûsên bajarên weke ***Bogota, Amman, Kalkuta*** an jî ***Kînsaşayê*** pir zêde kirin.

Welatên pir navendîkirî, yên weke ***Fransa*** an jî ***Îranê,*** bi bajarwarekî sermezin hatine zirx kirin û ji alîyê paytextên siyasî yên serdest ve di hemû waran de tên bi rê ve birin: Aborî, diravî, zanîngehî û çandî. Welatên din ên weke ***Spanya*** an jî ***Bolîvya*** pala xwe didin bajarwarîyeke du serî û ji du bajarên mezin tên bi rê ve birin (***Madrîd û Barselona; La Paz û Santa Kruz***); her çi ***Almanya*** ye, ew bi girêdana gelek bajarên biaheng hîyerarşîzekirî, weke "tevneke bajarwar" bi mîzan hatiye bi rêk xistin.

Raguherîna nifûsî ya li gelek welatên Başûr didome, "zivistana nifûsî" li hin welatên Bakur, pîrbûna şênîyê, bajarwarîya bêhempa ya nû; ev bi xwe ye dîmenê nifûsî yê ku heta niha bigewde nebûbû. Wekî din heke bi ser vê ve, pirsgirêka pêlên koçberîyê jî were zêde kirin: 214 milyon kes (5) bi awayekî berdewam ne li welatekî ku lê hatine dinê, dijîn –di nav vê hejmarê de ne penaber û ne jî kesên ji cih û warên xwe hatine derxistin-, hene.

Berevajîyê ramanên wergirtî, koçberî bûne pêlên rêkûpêk û berdewam. Û bi piranî jî legal in: Koçberên qaçax ên ku zêde hatine medyatîze kirin, bi awayekî statîstîkî ne xwedî rêjeyeke bilind in. Dîrok û erdnîgarî bi kêrî sazbûna "cot koçberîyên" welatan hatin. Ew dikarin li ser cîranîya erdnîgarî ava bibin –***Burkina Faso*** û ***Perava Îvorîyê***, ***Kolombîya*** û ***Venezuela, Meksîka*** û ***Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê***, ***Malezîya*** û ***Singapour, Îtalya*** û ***Swîsre …*** –, an jî li ser dîrokeke hevpar –***Filîpîn*** û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ***Cezayîr*** û ***Fransa***, ***Hindistan*** û ***Birîtanya Mezin*** û hwd.–, bi kurtî, girêdanên mîrasî yên mêtingehî û xwelêgirîyê, *de jure [hiqûqî]* an jî *de facto,* piştî dawîlêhatina li mêtingehîyê. Eynî weke tevgera bajarwarîyê, eger sedemên siyasî *(şer, pevçûnên civakî, rejîmên azadîkuj)* mirovan ber bi koçberîyê daf didin, egerên siyasî jî motora sereke ya koçberîyê ne. Di sedsala 19ê de, xizanîyê hejmareke mezin spanî, swîsreyî û îtalî neçar kiribû ku koçî ***Amerîkaya Latîn*** bikin. Rewşa nifûsî bi xwe ancax dibe sêyemîn egera koçberîyê: Di sedsala 19ê de, Fransa ji ber daketina pir zû ya zarokanînê, bû yekane welatê koçwergir. Ji ber valahîya di pîşesazîya zeneetkarîya hin qadên kar de, di sedsala 19ê de, daketina nifûsa çalak li gelek welatên pêşketî bû sedemê bangên ji bo koçwergirîyê.

Du-qutûbîya navbera welatên niştecîyên wan koç dikin û yên pêşwazîya koçê dikin, li cihekî rawestiya. Koçberî her diçe vediguhere rewşeke geryanê, ango dewrûdaîmê: Mesela ***Fas*** welatek e ku welatîyên wê ji bo koçê bêhtir dikevin ser rêya ***Ewropa*** û ***Amerîkaya Bakur***, welatê ku dibe derbasekek ji bo welatîyên Sahraya Başûr a Afrîkayê ku dixwazin xwe bigihînin Ewropayê, ango welatekî ku welatîyên Başûrê Sahrayê -bêyî ku karibin pêşbînîya tiştekî wisa bikin– dawî anîn li kudandina rêya xwe ya koçberîyê. Hetta, Spanya jî welatekî koçê ye, bi taybetî ji bo koçberên muteşebbisî ber bi welatên Bakur û Amerîkaya Latîn ve, welatekî derbasgeh ji bo afrîkîyên ku diçin Fransa û welatekî koçwergir ji ***Fas, Romanya*** an jî ***Amerîkaya Andî***. Li wêdetirî wêneyê nexşeyî yê ferqa navbera koçwergirî û koçşandêrîya (ku gurbûna pêlên her duyan dinixumîne) her welatî, îro piranîya welatan van her sê fonkosîyonan di heman demê de pêk tînin.

* Mamosteyê Zanîngeha Parîs-Sorbonne, Gerînendeyê kovara Population & Avenir

1 Ji bilî têbinîya dijber, ev hejmar ji nivîsên Jean-Paul Sardon hatine wergirtin, "La population des continents et des pays [Şênîya parzemînan û welatan]", Population & Avenir, hejmar° 700, mijdar -kanûn 2010

2 Hejmarên parvebûna nifûsê yên RNYê

3 Heman çavkanîya li jor

4 Bixwînin: Dosyaya me ya bi navê "Mégapoles à l'assaut de la planète [Qirasebajarên li ber dagirkirina cîhanê]", Le Monde diplomatique, nîsan 2010

5 Hejmara "Koça navneteweyî ya 2009ê" ya Parvebûna nifûsê ya RNYê

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.arsivalturkiye.com

# Dema ku porê Çînê spî bû

ISABELLE ATTANÉ *

Çawa ku giraniya serjimara wê - nexasim hejmara çînîyên di temenê karkirinê de - ji bo dînamîzma aborî ya welêt kozek bû, kêmbûna wê ya nisbî û mezinbûna hejmara pîrûkalan birêveberan dixe nava fikaran.

Di sala 2010ê de bi 1.35 milyar mirovan, ango her ji pênc şênîyên li ser rûyê erdê yek jê çînî ye, ***Çîn*** welatê dinyayê ye ku herî zêde mirov lê dimînin. Ew ê hê herî kêm sîh salên din jî wisa bimîne. Lê belê sala 2030ê, ew ê şûna xwe ji ***Hindistan***ê re bihêle ku hingê wê serjimara wê bi bîst milyonan ji ya ***Çîn***ê bêhtir be. Para wê her diçe kêm dibe: Sala 1950yê serjimara Çînê % 22ê serjimara dinyayê pêk dianî û îro kêmî % 20ê wê pêk tîne. Sedema vê jêkêmbûna nisbî ya di demografîya cîhanê de qismî, zêdebûna harîqulade ya serjimara hin herêmên dinyayê yên bi pêş dikevin e; weke ***Afrîka*** ku giranîya wê di serjimara dinyayê de ji sala 1950yê heta 2010ê ji % 9ê gihişte %15ê û ***Hindistan***a ku giranîya serjimara wê di nav heman demê de ji %15ê gihişte %18ê. Lê ne bi tenê ev e sedem.

Sedema din a vê kêmbûna nisbî, bi awayekî xurt kêmbûna mezinbûna wê ya demografîk e. Sedema vê ya sereke jî, siyaseta bisînorkirina zarokanînê ye ku ji salên 1970yê ve tê pêk anîn – siyaseta herî hişk e ku demeke evqasî dirêj hat ferz kirin. Piştî ku nêzî dehsalekê (1971-1978) pesnê anîna du zarokan ji bo jin û mêrên li bajaran û sê zarokan ji bo yên li gundan hat dayîn, desthilatdarîyê bi lez kontrola xwe hişk kir û ji sala 1979ê û pê ve qaîdeya anîna zarokeke bi tenê li ser beşa mezin a şênîyan hat ferz kirin. Hingê ev tedbîr weke şertê bivê nevê hat pêşkêş kirin ji bo gihîştina armanca modernkirina aborîyê ya ku ji 1978ê pê ve rêveberê reformxwaz **Deng Xiaoping** pê radibû: Vê yekê destûr dida ku derfetên dewletê ji bo mezinbûna aborîyê werin veqetandin û pê re jî asta jîyanê baştir dibû.

Jinên çînî sala 1970yê, navincî, hê nêzî şeş zarokan dianîn, îro ev hejmar ji diduyan kêmtir e, ango hema hema bi qasî welatên herî zêde pêşketî yên dinyayê kêm e ev rêje. Bi heman rengî di salên 1970yê de serjimar salê bîst milyonan zêde dibû, lê belê di dehsala heta bi 2010ê de, navincî, salê 7.5 milyon li serjimara ***Çîn***ê zêde bûn –ango sê caran ji salên 1970yê kêmtir. Di nîvê sedsala em tê de, giranîya demografîk a *Çînê* wê êdî nemîne: Serjimara wê % 16ê serjimara dinyayê pêk bîne, ya hevrika wê Hindistanê wê bibe % 18 û ya Afrîkayê % 22.




Heta niha hêdîbûna mezinbûna ***Çînê*** ya demografîk bê virde wêde xwedî kozeke harîqulade bû, hem ji bo pêşketina wê ya aborî, hem jî ji bo başbûna giştî ya asta jîyana şênîyên wê. Di destpêka sedsala 21ê de Çîn bi vî rengî veguherî aktoreke elzem li ser dika aborî ya cîhanê. (1) Çavkanîya vê serketinê di reformên kurahîya sîstema hilberandinê de bû ku ***Deng Xiaoping*** ew ber bi dawîya salên 1970yê dan dest pê kirin. Bi xêra van reforman hilberînerîya kar jî gelekî zêde bû. Heke sûd ji konjuktireke bi taybetî bikêrhatî wernegirta, ev derbasbûna aborî wê evqasî berdar nebûya.

Ji nîvê salên 1980yê ve di destê ***Çînê*** de koza herî mezin ev bû: "*Bonuseke demografîk*" ya îstîsnayî. Ya rastî, li vî welatî anîna zarokan pir kêm bû, lê belê dîsa jî serjimara wê ya pîr hê jî nisbî kêm e. Bi vî rengî li Çînê serê kesekî di warê aborî de girêdayî 2.1 mirovê gihiştî hene, li ***Japonyayê*** ev hejmar 1.3, li ***Hindistanê*** 1.6 û li ***Brezîlyayê*** 1.8 e. Halê hazir % 70yê çînîyan di temenê karkir (15-59 salî) de ne, ev rêje li ***Japonyayê*** % 56, li ***Hindistanê*** % 61 û li ***Brezîlyayê*** % 66 e. Lê belê, ji sala 2050yê û pê ve ev rêje wê li ***Çîn***ê bi tenê % 54 be û li *Hindistan*a ku hevrika wê ya herî yekser e, gihiştibe % 63yê.
Êdî niha, hêza heyî ya ***Çîn***ê ya li ser dika aborî ya cîhanê hinekî ji vê çarçoveya îstîsnayî û xwedî îmtiyaz a demografîk tê, lê belê ev jî rewşeke derbasbûnê ye. Ji nîvê vê sedsalê û pê ve *"Bonusa wê ya demografîk"* wê êdî bi tevahî hatibe xerc kirin û hingê li ***Çînê*** bi qasî kesên karkir çalak, kesên girêdayî û hewceyî wan wê hebin, rêje jî wê serê 1.1 mirovên gihiştî yên çalak, kesekî girêdayî û hewce hebe; ango wê du caran ji rewşa 2010ê lawaztir be.

## Kesên teqawidbûyî para bêhtir li malbatên xwe bar in

Ev serûbinbûna strukturel ku xwe bi pîrbûna bi awayekî îstîsnayî û bi lez a serjimara *Çînê* dide der, sedema wê ji dirêjbûna temenê mirovan bêhtir, kêmkirina anîna zarokan e. Ev taybetmendîyeke çînî ye: Pîrbûneke ku bi tevahî ji alîyê siyaseteke kontrola zarokanînê hat pêk anîn; bi sînordarkirina hejmara zarokan bi awayekî mekanîk, para pîr û kalan di nav civakê de hat zêde kirin. Ji niha heta 2050yê hejmara çînîyên temenê wan 60 û bêhtir wê sê caran ji berê zêdetir bibe û bigihije % 31ê ango 440 milyonan ku bi qasî serjimara Ewropayê ya niha ye. (2) Ji du çînîyan yek wê ji 45 salan bêhtir emr kiribe, di 2000ê de ev rêje hê ji çaran yek bû. Ango welat wê bigihîje asteke pîrbûnê ya ku mirov dikare bide ber Japonyaya îro. ***Japonya*** xwedîya serjimara herî pîr a dinyayê ye. Bê guman wê bandora vê yekê li ser aborîya ***Çînê*** jî hebe.

Di bin cot-bandora zêdebûna mesrefên teqawidbûnê û tenduristîyê, û kêmbûna dahatên bacê de ev yek, serê pêşî li ser milê dewlet û civakê, barekî malî di zêdebûnê de ye. Tevî ku ji bo welatên mîna *Japonya*yê ku herçend % 30ê serjimara wê kal û pîr in jî, sêyemîn hêza aborî a cîhanê dimîne, ev yek kozek be jî, ji bo ***Çînê*** ev hevkêşe tevlîhevtir e. Li alîyekî aborîya ***Japonya***yê para bêhtir aborîyeke xizmetê ye: Sektora sêyem ji sê paran diduyên (% 68) nifûsa çalak dixebitîne (ev rêje li *Çîn*ê sala 2008ê % 27 bû) û ji çar paran sisiyên *Hilberîna wê ya Neteweyî ya Nesafî* (HNN) pêk tîne, li *Çîn*ê ev rêje % 40 e. Li alîyê din li *Japonya*yê hatinîya maddî ya pîr û kalan nêzî ya karkirên çalak e, pîrbûn li wir vediguhere dînamîkeke nûbûn û serfkirinê. (3) Rewşa li *Çîn*ê ne wisa ye: Mirovên kal û pîr hê jî para bêhtir li derveyî sîstema teqawidbûnê ne û asta jîyana wan bi giştî kêm e. Hê divê her tişt yan jî hema hema her tişt bê kirin. Sîstema teqawidbûnê ya bi dabeşkirinê, ya ku ji aborîya kolektîf a kevin hatiye girtin, bi tenê bi kêrî hindikahîyekê tê ku çi bigre bi tenê ji bajarîyan pêk tê, û para bêhtir bi tenê asteke herî kêm ya heyatî dide mirovan. Dewlet hemin hewl dide sîstemeke civakî ya giştkirî bi cih bike, ku wê bi kêrî herkesî were. Lê belê, hin şaredarî ji niha ve berê xwe bidin vî alîyî jî –hinan ji wan avakirina sîstemeke taybet bi ser xist ku bi parên mesrefê yên ji şirket û mûçegiran tên stendin dixebite– li asta neteweyî ev yek bi tenê di axaftinê de dimîne, nexasim jî li derveyî bajaran.

Di nîvê dehsala pêşî ya 2000ê de bi tenê ji çar kesên teqawidbûyî yekî bi xêra mûçeyê xwe yê teqawidîyê debara xwe dikir. Çaryekeke din jî bi xêra karê xwe debara xwe dikir, lê nîvê mayî para bêhtir xwe dispart endamên malbata xwe –, bi piranî zarokên xwe.

Wekî din bihevrejîyana nifşan di bin banekî de ya ku demeke dirêj yekane çareserîya girtina ser xwe a barê mirovên pîr û kal bû, êdî gihiştiye sînorên xwe yên dawîyê. Tevî ku qanûneke sala 1996ê ketî meriyetê li malbatan û nexasim li zarokan ferz dike ku debara xizmên xwe yên pîr û kal misoger bikin jî, konjuktura heyî zehmet dike ku ev hevgirtina malbatî were pêk anîn. Bi hilweşîna pîramîda temenan a di muddeta jîyanê de li pey hev û ji ber kêmbûna zêde ya hejmara zarokan, barê ku her kesê karkir ê çalak digre ser xwe ku êdî mirov hew karibe ragire. Ma çînîyekî ciwan, jixwe dema ew bixwe zarokê bi tenê be, tevî hevsera xwe çawa debara dê û bavên teqawid bike –heta du dê û bavan heke em xwezûr û xwesûya wî jî bihesibînin? Bi ser de jî awayê jîyanê nexasim li bajaran her diçe hindiktir bi kêrî bihevrejîyana nifşan tê: Xanî û daîreyên her diçe buha dibin, pir piçûk dimînin; daxwaza rehetîyê û biserêxwebûnê jî her diçe mezin dibe; ji bo debarê jî jîyan her diçe buhatir dibe.

Wekî din, bazara kar gelek caran ciwanan neçar dike ku devera lê ji dayik bûne biterikînin da ku karekî peyda bikin; ev wan dûrî dê û bavên wan dike, û ev yek jî girtina ser xwe a barên dê û bavan zehmettir dike. Êdî ji her pênc xaneyan yek ji herî kêm sê nifşan pêk tê, lê belê gelo ev rê û resm dikare xwe hê demeke dirêj li ber xweferzkirinên jîyana modern bigire?

Halê hazir îhtimala bilindkirineke temenê teqawidîyê ku pir kêm e (ji bo mêran 60 sal ji bo jinan 55 sal) bi awayekî demî ji rojevê hat

www.arivakurdi.com

derxistin. Qet nebe ji bo mêran. Hukûmet dixwaze temenê destpêka teqawidbûna jinan jî derêxe asta hempîşeyên wan ên mêr.

Bi rengekî giştîtir, ji bo desthilatê zehmet e xwe li gor pîrbûna serjimara xwe eyar bike. Dîsa jî ji bo ku karibe hêvî bike ku rîtmeke mezinbûna aborî ya dikare were hilgirtin di paşerojê de jî dewam bike, welat divê sîstema xwe ya bacê ji nû ve bi rêxistin bike, da ku girtina ser xwe a barê nifşê xwe yê sêyem bigire ser xwe û bi vî rengî ji vî nifşî re asteke jîyanê ya bi rûmet misoger bike. Ew ê bê guman herweha neçar be aborîya xwe jî ji nû ve ava bike, bi rengê ku meyla xwe bide ser sektora xizmetê û berxwarina hundir, nexasim a pîr û kalan.

Erê pîrbûn xwe weke pirsgirêkeke mezin li ser civak û aborîya çînî ferz dike, lê belê ew ne pirsgirêka bi tenê ye. Lewma, ji ber ku rayedarên çînî zarokanînê sînordar dikin, Çîn herweha bi kêmbûna jinên serjimara xwe re jî rû bi rû ye. Hemin, halê hazir bi tenê li ser % 36ê jin û mêran ferz e ji yek zarokê bêhtir neyînin. Li derveyî bajarên nozdeh herêman (4) heke zaroka wan a pêşî keç be, ew dikarin zarokeke din bînin –ev jî % 53yê serjimarê pêk tîne. % 11ê mayî ku piranîya wan jin û mêrên ji hindikahîyên etnîk in, dikarin 2 yan jî bêhtir zarokan bînin, zayenda zaroka pêşî jî ne girîng e.

## Piranîya çînîyan nakevin ber ferza siyaseta zarokeke bitenê

Dîsa jî pirsgirêk e ku li gor texmînan 60 milyon jin ji serjimara ***Çîn***ê kêm in. Sedema vê kêmbûnê tercîha xurt a çînîyan a ji bo kuran e. Ev yek dike ku çînî hin caran keçên xwe ji holê rakin, yan bi riya jiberxwekirina zarokê yan jî bi guhnedanê ku dibe sedema mirineke zû ya pitikê. Bi vî rengî, ***Çîn*** veguherî welatê dinyayê yê ku rêjeya serjimara wî ya mêr herî zêde ye (sala 2010ê serê 100 jinan 105.2 mêr diketin). (5) Bi awirekî bi tevahî demografîk mirov li mijarê binêre, rewşa jinan ya herî xirab e. (6)

Bêtewazûnîyeke bi vî rengî ya di navbera cinsan de bê zirar nîne. Pêşî bi tevahî li gor mezinbûna demografîk: Kî îro bibêje hindik jin, ji bo sibe dibêje hindik zarok û bi vê re jî mezinbûneke demografîk ya hêdîtir dibe. Li gor texmînan, bi tenê ji ber kêmbûna jinan, sala 2050yê nêzî 20 milyon zarokanîn wê pêk neyên. Wekî din ev rewşa ne normal wê ferz bike ku hejmara mêrên nezewicî zêde bibe: Dibe ku ji destpêka dehsala 2010ê û pê ve, di navbera milyonek û 1.5 milyon çînîyan hersal ji ber nebûna jinan, nikaribin bizewicin.

## Di dehsalên bê de Çîn divê du pirsgirêkên mezin çareser bike

Di encamê de dibe ku bandor yekser li aborîya çînî bibe. Di pîşesazîyê de ku nîvê dewlemendîyê hildiberîne, jin ji mêran bêhtir in. Li fabrîkeyên lîstokan, cil û bergan û alavên piçûk ên elektronîk çêdikin, jin piranî ne. Di çandinîyê de ku mêr her diçe jê bi dûr dikevin, îro jin ji sê paran diduyên karkerên çandinîyê pêk tînin.

Di paşerojê de serjimara karkir a çalak wê her biçe bêhtir bibe mêr: Sala 2050yê rêjeya mêran di nav 15-49 salîyan de wê % 54 be, îro ev rêje % 51 e. Ango di vê beşa temen de herî kêm 100 milyon (7) jin wê ji bazara kar kêm bibin. Weke encam ev yek dikare bibe sedema kêmbûneke hêza kar di sektorên pîşesazî û çandinîyê de.

Ji van alîyên aborî û wê de, ev rewş pirsa rêzgirtina ji mafên jinan re û wekhevîya cinsan jî derdixe pêş –pirseke ku îro nisbî hatiye pişt guh kirin.

Di dehsalên bê de ***Çîn*** divê du pirsgirêkên mezin çareser bike: Nermkirina bandorên pîrbûna serjimara xwe û çareserkirina pirsa mêrbûna serjimara xwe. Çareserîyeke giştî wê bibe dawîlêanîna li siyaseta kontrola zarokanînê. Bi ciwankirina pîramîda temenan, ew ê ne bi tenê destûrê bide hêdîkirina pîrbûna serjimarê, wê herweha bike ku kêmtir jin û mêr, keçên xwe ji holê rakin û mêrbûna serjimarê jî hêdî bikin.

Li ***Şangayê*** ji çar şênîyan yek ji niha ve ji 60 salan bêhtir emr kiriye û di hin sektoran de kêmbûna karkeran xwe dide his kirin. Ev bajar îro "bajarê pîlot" e. Ev yekane şaredarî ye li welêt ku kampanyayeke hestîyarkirinê dimeşîne, da ku beşeke jin û mêran (ku bi xwe jî zarokên bi tenê bûn) teşwîqî anîna zarokeke duyemîn bike. Hewldaneke hêjayî pesndayînê ye ... Lê belê bê encam ma. Rêjeya anîna zarokan di nav yên herî kêm ê cîhanê de ye: Sala 2005ê serê jinekê 0.7 zarok diket!

Em niha vê bibêjin, heke kontrola zarokanînê bê sist kirin, weha xuya ye îhtîmaleke kêm e ku ***Çîn*** pîrbûna serjimara xwe bi zêdebûna zarokanînê qismî çareser bike. Jîyana modern û bilindbûna mesrefên perwerde û xwedîkirina zarokan piranîya jin û mêrên çînî neçar dike ku ew bi xwe zarokanîna xwe bi sînor bikin. Hîç şik û guman tê de nîne ku yekane alternatîv wê bibe reformeke di kûrahîya sîstema wê ya parastina civakî de û herweha ji nû ve avakirineke aborîya wê, da ku bi şertên wê yên demografîk ên nû re bêhtir li hev bike.













* Demograf û sînolog e li Enstîtûya Neteweyî ya Lêkolînên Demografîk (INED), Parîs, nivîskara *En espérant un fils… La masculinisation de la population chinoise [Bi hêvîya kurekî … mêrbûna serjimara Çînê]*, Ined-Puf, Parîs, 2010, û ya *Au pays des enfants rares. Vers une catastrophe démographique chinoise[Li welatê zarok lê kêm in. Ber bi felaketeke demografîk a çînî ve]*, Fayard, (wê çap bibe), 2011.

1 Martine Bulard, "Pékin cherche à concilier puissance et stabilité" *[Pekîn hewl dide hêz û îstîqrarê li hev bîne], Le Monde diplomatique*, adara 2011ê

2 Ji bilî Rojhilata Ewropayê

3 Evelyne Dourille-Feer, (2007), "Démographie et dépendance au Japon" *[Demografî û hewcedarîgirêdana Japonayay], Institut Silver Life*, 30ê gulana 2007ê

4 Li Çînê 22 herêm (Pekîn Taywanê weke herêma 23yê dihesibîne), 5 herêmên xweser, 4 "şaredarî" û 2 herêmên taybet hene

5 Ev rêjeya mêrtiyê ya navikî ye ku encama jimartina nifûsê ya dawî ya Çînê ye. Lê belê li gor NYyê ev rêje ji bo Çînê 108 û ji bo Hindistanê 107 e

6 Isabelle Attané, "L'Asie manque de femmes" *[Ji Asyayê jin kêm in], Le Monde diplomatique*, tîrmeha 2006ê

7 Di heman demê de serjimara mêrên temenê wan di navbera 15-49 salan de wê bi tenê qederê 80 milyonan kêm bibe

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurdi.org

# Gerstêrkeke serjimara wê zêde?

GEORGES MINOIS *

Demeke dirêj birêveberên siyasî ji nêz ve li beridîna serjimara xwe koliyan, dema ev dikirin jî hejmar û hêz tevlîhev dikirin. Pirsa pîrûkalbûnê wê mohra xwe li sedsala 21ê bide û di heman demê de çîroka hezarsalî ya serjimara pir zêde dîsa derdikeve holê.

Xeyaletê nifûsa zêde, bi saya kêmbûna stokên xwarinê ji bo demekê û xerabûna bilez a jîngehê, di 2008ê de, ji nû ve derket holê. Nêrînek li hin jimaran mirov qet jî piştrast nake: Li dinyayê her roj 218 000 zikên divê werin têr kirin, zêde dibin, di salekê de dike 80 mîlyon, jimareke bi giştî çi bigire 7 mîlyar nifûs, serfkarîyeke ku her diçe zêdetir dibe... Bi nisbet çavkanîyên dinyaya me, diyar e ku nifûs pir girantir dibe.

Mirovayetî, dîsa jî ji ber metirsîya ji nifûsa zêde li benda destpêka sedsala XXIê nema. Çar sedsal berîya serdema me, gava ku nifûsa diyayê ji 200 mîlyonan kêmtir bû, **Eflatûn** û **Arîsto** ji dewletan xwestiye zarokanînê bihişkî kontrol bikin: Ev tê wê maneyê ku têgeha nifûsa zêde ji jimarê bêtir meseleyeke çandî ye. Ji destpêka peydebûna Incîlê ve, ku dibêje "Pêş bikevin û pir bibin", em dibînin ku yên dixwazin nifûs zêde bibe û partîzanên kontrolkirina zarokanînê şerê hev dikin. Yên yekem pirsa nifûsa zêde weke xapînokekê diyar dikin; yên duwem balê dikşînin ser encamên wê.

Heta demeke dirêj jî, di destê me de statîstîk tunebûn. Ji ber ku nedibû mirov xwe bisipêre jimarên pêbawer, minaqeşe berîya hertiştî felsefî, dînî û siyasî bû. Lê hîn îro jî, tevî hebûna lodên doneyên ku li ber destê me ne, her dem bi awayekî pir berfireh bîrûboçûnên îdeolojîk û dînî ne, yên ku rêberîya alîyên minaqeşê dikin. Behskirina nifûsa zêde, bandora xwe li bawerîyên bingehîn dike; ên ku pêwendîya wan bi jîyanê û nirxê wê ve heye. Ji ber vê ye, ku mijar bi awayekî gur û geş tê gotûbêj kirin.

Bi dirêjîya hezar salan, em bi taybetî jî ji jimareke pir hindik a zayînê ketin şikê. Tevî vê jî, di hin deman de, li herêm û welatên weke yên ***Ewropa***ya di dawîya sedsala XIII û destpêka ya XIVê de, ku bi zêdeyîyeke nifûsê ya girîng re rûbirû bûn –helbet nisbî ye–, heta kir ku mirovên dînî jî helwesta xwe bihêztir bikin. Her wiha, weke qanûnîbûna tedbîrên ji bo ducanîbûnê fikrên exlaqî yên li ser îfetê yan jî li ser *"raserîtiya bakîrebûnê"* jî weke qanûnîbûna tedbîrên pêşiyê li ducanbûnê digirin, ketin nav nîqaşan. Di encamê de, qedexeyên ***Incîlê*** yên li ser lixwexweşanînê ("sûcê ***Onan***"*, ku tuxmê xwe bi erdê de dirijand) demeke dirêj bûye mijara gotûbêjan.

Berîya niha bi çil hezar salan, bi nîv mîlyon nişteciyên li ser rûyê hemû dinyayê, metirsîya nifûsa zêde dikare pir dûr xwiya be. Û tevî vê jî, pêdivîya nêçîrvanan bi qadeke jîyanê hebû, ya ku pêdivîya wan a nêçîrê misoger bike: Bi kêmanî ji 10 heta 25 kîlometer kare ji bo kesekî, ku vê yekê jî bi awayekî cidî qada her grûbekê tengtir dikir. Wê demê, kêm zêde komên ji bîst û pênc heta pêncî kesan, debara xwe bi tenê bi nêçîrê û berhevkirina xwirekan dikir, ew neçarî alozîyên mezin ên peydakirina pêdivîyan dibûn. Helbet, nifûsa zêde xwedî têgeheke guherbar e ku têkilîya wê ji nêzîk ve bi çavkanîyên berdest heye. Tevî vê jî, pêşkêşkirina wê ya di rewacê de her ya mirovên weke masîyên sardînya di ciyekî teng de ye.

Jimar pir zû dibe weke fikreke sabit. Di sîteyên yûnanî yên wê demê de jî, diviyabû zevî bihatana dabeş kirin: Her beşekî xwe weke sîteyeke serbixwe bi rêk dixist, ewinde jî hucreyên girtî yên ebatên wan piçûkkirî; ku zexta mirovî lê bi awayekî pir bihêz dihate hîs kirin; û vê rewşê jî şiûra faktora demografîk bihêztir dikir. Bayê siyasî jî, pir ne li berjewendîya zarokanînê ye.

## "Dema ku hejmara welatiyan pir e, êdî nikare were kontrol kirin"

Di her du dîyalogên wî yên serekî, ***Komar û Qanûn*** de, **Eflatûn** li gor çavkanîyên heyî û jîngehê nifûsa zêde rave dike, awayên rêxistin û tevgera civakî –gelek caran heta bi serbiserê sînorên realîst- ku divê mirov xwe bigihîniyê. Heman lêhûrbûn li cem **Arîsto** jî, di ***Siyasetmedarê*** de heye: *"Mezinahîya sîteyekê, ne bi nifûsa wê ya zêde ye"*. (1) Li gor wî, di her hal û karî de *"jimareke pir mezin nikare pergalê qebûl bike: Gava gelek welatî hebin, ji kontrolê derdikevin, mirov hev nas nakin, ev jî rê li ber tawanê xweş dike. Wekî din, ji bo bîyanîyekî û awareyekî binpêkirina mafê sîteyê hêsan e, ji ber ku ew bi saya jimara xwe ya pir zêde nayên dîtin"*. (2) Herwiha, piranîya mirovan tê wateya piranîya feqîrîyê û ev jî xetera serîhildanê bi xwe re tîne. Metirsîya **Arîsto** ne ji ber ew çend çavkanî yan jî xwirekê ye, lê ji ber parastina sazûmanê ye. Fikra demografîk a yûnanî hîn ji hingê ve, termên gotûbêja ku em niha di dema modern û hevdem de ji nû ve dibînin, diyar kiribû. Ew fikir ***ojenîst, malthusî*** [li gor fikra aborîzanê ingilîz **Thomas Mathus**, ê ku pêşniyar dikir zêdebûna serjimarê were kontrol kirin]... ***ksenofob*** [tirsa ji tişta/kesa bîyanî] ye!

Bi berfirehbûna serdestîya romayî, pîvan tê guhertin, lê bi awayekî pêwîst, zihniyet nayê guhertin. Siyaseta hikûmetan bêtir alîgira zarokanînê ye. Weke ku **Tite-Live** jî şahidîya vê yekê dike, tiştê ku him nûjen e û him jî dibe sedema biserneketinê ew e, ku bi nisbet şaristanîyetên din zarokanîna romayîyan dê her kêm bûya: *"Galya ewinde dewlemend û ewinde nifûsa wê zêde bû ku îdarekirina nifûsa wê ya pir, zor xwiya bû. Qiral, êdî kal bûbû û dixwest qiralîyetê ji vê pirjimarîya ku ew dipelixand pak bike. Ji bo wê, du birazîyên xwe bi çolan xistin ku jê re erdên nû peyda bikin"*. (3) Propagandaya siyasî: Jimara wan pir zêde ye, ew êrişê dibin ser cîranên xwe romayîyan, û bi vê jî bersivdana bi rengê dagîrkirina **Galya**yê, rewa kirin.

Bi xaçparêzîyê re, di navbera sedsala **III**yê û **V**ê ya serdema me de, birêveber dev ji her cûre desttêwerdanê berdidin. Pirsa zarokanînê ji qada civatî û siyasî derbasî tomarkirinên dînî û exlaqî dibe. Gotûbêj li dora nirx û meziyetên bekaretê gur û geş dibin, ku weke rûmeteke bilind tê teşwîq kirin, yên zewaca ku mirov pê wê dîskalîfîye dike û sedaqetê derdixe pêş û yên ji nû ve zewaca ku mirov wê ceza dike. Di nav vê atmosfera cidî de, disa jî mirov dipirse: Gelo divê mirov nifûsa xwe zêde bike, yan kêm bike? Zarokan çêke yan parêzê bike? Ji bo xiristîyanan, bersiva vê pirsê tenê dikare di peyva pîroz de hebe. Lê nivîsên di Incîlê de jî bi hev re di nakokîyê de ne… Xebata ***Bavên Dêrê*** dê ew be ku bi zora canbazîyan û xîtabên çivanokî nîşan bidin ku peyva ***Xwedê*** yek e û nakokîyên heyî ne yên ***Wî*** ne, her çend ferman dabe **Adem** û **Hawa** ku nifûsa xwe zêde bikin jî, paşê di *Peymana Nû* de, bi **Saint Paul** daye gotin: *"Ji bo mêr baş e ku ew xwe ji jina xwe biparêze"*. Kar nehêsan e, lê ji bo mirovên ayînî, tiştekî ku nebe tuneye. ***Tewrat*** bixwe, bêtevlîhevî ye: *"Mezin û pir bibin, ber bigirin"* Û berdar...

Bi nisbet yên din, nifûsa zêde ya *Serdema Navîn* xwedî bandorên pir eşkere ye. Ji dawîya sedsala **XI**yê ve, rojavayîyan zanîbûne ji giranîya jimarê îstifade bikin. Tê digihên ku ji alî jimarê ve serdest in û jê sîlehekê çêdikin. Papayê wan **Urbainê IIyê**, di 1095ê de, cerdeyên siwarî dişîne ser ***Qudisê***. Hemî destana xaçparêzan ya li ser bingeha , ji rojava ber bi rojhilat ve pêleke berdewam, dê bêyî nifûsa zêde ya navenda xiristîyanan nikaribûna pêk bihataya.

Cîhana rojavayî, bi vî awayî dê xwe bigîhanda destpêka sedsala **XIX**yê. Mirovên dêrê, rewşenbîr, zanayên ayînî, filozof û nivîskar, bi çûnûhatina di navbera tirsa ji nifûsa pir zêde û trawmatîzma ji ber valahîya mezin, utopyayên alîgirên nifûsa zêde û îmana tam a bi hêza pîroz weke sazkerê hebûna mirovî li ser rûyê erdê, dê li ber hev bibedilin ku pirsa demografîyê teorîze bikin. *Vulgum pecus*, xelk bi dorê him weke webayê û him jî weke dewlemendîyekê tê dîtin. Tevî ku pir kêmasîyên navgîna statîstîkan hene jî, her kes daxwiyanîyên xwe bi pêş ve dibe û pêşniyazên xwe îfade dike. Nifûsa kêm û ya zêde: bi dirêjayîya sedsalan e, di navbera wan kesan de ku difikirin, ji bo berdewamîya jîyana mirovî, yek ji ya din birîsktir e, minaqeşe gur û geş dibe.

## Bi Malthus jimartina ferdan yan jî bi Marx levakirina dewlemendîyan?

Berhema **Thomas Malthus** (4), di navbera sedsala XVIII û XIXyê de, di dîroka teorîyên demografîk de qonaxeke girîng dest nîşan dike. **Aborînas** û keşeyê brîtanî piştrast dike ku nifûs ji hilberîna xwirekê gelekî bêtir zêde dibe, ev jî bêşik dê bibe sedema nifûsa zêde û xelayeke mezin. Yan em ê bihêlin ku ev tişt bibe, ku dê encamên wê bîêş û azar bin, xweza dê wan *"mirovên zêde"* ji nav bibe; yan mirov dê zarokanînê kontrol bikin, bi destpêkirina jinavrakirina hemî alîkarîya ji bo hejaran û mirov wan "berpirsiyar bike" -reftarê "berpirs" heta ku îmkanên wan ên xwedîkirin û perwerdekirinê tunebin, jinê neynin û zarokan jî çênekin. Li gor **Malthus**î, belavkirina bilez a hejarîyê ji bo mirovayetîyê xeterek e; wê gavê divê ji holê bê rakirin.

**Pierre-Joseph Proudhon** bersiva wî dide, dibêje ku pirsa nifûsa zêde tuneye. Heke hejarî belav dibe, ew ji ber nîzama neheq a milkiyetê ye ku desthilateke nerewa li ser yên din dide hinekan. **Karl Marksê**, ku êdî ew bixwe jî hinekî bi pirsa demografîyê eleqedar dibe, **Malthus**î weke dijminê çîna karker dihesibîne û wî tawanbar dike bi "*zimandirêjîya kurtêlxwera çînên birêvebir ku gunehkarê tawanê li dijî zanyarîyê û bêbextîya li dijî nijada mirovî ye*". (5) Ew, wî ji ber ku bawerîya xwe bi "prensîpê nifûsê" aniye tawanbar dike, qanûna xwezayî ya neguherbar, li herderê û herdem derbas dibe, ew wiha dike ku nifûs her gav ji çavkanîyan zûtir bi pêş bikeve: *"Ev qanûna nifûsa nenêrbar, heta ku midaxeleya dîrokî ya mirovî nebe, tenê ji bo nebat û heywanan derbas dibe. Ya girîng, ne jimara mirovan e, lê parvekirina dewlemendîyê ye"*. (6)

Ev minaqeşe li pey hev heta nîvê sedsala XXê, tarîxa ku mirovayetî dikeve riya mezinbûneke bêkontrol dom dikin: 3 mîlyar kes di 1950yê de; 6 mîlyar di 2000ê de. Ev êdî ne mezinbûn, teqînek e. Demograf, aborînas, erdnîgarînas û helbet siyasetmedar, li ser şirovekirina bûyerê qirik li xwe qetandin. Realîst bi kontrola pêwîst ya zarokanînê dijberîya berevanên jîyana bizêdeyî, ji kalîteya wê ya serbixwe dikin. Hin hene ku behsa newekhevîya pêşketinê dikin, heta bi têgeha nifûsa zêde jî inkar dikin: Hinên din dînîtîya kujer a hevalbendên zarokanînê rûreş dikin, ku bi sedan mîlyon mirovan mahkûmî ji nêza mirinê dikin. Ji 1980yê bi vir ve, êdî hisabê rîskên jîngeh û ekolojîk jî tê kirin.

Di destpêka sedsalê de, yên li dijî malthusîyan, bi xwe sipartina bûyerên derbasbûna demografîk ên wê demê (li ferhengokê binêre), dixwazin xwe piştrast bikin: Welatên pir hejar jî di nav de rêjeyên zarokanînê, li her derê kêm dibe. Ev bitenê dibe sedema teyidkirina "şoreşa demografîk" ku di 1934ê de, ji alî **Adolphe Landry** ve hatibû rojevê; wî nîşan da ku êdî, bi mezinbûna bêserûber a hilberîna mal, pirsgirêka nisbeta nifûs/çavkanîyê derbas bûye û nemaye. Ji niha û pê ve, nifûsa herî baş, divê têgeha çandî ya "bextewerî"yê, ya kalîteyê bike armanc.

Bi vî awayî, ber bi 2050yê ve nifûs dê li dor 9 mîlyaran û ber bi 2150yê ve jî li dor 10 milyaran stabîl bibe. Piştî ku dinya me, weke ku piranîya demografan piştrast dikin, dê karibê 10 mîlyar nişteciyan xwedî bike, îcar bi 7 mîlyaran çawa dibe ku nifûs "zêdeyî heddê" xwe be? Heke li dinyayê mîlyarek kesên ku weke pêwîst xwedî nabin û du qatê wê zêde hejarî heye, ev yek belbî jî, tevî her tiştî, bi tenê ji ber sedema dabeşkirineke xirab a çavkanîyan be. Lê belê gelo tiştekî li ber dil e ku em bigihijin vê hejmarê? Di encamê de, kombûna 10 mîlyar mirovan, heke ku baş bên xwedî kirin jî weke lodeke mirovan e...

## Nameya Salman Ruşdî

Di 1997ê de, **Salman Ruşdî (***Salman Rushdie***)** nameyekê *ji welatîyê şeş mîlyaremîn re* (7) ku divê di wê salê de ji diya xwe bûbe, dinivîse: *"Weke endamê herî nû yê cûrekî bitaybetî mereqdar, tu yê di nêzîk de van du pirsên bi 64 000 dolaran bikî* [nota redaksîyonê: Li Amerîkayê, kêm zêde serê mirovî Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN)] *yên ku 5 999 999 999ên din ev demek e ji xwe nakin: Em çawa gîhaştin vê derametê? Û niha piştî ku em gîhaştinê, em ê çawa lê bijîn? Bê guman ew ê ji te re pêşniyaz bikin ku bersiva pirsê binyatan ferz dike ku tu bawer bikî ji Hebûneke nedîtbar, nayê tarîf kirin, "li esmanan", gîyandarek dikare her tiştî bike û em rihberên belengaz nikarin bibînin û tiştekî jî di wî nagihên ... Ji ber vê bîr û bawerîyê, li gelek welatan mumkin nebû ku rê li ber pirbûna bixeter a jimara mirovan bê girtin. Nifûsa zêde ya dinyaya me, bikêmanî bi awayekî qismî ji ber dînîtîya rêberên ayînî yên mirovayetîyê ye. Bi dirêjîya jîyana xwe, bêşik tu yê hatina welatîyê neh mîlyarem ê dinyayê bibînî. Û ger gelek mirov ji dayik bibin biqismî ji ber rikeberîya dînî ya li hember kontrola zarokanînê ye, gelek mirov jî ji ber hebûna dînan dimirin… "*

Piştî 13 salan, di 2011ê de, yan, herî dereng, di destpêka 2012ê de, em li hêvîya hatina welatîyê heft mîlyarem ê dinyayê ne. Îhtîmala ku ev pitika dawîn li welatekî hejar, di malbateke belengaz de bê dinyayê, ji dehan heft e. Gelo, divê em jê re pîroznameyeke bixêrhatinê yan nameyeke lêbûrînê bişînin?

* Demograf. Ev tekst ji pirtûka wî ya dawîn *Le poids du nombre / Giranîya jimarê* hatiye girtin, Weşanên Perrin, Paris, 2011

1 Aristo, *Les politiques / Siyasetmedar*, VII, 4, 1326a
2 *Berhema navbihurî*
3 Tite-Live, *Dîroka Romayê*
4 Thomas Malthus, *Essai sur le principe de population / Li ser prensîpa nifûsê ceribandin*, 1803
5 Karl Marx, *Kapîtal*
6 *Heman berhem*
7 Salman Rushdie, "Imagine there's no Heaven /Bifikire ku bihişt tunebe", jêgirtina di Christopher Hitchens, *The portable atheist/Kompîtura mobîl a xwedênenas*, Da Capo Press, Philadelphia, 2007

Wergera ji fransî: Yakûb Karademir

Parvebûna nifûsa cîhanê



## FERHENGOKA DOSYAYA DEMOGRAFÎYÊ

**Temenê (jîyê) navsere**
**(*Age médian*)**
Temenê ku ferdên welatekî (yan jî herêmekê) li du komên hejmara endamên wan weke hev dabeş dike. Li Fransayê temenê navsere di sala 2010ê de 40.1 e; nîvê nufûsê ji 40.1 salî ciwantir e; nîvê din jî ji 40.1 salî mezintir e.

**Çînên hevtemen**
***(Classes creuses)***
Nifşên ku hejmara endamên wan kêmtir e ji ya çînên temenê berîya wan û ya piştî wan jî. Sedema vê yekê mumkin e şer be, yan jî /û herweha kêmbûneke zarokanînê be.

**Gurayî**
***(Densité)***
Gurayî bi hejmara şênîyên serê kîlometre kareyekê (şênî/km2) tê îfade kirin. Gurayîya (nîsbet) herî zêde bi 16 235 şênî/km2 li Monakoyê ye, ya herî kêm jî bi 1.8 şênî/km2 li Mongolistanê ye; li Fransayê 114 şênî/km2 ye û li Dewletên Yekbûyî 31.

**Kêmbûna şênîyan**
***(Dépeuplement)***
Kêmbûna hejmara şênîyên li ser erdekî.

**Lihevderneketina nufûsê**
***(Dépopulation)***
Li gor mirinê, kêmbûna zarokanînê ye. Ji ber ku hejmara zarokanînê ji ya mirinê kêmtir e, behsa rêjeya mezinbûna xwezayî ya neyênî jî tê kirin. Heke mîqdara koçberîyê wê bi ser ve temam bike jî, lihevderneketina nufûsê nabe sedema kêmbûna şênîyan.

**Hêvîya temenê navincî**
***(Espérance de vie à la naissance)***
Hejmara salên ku komeke mirovan dikarin hêvî bikin ku wê bijîn. Bi vî rengî li Fransayê hêvîya temenê navincî sala 1900ê 45 bû, sedsalekê paşê 79 û sala 2010ê 81.6.

**Hêvîya temenê navincî yê siheta baş**
***(Espérance de vie en bonne santé)***
Hejmara salên ku komeke mirovan dikarin hêvî bikin ku wê navsere bêyî ku astengîyeke wan a mezin a tenduristîyê hebe, bijîn. Li Fransayê hêvîya temenê navincî yê "siheta baş" weke 63.3 tê texmîn kirin (ji bo jinan 64.3 û ji bo mêran 62)

**Mezinbûna para pîr û kalan**
***(Gérontocroissance)***
Di nav şênîyeke diyar de zêdebûna hejmara mirovên pîr û kal.

**Zivistana demografîk**
***(Hiver démographique)***
Rewşa welatekî ku lê rêjeya zarokanînê di dawîya derbasbûna demografîk (*li maneya vê peyvê binihêre*) de jî her kêm dibe, tevî ku rêjeya mirinan bi îstîqrar dibe –ev yek îşaret bi pîr û kalbûna serjimaran bi rîtmekî kêm û zêde bi lez dike.

**Nîşandera sentetîk a zarokanînê**
***(Indice synthétique de fécondité)***
Nîşandera statîstîk (bi hejmara zarokan a serê jinekê tê derbirîn) e ku bi mîqdara rêjeya zarokanînê li gor temen tê hesab kirin. Ji bo Fransaya ewropî sala 2008ê ev nîşander serê jinê 1.98 zarok bû yan jî em bi awayekî zelaltir îfade bikin, serê 10 000 jinan 19 882 zarok dikevin. Ev hejmar bi komkirina serhev a rêjeya zarokanînê ya jinên 15 salî (di vî temenî de 5 zarokanîn serê 10 000 jinê), ya jinên 16 salî (19 zarokanîn serê 10 000 jinan), ya yên 17 salî .... heta bi rêjeya zarokanînê ya jinên 49 salî (1 serê 10 000 jinan) tê hesab kirin.

**Koçberîya muteşebbisî**
***(Migration entrepreneuriale)***
Koçberî ye ku sedema wê biryarên muteşebbisî ne ku dikin hevkarên wan koçber bibin, yan jî mirovên karkir-çalak in yên ku dixwazin sûdê ji wan erdan bigirin ku bêhtir wan di warê pîşeyî de razî dikin.

**Koçberîya aborî**
***(Migration économique)***
Cihguhertina navneteweyî ya wan mirovan e ku hez dikin li derveyî qada xwe ya neteweyî kar bikin, pirî caran newekhevîyeke şert û mercan yan jî hêvîya awayê jîyanê ya di navbera welatê jê tên û welatê berê xwe didinê de dibe sedema vê koçberîyê. Ew para bêhtir çareserîya dawî ya wan mirovan e ku ji perîşanîyê direvin, lê herweha her diçe bêhtir ya wan kesan e jî ku ketine dûv hêvî û asoyên nû yên pîşeyî.

**Koçberîya malbatî**
***(Migration familiale)***
Bi çûna cem kesekî yan jî gelek kesên berê koçber bûyî, cihguhertina malbatan yan jî hin endamên wan. Jê re herweha anîna cem hev a malbatî jî tê gotin.

**Pîramîda temenan**
***(Pyramide des âges)***
Temsîla li gor temen û cins dabeşbûna serjimarekê ye. Bi giştî du şemayên ku li pey hev in ku jin û mêran ji hev dikin. Ji jor ber bi jêr ve qismên temen hene û berwarî jî hejmara endamên serjimarê di her qismê temen de hene. Dema ku hejmara zarokan ji ya mirovên bi emr kêmtir e behsa pîramîda temenan a serberjêr tê kirin (lewre jêra pîramîdê ziravtir dibe û jora wê stûrtir).

**Rêjeya hewcedarîya giştî**
***(Rapport de dépendance totale)***
Hejmara ciwan (zarok û ciwanên nû digihîjin) û mirovên pîr û kal e, li gor serjimara mirovên gihiştî yên di temenê karkirinê de. Yên pêşî behsa wan hat kirin hewceyî yên paşê behsa wan bûyî ne, ji bo misogerkirina sihet û başîya xwe û hwd...

**Rêjeya mêrtîyê ya navincî**
***(Rapport de masculinité moyen)***
(bi ingilîzî: sex ratio)
Hejmara endamên mêr yên nufûsekê li gor sed mirovên ji zayenda mê.

**Rêjeya mêrtîyê di jidayikbûnê de**
***(Rapport de masculinité à la naissance)***
Hejmara kurên nû jidayikbûyî li gor keçên nû jidayikbûyî di nav serjimareke diyar de. Bi giştî ev pêwendî serê 100 keçan 105 kur in. Li gelek welatên asyewî (Çîn, Hindistan ... ) tercîha ji bo kuran tewazûna vê pêwendîyê xira kir.

**Rejîma demografîk**
***(Régime démographique)***
Tevahîya xisletên zarokanînê û mirinê yên welatekî û awayê ku ev her du li welatekî xwe bi rêkûpêk dikin. Weke mînak dema ku hem rêjeya zarokanînê û hem jî ya mirinê bilind bin, behsa "rejîma sereke" tê kirin.

**Sînorê şûngirtina besît a nifşan**
***(Seuil de simple remplacement des générations)***
Nîşandera zarokanîna pêwîst e, ji bo ku şûna jinên nifşekî bi hejmareke wekhev di nifşê bê de were girtin, ango sîhsalek paşê. Li welatên ku rêjeya mirina zarokên nû jidayikbûyî, ya zarok û ciwanan û ya dayikan pir kêm e, ev sînor serê jinê 2.1 zarok in yan jî weke li Fransayê piçekî ji vê hindiktir e. Dema ku rêjeya van mirinan bilind e, hingê ev sînor jî bilind e; weke mînak li Komara Domînîk ev sînor 2.2 zarok in, li Yemenê 2.4, li Gîneyê 2.7 û li Zîmbabweyê 3.1.

**Rêjeya mezinbûna xwezayî**
***(Taux d'accroissement naturel)***
Cudatîya di navbera hejmara zarokanînan û ya mirinan de li gor serjimara sala ku li ber çavan tê girtin.

**Rêjeya mirinê**
***(Taux de mortalité)***
Hejmara mirinan di peryodekê (bi giştî sal) de li gor serjimara heman peryodê.

**Rêjeya mirina zarokên nûjidayikbûyî**
***(Taux de mortalité infantile)***
Hejmara zarokên berîya ku sala xwe temam bikin dimirin, li gor hezar zarokên sax yên heman peryodê.

**Rêjeya mirina zarokên temenbiçûk**
***(Taux de mortalité juvénile)***
Hejmara zarokên ku berîya 5 salîya xwe temam bikin dimirin, li gor hezar zarokên sax yên heman peryodê.

**Rêjeya mirina zarok û ciwanan**
***(Taux de mortalité infanto-adolescente)***
Hejmara mirîyên nifşê temenê wî di navbera saleke temamkirî û temenê gihiştîbûnê de, ango zarok û ciwan (bi giştî berîya 20 salî), li gor hejmara jidayikbûnên heman nifşê.

**Rêjeya mirina dayikan**
***(Taux de mortalité maternelle)***
Hejmara jinên ku ji ber zarokanînê yan jî di encama wê de dimirin, li gor 100 000 zarokanînên sax yên di nava saleke diyar de.

**Rêjeya zarokanînê**
***(Taux de natalité)***
Hejmara zarokanînên sax di nava peryodekê (bi giştî sal) de li gor serjimara navincî ya heman peryodê.

**Derbasbûna demografîk**
***(Transition démographique)***
Perîyoda ku tê de nufûsek ji rejîmeke rêjeya mirinan û rêjeya zarokanînê bilind, derbasî rejîmeke rêjeya mirinan kêm û ya zarokanînê lawaz dibe. Ev peryod dikare dema wê û gurayîya wê guhertîbe. Weke mînak derbasbûnê li Swêdê sala 1815ê dest pê kir û sala 1965ê bi dawî hat, di nav vê peryodê de nufûsa Swêdê 3.5 caran ji berê zêde bû. Li Meksîkayê derbasbûnê 90 salan dewam kir, ji 1920ê heta 2010ê, di vê peryodê de nufûsa welêt bêhtirî 8 caran ji berê zêde bû.

**Pîrbûna nufûsekê**
***(Vieillissement d'une population)***
Zêdebûna nisbeta hejmara pîr û kalan di nav nufûseke giştî de.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser kaxezê, 8 x 10 x 15 cm

www.arsivakurd.org

# Dema ciwanên ereb

YOUSSEF COURBAGE *

Berevajî hin tezan, giranîya ciwanan xwe weke agirekî zû vede yê îslamîzmê neda der.

Di van bîst salên dawîyê, wekhevîya demografîk a welatên li peravên başûr û bakur ên Derya Spî bi lezeke ji xwe kêmnekirî dewam kir. Îndeksa rêjeya zarokanînê -ku daketineke girîng nîşan dida ji bo welatên musulman (1) dide xuya kirin ku ***Lubnan, Tûnis, Fas, Tirkiye*** an jî ***Îran*** êdî kêm maye bigihîjin rêjeyên welatên ewropayî.

Ev guherîna demografîk helgirên veguherînên siyasî yên qet'î ne. Li ***Fas***ê, îndeksa zarokanînê ji sala 1975ê ve her dadikeve, heta ku di vekolîna 2009-2010ê de rêjeya zarokanînê serê jinê 2.19 derket. Li bajaran, rêje daketiye jêr sînorê nûkirina nifşan *[yanî ew rêjeya zarokanînê ya pêwîst da ku li dû her nifşekî, nifşekî din ê bi heman hejmarê an jî zêdetir hebe, ku ew rêje serê jinê 2.05 e]*. Herwiha ev deh sal in ***Tûnis*** jî di heman rewşê de ye.

Li rûyê demografîyê ve, raperînên li welatên ereb wek bivênevê têne pêş çavan. Pêvajoya ku ji nîvê duyem ê sedsala XVIIIê Ewropa tê de ye, va ye li seranserê dinyayê belav bû; jixwe nedibû ku Derya Spî nekeve ber vê pêvajoyê, ji ber ku ev çar deh sal in di heman veguherînên demografîk, kulturî û antropolojîk re derbas dibe. Cîhana ereb jî îstîsna nîne di vê meydanê de: Boçûneke binyadgerî jî bêguman dê bûba xetayeke mezin, lewre dê bi rêya teheyyûlkirin an jî îcadkirina *homo arabicus* an jî *homo islamicus*ekî, ku ji esl û cinsê xwe ve dij bi pêşketinê ye.

Mesîhîyên Lubnanî ne tê de –ku xêr û bêra projeyên mîsyoneran dîtin û ji sedsala XIXê ve îstifade ji zankoyên xwe kirin–, beşek ji cîhana ereb, piştî salên 1960ê kete qonaxa veguherînên navxweyî, ev yek bêtir bi xêra bilindbûna asta perwerdeyê û daketina rêjeya zarokanînê çêbû. Li *Tûnis*a **Hebîb Bourguiba**, vîna modernîzasyonê, di belavkirina derfeta perwerdeyê ya ji bo keç û kuran re derbas dibe.

Li *Fas*ê jî, hukûmetên ewil ên piştî serxwebûnê jî babeta perwerdeyê ji xwe re kiribûn mijûlîyeteke pêşîne, lê belê gelek pê ve neçû, ew hewlên berbelavkirina perwerdeyê bi fikara hilweşîna hîyerarşîyên siyasî hatine rawestandin –ji ber vê hindê ye derengmana Fasê di warê xwendewarîyê de, bi taybetî li ba keçan û li deverên gundewar.

Digel giştîkirina perwerdeyê, hewlên kontrolkirina rêjeya zarokanînê bi rê ketin û herwiha bikaranîna derfetên kontrasepsîyonê *[kontrasepsîyon: Rêbazên ku li dijî ducanîmanê têne bi kar anîn]* berbelav bûn. Daketina adanîya zarokanînê li hindek welatên erebî ewqas bihêz bû ku nirxên edetî yên babsalar di bingeha xwe de hejîyan û derbeke mezin xwarin. Munaqeşekirin û lêpirsîna li ser têgeha ***pater familias*** [bi latînî: Bavê malbatê, anku malxwê malê], di heman demê de li ser hemû "bavên gelan" bû, –her wekî li Tûnis û li Misirê aşkera bû. Herwiha divê çavek jî li endogamîyê be, anku bertengî û hişkîya cemaeta malbatî/binemalî ku dibe sebebê di nav xwe de mana endaman û qet'îyeta sazîyên binemalî. Civaka ku bergehê xwe dide derve û bi cîhana derve re têkilîyan berqirar dike, bêguman munasibtir e ji bo serhildana li dijî rêveberîyeke zordar. Lewma, giştîbûna xwendinê û daketina rêjeya zarokanînê dikarin, bi awayekî nerastewxo, bibin sedema bîrewerbûnê û raperînan bidin dest pê kirin.

## Raperîna li dijî bav, redkirina dîktator

Tesîra van hilweşînan di çarçoveya malbatî de di du beran de xwe nîşan dide. Kêmîya zarokan dihêle ku dêûbav zêdetir guhdarên tenduristîya zarokên xwe bin, wan baştir xwedan bikin, xwendineke bi asteke bilindtir û bo demeke dirêjtir ji wan re dabîn bikin. Herwiha, li malbatên biçûk –modêla ku malbata ereb niha ber bi wê ve diçe–, têkilîyên dayik-bav û dêbav-zarok jî "demokratîktir" dibin, ku bêguman rengvedana vê yekê li ser qada civakî û siyasî dê bes pozîtîf be. Kêşe hingê dertên gava ku zarokekî perwerdebûyî û bavekî nexwende yê hilgirê desthelata mutleq (mîrata cemaetên babsalar) di malekê de dijîn. Hingê pêkvejîyan "zehmet " dibe. Ev kêşeyên malbatî di risteke gelek berfirehtir de têne dîtin û ev yeke dikare –qet nebe qismî– têgihiştina derhatina diyardeyên îslamger hêsan bike.

Perwerdekirina berbelav a kuran, paşê ya keçan, şiûr hişyar kirin, hetta belkî bû hêvênê "çavvekirina" dinyayê. Xulase sekûlerbûna civakê bileztir kir. Ciwanên derçûyên zankoyê li pêş hemûyan ketine nav raperînan. Lê belê, ji **Fas**ê heta **Urdin**ê, xwepêşander ji her du zayendan in û ji hemû nifş û temenan in: Ev raperîn, ku di cewherê xwe de de sekûler in, îmtiyaz û pavanê ciwanan nîne.

**Samuel Huntington**, di teorîya xwe ya *"şoka medenîyetan"* de, wisa pêş didît ku di nav nufûsê de zêdebûna rêjeya ciwanan dê bibe hoyekî bêîstiqrarkirina cîhanê û herwiha berbelavbûna îslamgerîyê: Vê yekê dê kêşeyên civakî, şer û terorîzm zêdetir bikirana. (2) Hindek siyasetnasên ku di vê gomê de digêzirin, di navbera neslê ciwan û meyla tûndûtîjîyê de, ketine dû peydakirin û çespandina têkilîyeke sebeb-encamê. Qusûra yekem a vî mentiqî ew e ku daneyeke demî wek rastîyeke gerdûnî dibîne û wê dispêre hoyên dînî û hoyên medenîyetê. Ev ***"pêla ciwanan",*** ku ji heyama adanîya bihêz a zarokanînê ya salên berî 1980yê xuliqiye û daketineke qet'î ya rêjeya mirinê, ji *Fas*ê heta *Endonezya*yê parçeyeke bingehî ya mentalîteya hevbeş a hemû gelên ereb an jî musulman e.

Digel vê hindê, daneyên demografîk îşaretê bi cihêrengîyeke xurt a rewş û çarçoveyan dikin. Bi taybetî, nîşan didin ku nexasim *"pêla ciwan"* demkurt e. Heke em bidine dû paradîgmaya **Huntington**, piştî tundûtîjîya siyasî ya ciwanan divê di wextekî kurt de "mehiyan/heliyan"a vî nifşî bê û di encamê de civak binermije. Diyar e li ***Fas***ê, li ***Cezayîr*** û hetta li ***Erebistana Suûdîyê***, ev pêl ji salên 2000ê ve derbas bûye. Li ***Lubnan***a serkêş, rêjeya cemawerê ciwan ê nufûsa wê, di nîveka şerê navxweyî de, anku sala 1985ê, di asta xwe ya herî bilind de bû. Li ***Tirkiye***yê ew sal 1995 bû û li *Misir* û *Sûriye*yê 2005 bû. Ji bilî *Yemen* (ku li wê derê pêvajo hêj nû dest pê dike) û li *Filistîn*ê (ku li wê derê bizor sala 2020ê pêk tê), serdestîya demografîk a ciwanan dê di nav sê dehsalan de bi yekcarî bi dawî be û bi vî rengî, bigihe asta welatên ewropayî.

* Birêveberê lêkolînê li Înstîtuya Neteweyî ya Lêkolînên Demografîk, Parîs. Tevî Emmanuel Todd, nivîsakarê ceribandina bi navê Le Rendez-vous des civiliatsions (Hevdîtina şaristaniyan), Seuil, Parîs, 2007.

1 Her wekî bi qelemê rojnamevan Oriana Fallaci, *La rage et l'orgueil* [Hers û Xurûr], Paris, Plon, 2002

2 Samuel P. Huntington, *Le Choc des civilisations* [Şoka Şaristanîyan], Odile Jacob, Paris, 2000 [1996]

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

**Cezayir.** Serê jinê bi 8 zarokan, zarokanîna li Cezayîrê di dema serxwebûnê de, fenomeneke herî bihêz a cîhana ereb bû. Heke em wê bidin ber cîrana wê, li Cezayirê derbasbûna demografîk pir dereng dest pê kir –ev taybetmendîyeke ku pir ne deyndara siyaseta hikûmetê ya alîgira zarokanînê ye, ku bi tesîra aborîyeke rantê çi bigire bitemamî derfeta debirandina nifûsê "ji dergûşê heta bi gorê" dide. Di du dehsalên dawîn de, rêjeya zarokanînê helîya û daket rêjeya Tûnis û Fasê. Lê, ji 2000ê bi vir de, ew di nav tevgereke guherîna berevajî ya welatên cîran de ye û ji nû ve dest pê kiriye, bi pêş dikeve. Derbaskirina krîzê û kêmbûna şideta siyasî alîkarîya bilindbûna jimara zewacan dike (Li hemberî 280 000an di 2005ê de, 341 000 zewac di 2009ê de hatin pîroz kirin).

**Lîbya.** Bi nifûsa xwe ya kêm û rantxwer, Libyayê derbasbûneke demografîk weke ya welatên berhênerên petrolê li Kendavê jîya. Demeke dirêj, siyaseta wê ya fermî ya alîgira zarokanînê, bi parvekirineke merdane a dahata wê ya petrolê re ser bi ser çû. Lê di pey kontirşoka petrolê re, paşê jî ambargoya navneteweyî, rêjeya zarokanînê kêm bû û li gor Neteweyên Yekbûyî, di 2010ê de, serê jinê bû 2.4 zarok.

**Misir.** Îstiqrara wê ya demografîk bi bêîstiqrarîya wê ya siyasî ya îro re li hev nake. Tevî himbizbûneke pir a ji ber sedema ku bitenê ji % 4 heta 5ê erda wê bi kêrî rûniştinê tê, nifûsa wê bi tempoyeke salê ji % 2yê her bi berdewamî zêde dibe. Weke li her derê û cîyên din jî wiha ye, zarokanîna wê ya bihêz kêm nabe. Ew her li dora serê jinê 3.25 zarok dimîne, ku ji rêjeya Fas û Tûnisê % 50 bêtir e…

**Urdin.** Tevî pêşketineke pir mezin a di warê perwerde, xwendin û nivîsandine de jî, welêt dîsa jî nîsbeteke bilind a zarokanînê (serê jine ji 3.5 zarokan bêtir) parastîye û ev deh sal in ku wê ev ast stabilîze kiriye. Ev yek ji ber silsileya bavîtîyeke herheyî û pêdivîya misogerkirina zarokekî kur tê –berevajîya welatên Mexribê, li wê gelek cot ji vê mecbûrîyetê miaf in. Dijberîyên mezhebî, herêmî yan jî li ser esil (Filistînî yan Transurdinîyê), alîkarîya berdewamîya zarokanîneke bihêz dikin.

**Libnan.** Bi kêmanî serê jinê bi 1.69 zarokan, Libnan li herêmê dîmeneke îstisnayî nîşan dide. Ji dawîlêhatina şerê sîvîl û bi vir ve (1976-1990), rikeberîyên demografîk ên di navbera salên 1960 û 1970yê de hatine çavdêrî kirin, niha wenda bûne. Tevî ku mistewa wan ne wekhev e jî, heman helwêst êdî di nav komên cihê yên mezhebî de, ji maronîyan heta bi şîîyan, ji ortodoksên dêra rûm an katolîk bigre heta bi sunî û durzîyan tê çavdêrî kirin.

**Tirkiye**. Welat êdî ketiye rêza binya asta xwe nûkirina nifşan (serê jinê bi 2.09 zarok). Bi gotineke din, tevî hebûna desthilatdarîya hikûmeteke îslamîst û berevana zarokanînê –weke ya **Necmettin Erbakan** (1996-1997) –, malbat bi awayekî azad biryara jimara zarokên xwe didin û ew bixwe jê re limîtekê diyar dikin. Dîmeneke din a vê bûyera ku mirov şaş û mat dihêle, Îran e, ku tevî rejima wê ya îslamîst, zarokanîn lê hîn berjêrtir dadikeve (serê jinê 1.83 zarok).

**Israîl-Filistîn.** Surprîza mezin: Zarokanîna nifûsa cihû ya Îsraîlê berdewam, sal bi sal zêdetir dibe (serê jinê 3 zarok), tevî ku ya filistînîyên axa dagîrkirî, Şerîaya Rojava (Rojhilata Qudsê jî di nav de) û heta li Xezayê, ku di dema Întifadaya yekem de dighêje rekoreke navneteweyî, kêm dibe. Di rewşa îro de, em dibînin ku jimara zarokan serê jinê ji 3.6ê zêdetir e (li gor Buroya Serjimarê ya Amerîkî, ev jimar li Şerîaya Rojava 3.1 û li Xezayê jî 4.71 e). Li cem erebên îsraîlî, zarokanîn ji 3.4 zarokan dike dakeve mistewayê yahûdîyên îsraîlî.

Wergera ji fransî: Yakûb Karademir



AYŞE KAZCI: **Bênav**, çapa darî û kolografîya li ser kaxezê 3 x 21 x 29.5 cm

www.arsivakurdi.org



Tîrmeh 1985

# Li kevîya şer, Kurd asta daxwazên xwe bilind dikin!

ELIZABETH PICARD *

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Elisabeth Picard, di vê nivîsa xwe ya li ser têkoşîna hêzên kurd yên bi taybetî li Iraqê li dijî rejîma Sedam Huseyin şer dikin û dixwazin wê biguherînin dike û belawelabûna rêxistinên kurd tîne ziman. Ji alîyekî YNK ku di nav têkilîyên hevpeymanan de ye û dixwaze bi rejîma Iraqê re li hev bê, li alîyê din PDK-Iraq ku şerekî dijwar li dijî rejîma Sedam Husên dide lê di nav lêgerîna alîkarîya Îranê de ye ku di heman demê de PDK-Iran bi hêzên Îranê re di nav şer de ye. Hêzên kurd li Iraqê xurt dibin û asta daxwazên xwe bilind dikin, YNK jî, xwe ji hevdîtinan bi paş ve dikişîne, lê dorpêçbarîya kurdan bi vê yekê naqede, faktora Enqereyê dikeve dewrê û her sê welat hewl didin ku hêzên kurdan parçe bikin daku têkoşîna wan bê encam bimîne. Kurd bi têkoşîneke berhemdar li hember vê yekê radiwestin û dev ji berxwedanê bernadin.

LMdkurdî

Piştî îmzekirina peymana Cezaîrê ya navbera Iraq û Îranê ya di 6ê adara 1975ê, çend hefteyan têrê kiribû ku artêşa baasî a serok **Sedam Husên** dawî li tevgera neteweyî ya kurd a general **Mustafa Barzanî** bîne, ya ku êdî ji desteka *Tehranê* jî bêpar mabû. Barzanîyê ku berî salekê qanûna derbarê muxtarîyetê de li *Bexda*yê red kiribû, niha bû penaber. Zêdetirî sed û pêncî hezar kurd (ji du mîlyon û pênc sed hezar kurdan, ku ji sedî 25ê nifûsa Iraqê ye) li Îranê bûne penaber. Hinên din, ku hejmara van jî herî hindik bi qasî yên navbihurî bû, li herêmên lîtav û avzêl hatin bi cih kirin û di heman demê de hewldana hikûmetê ya erebkirina bi darê zorê ya *Sincar, Xaneqîn* û *Kerkûk*ê jî dewam dikir.

### Celal Talebanî di dawîya 1975ê de li Şamê bi cih dibe û YNKê ava dike

Ya hê xirabtir, tevgera berxwedanê di nav xwe de parçe dibû. Beşek ji wan dibin hevkarên baasîyan û dikevin nav sazîyên xwecîhî yên nû, ew dilsozên **Mele Mustafa Barzanî** ne ku difikirin dev ji têkoşînê berdin û beşekî din jî ji muxelîfên di nav *Partîya Demokrat a Kurdistanê* de pêk tê û destekê didin van muxalîfên ku biryara ji nû ve despêkirina şer dane: **Celal Talebanî** di dawîya 1975ê de biryarê dide li *Şam*ê bi cih bibe û li vir desteka serok **Hafiz El Esad** distîne û *Yekîtîya Niştimanî Kurdistan* (YNK)ê ava dike.

### Di sala 1978ê de Fakulteya Kurdî ya Bexdayê tê girtin

Tevger hêdî hêdî xwe bi awayekî nepenî bi rêk dixe: "pêşmergeyên" ji bazara Lubnanê çekên sivik ji xwe re tedarîk kirine, ji ber qanûna otonomîyê ya ku pêkanîna wê eger ne xeyalî be jî zêde zehmet e, berê xwe didin çîyayên ku her meh dibe warê xwelêgirtina zêdetir kesên xeyalşikestî: Sala 1978ê, *Fakulteya Kurdî ya Bexdayê* tê girtin; hikûmeta herêmî ya *Hewlêr*ê ne xwedî erka kontrolkirina çavkanîyên xwe ye; "hilbijartîyên" herêmê li jêr kontrola dijwar a rejîma baasî ne. Li gel vê yekê, heta du salên destpêkê yên şerê *Kendavê* (cotmeh 1980- havîn 1982), derfetên diravî yên ku rejîma **Sedam Husên** jê sûd werdigire, rê didinê ku rexneyan nerm bike û hetta, ji nav hin kurdan, ji bo siyaseta xwe ya dagirkerîyê "mişterîyên" alîgir bibîne. Rejîma Sedam di ser de jî, hejmareke mezin a mîlîsên bi çekûrextên modern techîzkirî, dixe bin xizmeta xwe. Ev artêşa ku ji xelkê herêmê hatiye saz kirin, li her gundê *Bakurê Iraqê* xwe dispêre hevkarên bi meaş yên bi navên ***Cahş*** ku weke eşîrekê birêkxistî ne. Û nexasim, reqabeta navbera **PDK**ya ku li hêla bakur li ser sînorê Tirkiyeyê bi cih bûye û **YNK**ê ku bêhtir li rojhilatê *Silêmanîyê*, li ser sînorê Îranê tevdigere, gelek caran vediguhere şer û pevçûnên bi çekan.

*Partîya Komunîst* (PCI) a ku têkilîyên wê di 1978ê de bi rejîma Baasê re qut dibin, nafîle hewl dide li gel birayên dijmin ên li du enîyên dijber ên Şamê bicih bûne, lihevhatinekê pêk bîne: *Enîya Welatperwer*, li derdora YNKê (12 mijdar 1980) û Enîya *Neteweyî ya Demokratîk* (28 mijdar 1980). Lîbya jî hewl dide nozdeh partî û rêxistinên li herêmên bakurê Iraqê têdikoşiyan, li gor qanûneke *Trablus*ê ya di 6ê sibata 1983yê de mohrkirî, di çarçoveya du têgehên girîng de li hev kom bike: Hilweşandina rejîma zordar a **Sedam Husên** û bidestxistina xweserîyeke têkûz. Şer û pevçûn dîsa bi dijwarî dewam dikin, mesela yekê gulanê hêzên **Talebanî** li gelîyê ***Pištaşan*** êrişên dijwar dibin ser navendên *Partîya Komunîst a Iraqê* û *Partîya Sosyalîst a Kurd* û di encamê de gelek kesan dikujin û birîndar dikin.

Lê belê, ji 1983yê ve, xitimîna dijberan di şerê Kendavê de dibe sedemê dilbijîna ji bo guherîneke kalîtatîf û pênaseke nû ya têkoşîna kurdên Iraqê. Berdêla "Şerê Seddam" bere bere girantir dibe; ew rejîmê neçar dihêle ku dev ji gelek projeyên civakî berde û zexteke dijwartir li gel bike, bi taybetî jî li herêma xweser. Ji ber vê yekê her diçe dijberên rejîmê zêdetir dibin.

### Armanc diguherin

Gelek ciwanên kurd - li gor **Latîf Casim**, wezîrê ragihandinê, di tîrmeha 1984ê de di nav artêşa îraqî de pêncî hezar in, -êdî ji eskerîyê direvin, pir caran tevî çekên xwe, xwe digihînin sînorê Îranê, li vir dikevin nav refên pêşmergeyên ***Juwd*** (*Enîya Neteweyî ya Demokratîk*). ***Juwd*** a ku ji alîyê du kurên **Mustafa Barzanî** -di sibata 1979ê de li Dewletên Yekbûyî wefat kir- ve tê bi rê ve birin, destekê ji *Tehran*ê distîne. Hêjayî gotinê ye ku hêzên artêşa Îranê di tîrmeh û cotmeha 1983yê de du caran êriş birin ser xaka Iraqê. **Mesûd Barzanî** li gelîyê *Şûman* ku li vê derê fermandarîya sê hezar şervanan dike, *RPG* û çend çekên wî yên *DCA* hene. Zilamên wî bi şev dikevin bajaran û êrişan dibin ser artêşa gel, avahîyên hikûmetê û avahîyên servîsên saloxdarîyê. Di adara vê salê de, ew li gel yekîneyên ***Partîya Komunîst a Iraqê*** tên heta Hewlêrê û gelek kesan weke rehîne bi xwe re dibin.

Tundbûna têkoşînê revîzyona armancên şervanên kurd jî bi xwe re tîne. Pêşmergeyên ku ji 1978ê ve bi *PCI*yê re hevalbendîyê dikin, niha bi muxelîfên şiî yên başûrê Iraqê yên ku reveberên wê li Îranê bûne penaber re, bi ***Al Da'wa*** bi taybetî û bi **Îmam Bakr Hakim** ê Qûmê re di nav danûstandinan de ne. Berpirsiyarên ***Juwd***, bi taybetî jî yên *PDK, PSK û PCIyê* sloganên serxwebûnxwaz û yên têkildarî yekparebûna neteweya kurd a ku belavî pênc dewletan bûye, (Îran, Iraq, YRSS, Tirkiye û Suriye), ji bo demekê be jî bi kar naynin, pêşekîyê bêhtir didin hilweşandina rejîma **Sedam Husên** û sazkirina rejîmeke demokratîk li Iraqê û di heman demê de jî, weke ku **Mesûd Barzanî** di 14ê cotmeha 1984ê de diyar dike, bi çavdêrîyeke nepenî, bala xwe didin ser projeyên "xweserîya

AYŞE KAZCI: **Bênav**, murekeba çînî ya li ser kaxezê, 2 x 15 x 21 cm

www.arsivakurdi.org

îslamî" yên ji alîyê *Konseya Bilind a Tevgera Şiî* ve hatine amade kirin. Neteweya kurd a ku ji neçarî dikeve vê rewşa paradoksal, lê bi awayekî taktîkî têgihîştbar, vediqete ser du tevgerên otonomîst, ku her du jî weke *Partîya Demokrat a Kurdistan* tên bi nav kirin û her yek jê li dijî hikûmeta navendî ya welatê xwe têdikoşe, ango yek jê li dijî Îranê li tenişt û bi desteka Iraqê, ya din jî li dijî Iraqê li tenişt û bi desteka Îranê**.** Ji ber vê yekê **Îdrîs Barzanî** li kevîya Tehranê li Kerecê bi cih bû û bi sedan pêşmergeyan bi hevkarîya artêşa Îranê operasyon li dar xistin.

## Mesûd Barzanî mesafeyê dixe navbera xwe û îmam Xumeynî

Ev taktîk ne bi tenê zirarê dide îmaja PDK ya ku êrişên wê dikarin ji alîyê gel ve bi yên Îrana dijmin re bên tevlîhev kirin, herwiha ew, felaketa berê ya dema şerê 1974-75ê a ku hingê neteweperwerên kurd ên Iraqê xwe spartibûn hevalbendîya **Şah**, tîne bîra mirov. Haydarbûyî ji vê pirsgirêkê, **Mesûd Barzanî** li herêmên ku gelek alîkarî pêşkêşî wî tê kirin, yên weke *Behdînan* û herêma bakur a ser sînorê Tirkiyê, çalakîyên çekdarî yên PDKê zêde kirin; ew mesafeyê dixe navbera xwe û îmam **Xumeynî** û rêveberîya partîyê vediguhezîne Şamê û li gel **Qedafî**yê ku soza alîkarîya cebilxaneyî didê, di 1985ê de têkilîyan girêdide.

Di "şerê axayan" yê ku tevgera kurd a Iraqê ji hev perçe dike, **Talebanî** tercîh dike ku ji 1982yê û şûn ve li tenişt *PDKya Îranê* ya **Qasimlo** li dijî artêşa Îranê û rejîma **Xumeynî** şer bike. **Sedam Husênê** ku bi derbeyên artêşa dijmin û yên muxalîfên hundir dişewişe, di payîza 1983yê de zêdetir tawîzan dide û tenê YNK di 10ê kanûnê de bersiveke erênî dide pêşniyarên wî. Gelek gotegotên bi nakok derbarê muzakereyan bi qasî sêzde mehan dewam kirin, belav bûn û di encamê de ***YNK*** di 15ê çileya 1985ê de xwe ji hevdîtinan vedikşîne û biryara şer dide. Ji şeş pêşniyarên *YNK*ê, dudu jê ne mumkin bû ji alîyê rejîma Bexdayê ve bên qebûl kirin: Yek ji pêşniyaran ew bû ku erka birêvebirina hêzên çekdar ên Kurdistanê radestî hikûmeta herêmî bihata kirin ku navenda vê hêzê wê ji çil hezar zilamên **Talebanî** pêk bihatana û di heman demê de sazîya cehşîyê jî wê hatibûya ji hev xistin; pêşniyara din jî ew bû ku *Kerkûk* û rezervên wê yên petrolê tevlî nav herêma xweser bihatana kirin û bi wî awayî hatina aborî ya petrola vê wîlayetê wê biketa xezîneya hikûmeta herêma kurd. Lê belê li Iraqê gelo kîjan desthilatê wê qebûl bikira ku van her du mifteyên sereke yên serxwebûnê, radestî Kurdistanê bike?

## Partîyên muxalîf ên kurd, ên demokrat û şiî pêşniyarên efûyê yên Sedam Husên red dikin

Dema ku muzakere pêk dihatin, nerazîbûnên gel li bakurê welêt heta keleha Talebanîyan herêma Silêmanîyê jî, berdewam bûn. Bi rasthatina Newroza (cejna biharê) 1984ê û bîranîna komkujîya xwendekarên ku di nîsana 1974ê de ji alîyê rejîmê ve li ***Qela Dizê*** hatibûn qetil kirin, gundîyan meşek li dar xist, merşên neteweyî gotin û bi ser hêzên hukûmetê de nalet barandin. Tengezarî di tîrmehê de zêdetir bû, gava ku Bexdayê ji nîşka ve li ser xwendekarên herêma xweser ji bo mehên havînê çûna eskerîyê ferz kir. *Fakultaya Hunerên Bedew* dest bi grevê kir û roja din, tevahîya zanîngeha *Silêmanîye* û hetta, xwendekarên *Musil*ê jî beşdarî grevê bûn. Di dema pevçûnên bi polîsan re, bi dehan kes hatin kuştin an jî birîndar bûn û pêşmergeyan jî xwendekar parastin. Pêvajoya wê havînê, artêşa gel tevî desteka heşt hezar cahşan, şikesteke mezin xwar li hemberî berxwedana deh hezar zilamên *PDK*ê û hevalbêndên wê yên ***Juwd*** û bi hezaran endamên ***YNK*** yên li dijî muzakereyên bi Bexdayê re.

## Dewleta Îraqê di demeke nêzîk de wê neçar bimîne ku li ser pergala xweser a ji Kurdistanê re hatiye nasîn, careke din bifikire

Li mehên pêşî yên sala 1985ê, têkoşîna kurdan li dijî rejîma Iraqê li tevahîya herêmê, ji *Zaxo*yê bigire heta bi *Silêmanîyê* û heta bigihe *Kerkûkê*, berbelav bû. Partîyên muxelîf ên kurd, ên demokrat û şiî di 13ê sibatê de pêşniyarên nû yên efûyê yên **Sedam Husên** red kirin û careke din daxwaza xwe ya guherandina rejîmê anîn ziman. Herçendî, bi desteka navneteweyî, rejîma baasê, bêyî ku serî li ber daxwazên îmam Xumeynî bitewîne, karî dawî li şer bîne jî, niha li hundir belayeke din li hêvîya wê bû: muxalefeta ku her diçû mezin dibû û daxwazên wê radîkaltir dibûn, bi têkoşîna xwe jî berê xwe heta Bexdayê fireh dikir. Derîyê derve yê şerê Kendavê kîjan be bila bibe, dewleta îraq di demeke nêz de wê neçar bimîne ku li ser pergala xweser a ji Kurdistanê re hatiye nasîn, careke din bifikire.

Di asta herêmî de, dîsa jî, têkoşîna kurdên Iraqê dikare rastî xetereke din were: xetera dijberîya têra xwe dijwar a rejîma Enqerê ya li himberî tevgera wan a neteweyî. Di gulana 1983yê de nêzîkî bîst hezar eskerên tirk sînor derbas kirin û bi dehan kîlometre bi kûrahî li nav axa Iraqê, bi desteka helîkopteran, derketin nêçîra şervanên *PKK*ê û *PDK*ê. 17ê cotmeha 1984ê eşkere kir ku wê li gel Bexdayê îmze daniye ser peymana "tevgera koordîne" li deverên ser sînor, ku vê lihevhatinê li dijî mîlîtanên neteweyî yên kurd destûr dida artêşa tirk ku bikeve herêmê û dest tê werde. Gelo ev tê çi wateyê? Ev tenê tê wateya dewrkirina hêzê ji alîyê baasîstan ve ku bi Îranê re di nav şerê Kendavê de ye? An jî dibe venasîna Tirkiyeyê ku weke jandarmayê herêmê daxwazên xwe yên li ser Musilê ji bîr nekirine? Gava mirov dinêre ka rejîma tirk li ser erdê nav sînorê xwe çawa nêzîkî neteweparêzên kurd dibe, hingê mirov tê derdixe ku li pêşîya kurdên Iraqê hê salên dûrûdirêj ên têkoşîneke bi êş hene.

* Lêkolînera Weqfa Neteweyî ya Zanistên Siyasî. Nivîskara gotarê Elisabeth Picard, polîtîkzaneke fransî ye û bisporîya wê li ser têkilîyên Rojhilata Navîn bi taybetî welatên ereban e. Bi salan li Rojhilata Navîn jîyaye û birêveberîya rêxistinên mîna IREMAM, CERMOC (Navenda Xwendin û Lêkolînên Hemdem ya Rojhilata Navîn) kiriye û li Beyrûd û Parîsê di zanîngehan de xebitiye. Di vê derbarê de gelek pirtûkên wê hene; yek ji wan bi navê Pirsa Kurd ya Komplex e ku bi hin kesên din re derxistiye.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## WÊNESAZA VÊ HEJMARÊ

### Ayşe Kazci

Wênasaza kurd Ayşe Kazci di sala 1968an de li Elbîstanê ji dayîk bûye. Di 8 salîya xwe de tevî malbata xwe koçî Berlînê kirine. Di cîwaniya xwe de evîndarîya xwe ya bi rengan re kifş kirîye û di vî warî de hûnera xwe peşve xistîye û perwerdeya xwe li Braunschweigê li Akademîya Hunerên Bedew di beşa wêne de temam kirîye. Di dawîya perwerdeya xwe de li Spanyayê di Zanîngeha Santanderê de bursek qezenc kir. Li wê derê him fersenda fêrbûna zimanê îspanî bi dest xist û him jî perwerdeya xwe ya hunerê domand.

Ayşe Kazci li gel hunera wêne perwerdeya dîzaynerîya multîmedyayê jî kirîye û ji sala 2001ê vir ve li Hamburgê wek hunermanda serbest û dîzaynera multîmedyayê dixebite.

Hunermanda kurd, herweha beşdarî projeyên di binesazîya INTER-NOS 2010ê de hatin çêkirin, –mîhrîcana wêne ya dîwar û mîhrîcana del Carîbe- bû.

Hezîran-Îlon 2010an de li Santiagoyê di navenda huner û çand a ``de Cuba da Taller` de wek hunermanda vexwendî derfetên xebatê bi dest xist. Di vê pêvajoyê de bi hunermendên kubayî û hunermendên navnetewî re xebitî. Hunermanda kurd plan dike ku beşdarî INTER-NOS 2012 de jî bibe û dîsa di binesazîya vê mîhrîcanê de li ser projeya pêşengeheke bi hunermendên kubayî; Aratta Hachavîra û hunermenda kolombîyayî Sarah Houghton re bixebite.

Ayşe Kazci di xebatên xwe yên hunerî de, projeyên alternatîv ên wek jiholêrakirina tixûbên di nav gelan de hatine danîn û têkoşîna ji bo aşitîyê ji xwe re kiriye armanc.

Prensîbên herî girîng ên 'Wênesazên Dîwêr' (Muralîst) ku Kazci jî ji alîyê huner û ramanê ve xwe nêzî wan dibîne; rêzgirtin, mafê çarenûsî ya gelan û azadî ne. Hunermendên muralîst xwedî li van nirxan derdikevin û ji bo van nirxan têdokişin. Mesajdayînên polîtik û civakî taybetîya herî girîng a 'wêneyê diwarê' ye. Muralîst li cîhên ji rayagîştî re vekirî hunerên xwe bi awayekî mîlîtanên hunerê bi kar tînîn, armanc û mesajên xwe digîhîjînin gel. Hunermend Ayşe Kazci di hunera xwe de gelek girîngî dide wêneyên dîwêr.

Hunermend pêşangeha xwe ya yekemîn a wêneyan di sala 1990 an de Li Braunschweigê vekir û ev bîst sal e bi dehan car li Braunschweig, Hamburg, Bruksel û li Kubayê beşdarî pêşangehan bûye.

Hunermend li Hamburgê dijî û xebatên xwe yên hunerî didomîne. Ji bo agahdarîyên zêde li malpera www.aysekazci.de binêrin

www.arsivakurdi.org

# Li welatê Baskan aşitî mimkun e

BRIAN CURRIN *

Heta bi erefeya hilbijartinên herêmî yên spanyayî yên di 22ê gulana 2011ê de qedexeya tevlîbûnê li ser çepa neteweperest hebû û vê çepê di dawiyê de %25.5ê dengan li sê wilayetên baskê bi dest xist. Ev serketin elaqedarî angajmana navbênkarên Koma Têkilîdanînê ya Navneteweyî ye. Parêzerê ji Afrîkaya Başûr Brian Currin yek ji wan kesan e ku ji bo çareseriya yek ji pirsgirêkên siyasî û bi şîddet yên dawî yên Ewrûpayê dixebite.

Helwêsta karbidestên hikûmeta îspanî ya li hember pevçûna li Welatê Baskan weha ye: Ev ne pevçûneke [konflîkteke] siyasî ye. ***Madrîd***, ***ETA***yê (***E**uskadi **T**a **A**skatasuna- **N**îştimana Bask **û A**zadî*) wekî komeke sûcdar û terorîstan bi nav dike û ***Abertzale Left*** (Çepgirên Welatparêz) jî **(1)**, ku ETAyê şermezar nakin, wekî ETAyê bi nav dike. Di nav van kesên navlêkirî de ew kes jî hene, ku tu caran bi xwe çalakîyên şidetê li dar nexistine û piştgirî nedane şidetê. Wekî encama vê binavkirinê, di deh salên çûyî de siyaseta *Çepgirên Welatparêz* li Îspanyayê hat qedexe kirin. Ev helwêst hem ecêb û hem jî bêkêr e. Ecêb e ji ber ku, her çend ***Madrîd*** xwedî helwêsteke weha bû jî, hem hikûmetên Sosyalîst û hem jî yên Partîyên Gelî ji 1998ê û vir ve hewl dida digel ***ETA***yê çareserîyekê muzakere bikin. Bêkêr e ji ber ku înkarkirina aşkera ya hebûna lihevnekirineke siyasî, hewldanên hikûmetan rê li ber çareserîya pevçûneke nav gelên Îspanyayê digire.

Kêmasîyeke din a irsî ya vê helwêstê jî ew e ku li wê lihevnekirina siyasî ya ***Bask***ê wekî ***ETA*** bi nav dike û herçend di çavê Madrîdê de şidet ne xwedî mafdarîyekê ye jî, tu caran hewlê nade ku li sedemên wê bikole. Li dû vê helwêstê, encama ku *Madrîd* daxwaz dike, ku ev encam ji bo hikûmeta îspanî dê bibûna çareserîya pevçûnê, dawîlêanîna şideta *ETA*yê û xwe radest kirin.

Lê belê ji bo *Çepgirên Welatparêz*, destûra Îspanî ya 1978ê, ya piştî serdema **Franco** mafên çandî, civakî û siyasî ya ***Gelê Bask*** bin pê dike an ku bi kurtasî mafê wan ê diyarkirina çarenûsa xwe nas nake. Bersiva Madrîdê ji bo vê yekê weha ye: Îspanya demokrasîyeke destûrî ye û statuya Welatê Baskan a wekî civakeke xweser ji destûrê bi xwe tê û hikûmet ne xwedî pêwîstî, ne jî peywirê ye ku vê destûrê biguherîne.

Nihêrînên muxalif li ser esasa lihevnekirina siyasî ya Baskê ne, ne ya şideta ETAyê.

Şideta ETAyê bû sedema mirina zêdeyî 800 kesan û bi kêmî ve ewqas jî birîndaran. Di nav qurbanîyan de siyasetmedar, endamên hêzên ewlekarîyê, karsaz, dadger, rojnameger, akademîsyen û hevwelatîyên asayî hebûn. Hevdem, bi dehan endamên *ETA*yê û *Çepgirên Welatparêz* jî bi destê hêzên ewlekarîyê û komên çekdar hatin kuştin. Herweha, reftarê xerab û êşkenceya dema desteserbûnê jî xizmeta radîkalkirina neteweperestên ciwan ên bask kir.

Şideta ETAyê herweha pêbawerbûna pevçûna siyasî jî kêm kir ku hikûmeta îspanî jî bi vî avayî karibû daxwazên maqûl ên siyasî, ku kêfa wê jê re nedihat û tercîh dikir ku paş guhan de biavêje, wekî terorîzma tazî kamûfle bike.

Heger ETA qebûl neke ku bi awayekî daîmî dawî li têkoşîna xwe ya çekdarî bîne, hêzên ewlekarîyê di çarçoveya qanûnan de xwedîyê wî mafî ne ku hemû gavên hewce biavêjin daku ***ETA***yê têk bibin. Lê belê divê destûr neyê dayîn ku ev tedbîr, hebûna pevçûneke siyasî, ku nikare were vegerandin, tevlihev bike yan jî girîngîya wê kêmtir bike.

Heger şideta *ETA*yê ji pevçûna siyasî were cuda kirin û hemû partîyên siyasî yên aştîyane yên civaka ***Bask*** bikevin muzakereyên nîyeta baş da ku çareserîyeke demokratîk a hevpar bînin holê, ev pêvajo dê bi ser keve û bawer dikim ku dê ***ETA***yê jî ji şidetê dûr bixîne.

Gelek kes dê gengeşî bikin û bibêjin têgeha pêvajoya aştîyeke hevpar a heralî ji bo çareserîyeke siyasî û dawîlêanîna şideta *ETA*yê dê naîfî be. Dibe ku ev naîfî be, lê belê ji bo çareserkirina vê girêka kêşeyan tiştê ku pêwîst e ev e: Masumîyet, pur û pakbûn, desttênedabûn û pêbawerbûneke zaro-kane û herweha antîteza têkoşîneke acizbûnê, beşdarbûna zalimane û şikbar û qurbanîyên şerekî domdar.

Pevçûna Baskê ji bo endamên *Koma Têkilîyê* ji bo ***Welatê Baskan*** (ICG) hîna mijareke nû ye. **(2)** Ev kom di mijarê de bê barên rabihurîyê beşdar dibin, ku hemû partîyên li Welatê Baskan, bakur û başûr û yên li *Îspanya* û *Fransa*yê bixwazin nexwazin vî barî bi xwe re dikişînin.
Endamên komê hemû kesayetîyên bêalî û hêjayî bawerîyê ne, ku mebesta wan a yekane aştî û normalbûneke siyasî ye. Di van şert û mercan de, dijwar e ku mirov dijminatîya destûrperestên îspanî ya li dij beşdarbûna vê komê fam bike. Tenha îzahkirina maqul dikare tirs be: Tirsa ji demokrasîyeke beşdar ya li Welatê Baskan, ku hemû neteweperestên alîgir yên diyarkirina çarenûsê tê de beşdar bin; tirsa ji beşdarbûna gengeşî û muzakereyên vekirî yên li ser mijarên wekî nasnameya baskî û daxwaza wan a ji bo bikaranîna mafê diyarkirina dahatûya wan.

Yek ji dijwarîyên li pêşîya ***ICG***yê bertarafkirina van tirsan e. Bi awayekî fahmbar bawerî jî meseleyek e. Lê belê ev yek ne ji wan sedeman e ka çima bixêrhatina beşdarbûna navneteweyî bêkirin. Agirbesta niha ya *ETA*yê bersivek e ji bo *Danezana Brukselê* ku ji alîyê çalakvanên aştîyê ve hatibû piştgirî dan, ku di nav van kesan de 5 xelatgîrên Xelata Aştîyê ya ***Nobel***ê *(Desmond Tutu, Frederik Willem de Klerk, John Hume, Betty Williams and Mairead Corrigan Maguire);* kevne-komîsereke bilind a ji bo Mafên Mirovan a Neteweyên Yekgirtî, **Mary Robinson**; û *Weqfa Nelson Mandela* jî hebûn. Tecrûbe û mantiq ji min re dibêjin ku hakemên alîyên sêyem, nemaze heger lîderên bilind ên rêzlêgirtî yên cîhanê di nav wan de bin, ji bo rakirina tevgerînên tund ên hemû alîyan de xwedî bandor in.

Dema ku ICG di sibata îsal de (2011) li Welatê Baskan bi awayekî fermî kom bû, hawîrdora sosyo-polîtîk ku ev tev lê bûn, ji atmosfera deh salên pêşîn ên sedsala 21emîn gelek cudatir bû.

Rastîya guhertî ya îroyîn a sîyaseta Baskê encama biryareke serokatîya *Çepgirên Welatparêz* e, ku mebesta biryarê gavên guherînhez û dûrbîn ên li siyaseta demokratîk a *Civaka Xweser a Baskê* û *Civaka Navarrayê* bû. Sedemên girtina biryareke weha hatin rexne kirin. Siyasetmedarên rastgir got ku ev yek gaveke komployê ya ETAyê da ku li hember têkçûna siyasî û leşkerî, ku dike pêk were, ji bo dîsa berhevkirin û hêzgirtinê ye. Li gor nirxandineke kêmtir şikbar jî *Çepgirên Welatparêz* di hişên xwe de lê hay bûn ku bêyî ku di pêvajoya aştîyê û avabûnên demokratîk de bi awayekî hiquqî û şeffaf cih negirin, projeya wan a siyasî ji bo self determînasyonê nikare bê pêk anîn.

Ji ber beşdarbûna min a di vê pêvajoyê de dizanim ku serokatîya *Batasuna*yê sedem û zanabûna legalîzasyonê bi giştî fam kiriye. Tevgera ji bo avakirina partîyeke nû ya siyasî, ku manîfestoya wê dê pêwîstîyên legal tatmîn bike, her ku diçû mezintir dibû. Ji bo vê yekê stratejîyeke baldar divê: Stratejîyek ji bo avêtina tembeleke hêzdar bi riya şêwrên berfireh digel alîgirên wê; stratejîyek ji bo legalbûna partîyên din ên siyasî yên li *Welatê Baskan* û piştgirîya navneteweyî. Ev hemû jî bi awayekî serkeftî pêk hatin.

Di sibata îsal de *Çepgirên Welatparêz* hin gav avêtin da ku partîyeke nû ya siyasî, ***Sortu***, ava bikin, ku manîfestoya partîyê bi giştî li gor *Qanûna Partîyên Siyasî* ye. Bi kurtasî ***Sortu***: Ji bo pêkanîna mebestên xwe yên siyasî bi tenê rê û rêbazên aştîyane/bê şidet bi kar tîne; xwe ji hemû partîyên din, ku di rabihurîyê de têkilîyên wê bi wan re hebûn, yan hîna jî hene, û şidet qut kir û soz da ku hemû çalakîyên şidetê yên hemû partîyan, nemaze ya ETAyê şermezar bike. *(Qanûna Îspanyayê bi awayekî taybet şermezarkirina şideta ETAyê pêwîst dike.)*

***Sortu***yê di heman demê de piştgirî da ***Danezana Brukselê***, ku tê de bang li *ETA*yê dihat kirin ku agirbesteke yekalî û daîmî ragihîne û li gor wê tev bigere. ETAyê di 10 sibata 2011ê de bersiveke erênî da vê bangê.

Bersiva hikûmeta îspanî ya li hember van rûdanan gelek bi îhtîyat bû. Ji ber gelek sedeman li dij statuya qanûnî ya ***Sortu*** derket, ku paşê dê qala wan jî bikim. Di encamê de statuya qanûnî ya *Sortu*yê çû pêşîya Dadgeha Bala. Di adara îsal de, koma 15 dadgerî 9 li hember 6 biryar da ku *Sortu* bê qedexe kirin. *Sortu*yê jî biryar li cem Dadgeha Destûrê bir îstînafê.

Piştî biryara qedexeyê, hevgirtineke partîyên heyî yên neteweperest *(Eusko Alkartasuna, Alternatiba, Herritarron Garaia û Araba Bai)* partîyeke nû ava kir: ***Bildu***. Di nav partîyê de şexsîyetên serbixwe yên nêzî Çepgirên Welatparêz jî hebûn. Madrîdê jî serî li Dadgeha Bala da û di encamê de ***Bildu*** jî hat qedexe kirin. Sedemên qedexekirina ***Bildu***yê nêzîkî yên *Sortu*yê bûn, anku partîyê ew kes kom kirine ku berê têkilîyên wan bi *Batasuna*yê re hebûn û lewma *Bildu* îlhama xwe ji *ETA*yê stendîye. Piştî îstînafa li cem Dadgeha Destûrê, dadgehê biryar da ku delîl tunene ku vê komploya ETAyê piştrast bikin û di 5ê gulana 2011ê de qedexeya li ser *Bildu*yê hat rakirin.

Da ku ***Sortu*** bikaribe bi hemû alîyan ve li gor pêwîstîyên legalîzasyonê tevbigere, pêdivîya wê bi piştgirîyeke stratejîk û teşwîqê hebû. Parçeya şikbar a vê piştgirîyê tevlêbûna navneteweyî û piştgirîya vê tevlebûna navneteweyî ya ji bo pêvajoyeke aştîyê li Welatê Baskan a li dû dawîlêhatina ETAyê bû.

Fikar hene ku heger ***ETA*** bi awayekî daîmî dawî li şidetê bîne û çekên xwe deyne, hikûmeta îspanî dixwaze naveroka siyasî ya pirsgirêkê bi giştî paş guhan de biavêje û serkeftina xwe ya li dij terorê ragihîne. Pêwîstîya ji holê rakirina van fikaran di avabûna ***ICG***yê de bû hêza sereke.

Sala 2010ê ez bi gelek alîyên li Welatê Baskan şêwirîm da ku ji bo ICGyê peywirekê bibînim. Piştî van şêwran mîsyona giştî ya ICGyê hat diyar kirin: *Leztirkirin, mumkunkirin û hêsankirina pêkanîna normalbûneke siyasî li Welatê Baskan.*

*Danezana Brukselê* dibêje piştî ragihandina agirbesteke yekalî, daîmî û pêkan a ji alîyê ETAyê, ICG dê dest bi kar û xebatên xwe bike. ETAyê agirbest ragihand ku hemû pêwîstîyên Danezana Brukselê bi cih dianî û bi vî awayî jî ICG hat damezirandin û mîsyona xwe ya taybet aşkere kir, ku tê de ev çalakî hene: *Mumkunkirina legalîzasyona **Sortu**yê; berterefkirina hemû sînorên li dij çalakîyên azad ên siyasî; pêkanîna siyaseteke reformê ji bo rewşa nû guhertî ya siyasî; li ser daxwaza wan teşwîqkirin û piştgirî dana partîyan, bi amadekirin û pêşdebirina ji bo dîyalogegeke siyasî, hevpeyvîn û muzakereyên pirpartîyî, ku hemû alî bikaribin tê de beşdar bibin û tu şert û encamên pêş-diyarkirî nebin û li gor Prensîbên Mitchellê pêk werin; heger ji partîyan daxwaz were, di rewşên xitimî de navberkarî; û bi gelemperî avakirina bawerîyê li cem raya giştî ji bo pêkanîya pêvajoyeke serkevtî ya aştîyê.*

Piranîya partîyên siyasî yên Welatê Baskan hat piştgirîya vê mîsyonê kir, ku hin alîyên nav Partîya Sosyalîst jî tê de bûn. Mîsyon herweha ji alîyê piranîya sendîka û yekîtîyên karsazîyê ve jî hat piştgirî dan.

Li gor dîtina *ICG*yê pêwîstîya herî bingehîn a ji bo normalîzasyona siyasî ya li Welatê Baskan beşdarbûna hemû partîyên alîdar a bi dilsozîya jidil bo rê û rêbazên aştîyane û demokratîk ku tenha azîne ne û ji wan veger nîne. Kom xwedî sedemên baş e ku pê ewle bibe û armancên wan nêzî pêkhatinê ne.

Hêvîya me nemaze bi hilbijartinên aştîyane yên 22ê gulanê yên li ***Civaka Xweser a Bask*** û ***Civaka Navarra***, zêde bûn ku tê de hemû partî beşdar bûbûn. ***Bildu*** jî tê de beşdar bû û bi vî awayî guncan bû ku hemû hevwelatî bikaribin deng bidin partîyên ku dixwazin.

Rewşa li Welatê Baskan, ku ber bir normalbûna siyasî ve diçe, nikare bê rawestandin û ev rewş dê pêşî li dawîlêanîna daîmî ya şideta ETAyê vedike.

Ji bilî lipeyçûna serokatîya ***Sortu***yê pêvetir tu şansa ***ETA***yê nîne. ***ETA*** divê zanibe ku alîgirên wê, piştgirî da projeya nû ya siyasî ya ***Sortu***yê û bixwe dît ku ***Sortu***yê profîl û hevgirtina digel partîyên din ên neteweperest ên li *Welatê Baskan* bilind dike, ku van partîyan berê ***Batasuna*** li derve dihişt. Agirbesta ***ETA***yê yekalî ye û ne di encama şert yan jî muzakereyên digel hikûmeta îspanî hat ragihandin lê belê wekî bersiva banga serkêşên aştîyê yên cîhanê. *ETA*yê agirbesteke yekalî qebûl kir û agirbest ji alîyê raya navneteweyî ve tê çavdêrî kirin û di dawîyê de *ETA* dizane ku heger agirbestê bin pê bike, ***Sortu*** dê wê şermezar bike û heger binpêkirinek nebe, agirbesteke piştrastkirî dikare rê li bêçekkirinê veke.

Nîşaneyeke hêzdar a berbiçav û delîla guherîna ETAyê, di çarçoveya agirbestê de, dawîlêanîna 'baca şoreşê' anku xûgîya ku ji karsazan dihat stendin. Vê bacstendinê gelek salan devam kiribû û parçeyeke navxweyî ya têkoşîna çekdar a ***ETA***yê bû. ***ICG*** bixwe jî piştî çavdêrîyê bi awayekî aşkere piştrast kir ku rêz li vê beşa agirbestê tê girtin.

Piştrastkirina hemû alîyên din ên agirbesta ETAyê rêzepêşî ya herî sereke ye. Ev yek gelek mijareke gelek tevlihev û hesas e û da ku bibe bandorkar û hêjayî bawerîyê, jê re hevkarîya digel dewletê divê. ICG hewlê dide ku digel alîdaran bi hev re bixebite û bi hêvîya pêkanîna encamekê, ku tê xwestin, bi bisporan dişêwire.

Piranîya aktorên siyasî û civakî yên li *Welatê Baskan* derfeteke rastîn a ji bo pêvajoya aştîyê hîs dikin, ku ev pêvajo ji ber ku nû ye û rastîyan nû pêşkêş dike, ji bo dahatûyê jî hêvîyên nû dide. Lê belê ev yek nayê wê wateyê ku ew dê karekî hêsan be. Û her ku partîyên li *Welatê Baskan* berdewam bikin û serokayetî û wêrekî nîşan bidin, di bertarafkirina pevçûna dawî ya siyasî ya li Ewropayê de divê hikûmeta îspanî jî, ji şideta ETAyê cudatir, hebûna pevçûneke siyasî jî nas bike, ku ev pevçûna siyasî jî bi riya hemû muzakereyên di asta herêmî de, û paşê jî di asta neteweyî de divê bê çareser kirin.

* BA LLB, Parêzerê Mafên Mirovan: Çareserkirina pevçûnan û pêvajoya aştîyê. Endamê Koma Navneteweyî ya Têkilîyê ji bo Welatê Baskan

1 Abertzale Left anku Çepgirên Welatparêz komeke alîgira azadîyê bû ku Herri Batasuna (Yekîtîya Gel) û paşê Batasuna (Yekîtî) temsîlîyeta wê kir

2 ICG herweha ji van kesan pê tê: Silvia Casale, Alberto Spektorowski, Nuala O'Loan, Pierre Hazan, and Raymond Kendall (Nîşeya Edîtor)

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser tûwalê û fotraf, 50 x 70 cm

www.arsivakurdi.org

# Faust û sîmyaya kapîtalîst

BERNARD UMBRECHT *

Berhema ku bûye sembola çanda almanî, Faust bi dirêjayîya dema meraq û şiroveyên pir cihê hate afirandin. Ev piyesa ku heta demeke nêzîk jî bêtir li Komara Federal a Almanyayê (KFE) dihate îhmal kirin, lê li Komara Demokratik a Alman (KDE) weke sembola avakirina civateke nû dihate rave kirin, îro li ber ronahîya krîzê gihaştiye qonaxeke din: Fausta ku mîmara yekem a globalîyê bû, îro bûye lehengek neyînî li tevahîya cîhanê.

Goethe, di dema şoreşên endustrîyê û siyasetê de yên ku li Ewropayê dawîya sedsala XVIIIem û destpêka ya XIXem serûbin kiribûn ***Faust*** nivîsî. Ev xebat bi dirêjayîya temenekî pêk hat. Profesorê edebiyatê **Michael Jaeger** dest nîşan dike. Gava ku wî ji nû ve weke piyes dest avêt **Doktor Faustê** dema berê –sembola efsaneyî ya simyanasîyê yê ku dilê wî bi daxwaza zanîna her tiştî lê dida û di Serdema Navîn a alman de derket holê, paşê di dawîya sedsala XVIem de, piyesa Ingilîz **Christopher Marlowe** da ser şopa wê–, Goethe hîn bîst salî bû. Piştî "yekem" Faustê (Urfaust) di 1775ê de, ew Faust Iê di 1808ê de çap dike; ew dê berhemê ji nîvsedsalê bêtir bi şûn de, di 1831ê de, *"di bin bandora Şoreşa Tîrmeha 1830ê de li Parîsê"* (1) temam bike. Ev Fausta IIyê, ku Goethe dê heta mirina xwe, di 1832yê (82 salîya xwe de), devê wê mohr bike, dê demeke dirêj ser sehneyên almanî nebîne. Ji ber ku, ew dê ji nû ve bilîze û him jî li ber ronahîya şiroveyên nû –bi taybetî jî ya **Hans Christoph Binswangerî** (2), profesorê rûmetê yê aborî û ekolojîyê li Universiteya Saint Gallê, li Swîsreyê–, tu dibêjî qey îro bi awayekî seyr dengê wê û yê krîza kapîtalîzmê ya îro bi hev re olan dide. Û bi daxwaza ji hev derxistina şert û mercên wê re jî.

## Û bi Şeytên re dikeve şertê

Em pê dizanin ku Doktor Faust, hosteyê zanîneke bê serûbin e, lê ev yek wî tetmîn nake û bi Şeytên re dikeve şertê: Ger şeytan alîkarîya wî bike ku ew bextewerîya li ser jêrzemîne nas bike, wê gavê Faust dê rihê xwe bide wî.

*– Ger ez niha bêjim: Tu raweste! Tu ewinde bedewî ku!*
*Wê demê tu dikarî min qeyd û bend bikî*
*Wê gavê ez bi tunekirina xwe razî me*
*Wê çaxê zengila mirinê dikare lê bixe…* (3)

Bi ***Méphistophélès***î re, lehengê me dike ku dev ji pirtûkxaneya xwe berde û li dinyayê bigere, da ku daxwazên xwe pêk bîne.

**Goethe** pir ji nêzîk ve bi zanyarî, teknîk û aborîyê mijûl dibû. Karzanîya wî ya di vî warî de derfet da wî ku di mîrekîya **Weimar** de weke Wezîrê Aborî û Diravî were wezîfedar kirin. Bi awayekî pir çalak bi vî karî rabû. Lê bi diravî bi tenê nayê ser, herwiha bi xebatên avadankirin û sanayîyê, maden û tekstîlê eleqedar dibû. Di warê budceyê de, em deyndarê wî ne ku ji bilî ya ji bo talîman, wî hema hema budceya artêşan bi tevahî jê bir.

Mirovê çalakîyê, berî giştî maneya çalakîyê, encamên lêgerîna pêşketinê û sînorên "hevdemîyê" ye, ku bi Faust re minaqeşe dike. Tiştê ku bi taybetî jî, ji bo nêrîneke hevdem a di warê aborîyê de balkêş e, ev e.

Bi vî awayî weke mînak, ji bo bersiva pêdivîyên împaratorê xezîneya wî vala bidin, Faust û Méphistophélès pere çêkirin: Li gor aborînas **Binswanger**, ev sêhrbazîya nûjen, berdewamîya sîmyayê ya bi navgînên din e, ku êdî nema pêdivîya wê bi çêkirina zêr ya ji risasê heye, lê bi biqîmetkirina maddeyekî bêqîmet, kaxezê... heye ku bike pere. Nema pêdivî bi derxwezayîyê heye, ji ber ku êdî mûcîze xwezayî ye: Ji alîyê din ve, di sedsala XVIIIem de, Mîrê Orléansê, piştî ku banker John Law girte kar, stêrnasên xwe ji kar avêtin. Di piyesê de, kiryara afirandina diravî –bi *kîmyagerîyeke* hinekî weke destekî sêhrbazîyê–, ku bi awayekî pir mentiqî têkilîya wê bi mesqeretîyê re hebe, pêk tê: Împarator, gava ku li ber ronahîya meşxelan banknota orjînal a bankê îmze dike, xwe dixe drûvê **Plutus**î, Xwedayê Xezebê yê sermîyanên di bin erdê de.

Li Ewropayê, berevajî Çîna ku di vî warî de li pêş wê bû (4), afirandina dravî ne îmtiyaza dewletê bû, lê ya bankeyeke taybetî bû, ku ew jî xwedî îmtiyazên dewletê bû. **Goethe**, ji avakirina banka Îngilistanê ku ji alî karsazên Cityê ve, di 1692yê de hatiye ava kirin, îlhamê digire. Qiral îmtiyaza derxistina pereyekî kaxezî yê bêyî ku li hemberî qîmetê wî yê derkirinê têra xwe zêr hebe, dide vê bankeyê. Ev xala destpêkê ya sîstema dravî ya îro ye: Îcadkirina krêdîyê, paşê, –bi rêyên din– , dê avakirina dravî ya ***faustomefistofelî*** dirêj bike.

## Ji vê çirika pîs, zêrê xalis diherike

Qonaxa duwem a pêvajoya sîmyayî dê bibe ya afirandina qîmeta rasteqîn. Goethe bi awayekî pir vekirî dît ku misogerîya zêr a dravî têrê nake. Pere divê bibe sermîyanek, ew divê bibe sermayeguzarî. Guherîna ji bînerên şoreşa endustrîyê ve eyan e: Weke mînak **Alexis de Tocqueville** derbarê Manchester de wiha dinivîse, *"ji vê çirika pîs, zêrê xalis diherike"*. Pere derfeta kiryarê, afirandina di warê aborîyê de dide. Faust dibêje:

*"Ez dixwazim desthi-latê dagîr bikim, milki-yetê kiryar her tişt e, serfirazî ne tiştek e"*, Lê belê armanc çi ye, encam çi ye gelo?

Li ber qaqeb xwestina xwe ya dawîn, lehengê Goethe vê hevoka erjeng bi lêv dike û wê weke *"peyva dawîn a zanatîyê"* dihesibîne:
*Ew bi tenê bi qandî jîyanê hêjayî azadîyê ye,*
*Yê ku divê her roj wan bifetihîne.*
*Bi vî rengî ye ku xeter dora wan digire,*
*Zarok, xortê nûgîhayî û kalemêr dê salên xwe yên çalak li vir derbas bikin.*
*Min dixwest ku ez bibînim vê gêra gêrikê,*
*Li ser axeke azad xwe biçikilînim, bi gelekî azad re,*
*Wê gavê li wê derê, ez dikarim bêjim:*
*Tu ewinde bedew î ku, raweste êdî!*

Îdeala wî ew e: Tevgerandina giştî û seyarbûna giştî ya li hemî civata her dem bêbêhnvedan ne jî navberdan li ser kar e, belavbûyî ye. Civatek ku, di nav bêewleyîyeke berdewam de, ku êdî nema karibe weke berê bijî, lê bûbe civateke pêrewî. Ger em bi peyvên xwe yên nûjen, ên vê dinya îro bibêjin, dê ne perwerde, ne jî xanenişînî hebe –û helbet mirov dê yekşeman jî bixebite. Ji bo Faust, dê ji ya ebediyetê pê ve tu bêhnvedan tunebin. Lê ev nearamîya berdewam nayê tehamûl kirin: Geriyana di metbexên pîrebokan de yên ku jê re ji bo domkirinê tiryakan amade dikin, mecbûrî ye:

*"Daqurtîne wê gavê! Heydê metirse.* Méphisto di guhê wî de dibêje, berî ku jê re eşkere bêje:
*"Zû em derkevin, ne lazim e ku tu bêhna xwe vedî."*

## Mezinahîya ku mirov berê di dîn de lê digeriya êdî derbasî warê aborîyê bûye

Pere, maldarî, vejen û makîne, em di nav şoreşa senaîyê de ne û li ser riya dînê nû yê kapîtalîzmê ne. Binswanger rave dike: *"Mezinahîya ku mirov berê di dîn de lê digeriya êdî derbasî warê aborîyê bûye"*. (5) Lê ger, ji bo Walter Benjamin, *"di bingeha xwe de kapîtalîzm bikêrî sivikkirina van heman şikan û gumanên ku berê dînan ji wan re bersivek didît, tê"*, daxwaza kiryarê, ya pêşketinê û hwd., ku wî geş dikin, nikarin wî aram bikin. Piyes dikare bi awayekî bêkêmasî li navenda Fona dravî ya navneteweyî (IMF) bête lîstin. Lê Goethe îro derfeta ku mirov li hemberî vê zincîrqetandina bi rik, pirsa sînorê xwe zanînê bifikire jî dide.

Ji bo Binswanger, trajedîya Faust herwiha jî ya bêpîvanîya wî ye: Faustê *"çavên wî ji ber dîtina wî ya pêşketina bêrawestan tarî bûyî, ew bixwe dê bingeha projeya xwe ya aborî hilweşîne û dinyayê bîne helakê"*. Nexwe, heval û hogirên pêşketinê dê helbet çalak bin, lê herwiha jî jehrî bin… Ger, em bên ser *"fetha wî ya mezin û dawîn"*, Faust dest pê dike avgîrên ku *"hemî tiştên"berê fetihandine"* jehrî dikin ziwa bike, ew, li gor aborînas, qurbanîyê îluzyonekê ye. Ev ziwakirin ne temamkirina berhema wî ya mezin (bi maneya sîmyayî) e, lê sererastkirineke herî hêsan a mercên derveyî yên ji ber xebatên wî yên dema avakirina kêzînê ye, ku bêyî wê nabe. Goethe bi baldarî projeyên Kanalê Suweşê, Panamayê, Ren Tunayê, ku pêrgî van astengan tên taqîb dike.

Lê "jehrên çalak" ên din hene, him jî … manewî ne. Faust, ji alî kesayetîyeke sembolîk ya bi navê *Sorge* ve tê kor kirin. *Sorge*, Fikar (ev peyv herwiha bi almanî tê mana "lênêrîn"ê), bawer dike ku dengê bêr û bivirên ku dibihîze avzêman diguherin. Ya rast, ew gora wî dikolin. Û yên ku dest didinê jî êdî ne mirov in, lê bitenê cin, xeyalet, ruhên gerok in, yên ku bi şûn de mane. Xewna **Margaret Thatcher** xanimê bi cî hat: Civat hate hilweşandin. Wê gavê, nirxê ku karibe wateyê bide van karan hemîyan çi ye? **Oskar Negt** (6), xwendekarê kevin ê **Adorno** û hevkarê **Jürgen Habermas**, ku beşeke mezin a wextê xwe ji bo sendîkayan feda kir, şiroveya xwe ya Goetheyî dixe navenda exlaqê kalvînîst ê kar, li gor bingeha ruhê kapîtalizmê bi ya Max Weber.

*Madem ez heme, divê ez jî tevbigerim*
*Ez dixwazim aniha zendên xwe badim*
*û dest bi kar bikim.*

Li vir, gelo qudreta mirovî, ji ber ku gava kar dibe "tiryak" dev jê berdide? Faust di encamê de dibe birêveberê kampeke kar û **Oskar Negt** nikare xwe bigire ku di vî beşî de weke hisiyatekê nêzîkbûnekê di navbera Weimarê, bajarê Goethe û kampa temerkuzê ya Buchenwaldê de nebîne. (7)

*"Di destpêkê de çalakî bû"*, ya ku ***lêker***, ***peyv*** û ***hêz*** ji nav bir. Di warê aborîyê de daxwaza çalakîyê weke bêserî lêgerîna nemirîyê ya li ser rûyê erdê derdikeve holê. Bezîna li dûv demên mirî dema mirinê dikuje. Lê Faustê ku dixwaze bikaranîna demê bifetihîne, mehkûmê biserneketinê ye: Û Méphistophélès dê rabigihîne ku *"Dem bû serwer"* –ceribandina sîmyayî bi ser neket, Faustê ku li bêsînorîyê digere, li hemberî dinyayeke dawîlêhatî bi tenê dimîne. Di vê xwendinê de, ev helbesta dramatik weke ceribandina Goethe ya ji bo heta dawîyê li *Fabila mêşên hinguv* a Mandeville difikirînê û ji vê piyesê çêkirina laboratuareke ji bo encamên wê yên pirjimar e. Peyva wî ya binavûdeng, bingeha lîberalîzmê, ku dibêje *"gunehên taybetî xêra giştî pêk tînin"* bi pêşniyara Méphisto ya ku dibêje bûyîna *"beşekî ji vê hêza ku hertim xirabîyê dixwaze û hertim qencîyê dike"* re li hev dike. Lê wê gavê Faust çi bike, pê li "hêza" şeytanî bike, yan daxwazên xwe serbest bihêle yan jî biserkeve ku *"hêdî hêdî hemî tiştên li ser riya pêşketina wî dibin asteng, bimale"* (8): Ev e prensîpa bazara pîroz …

AYŞE KAZCI: **Bênav**, kolaja li ser tûwalê, 40 x 60 cm

* Rojnamevan

1 Li zanîngeha Azad a Berlînê profesorê edebiyatê û nivîskarê "Global Player Faust oder das Verschwinden der Gegenwart (Global Player Faust an jî wendabûna dema niha)" WJS Verlag. Di 2010ê de ji nû ve hate çap kirin

2 *Geld und Magie* [Pere û sêhrbazî, şiroveyeke aborî ya Faustê Goetheyî ye], Murmann Verlag, Hambourg, 2010 (çapa yekem, 1985)

3 Wergera hatiye bi kar anîn a çapa nû ya *Urfaust, Faust I, Faust IIê ye*, ku ji alî Jean Lacoste û Jacques Le Rider ve hatiye wergerandin û şirove kirin, weşanên Bartillat, Parîs, 2009

4 Împaratorê Çînê ji bo pereyê hêsan nivîsîngehek ava kiribû

5 Pirtûka wî ya pêşde dê aborînasan weke "civateke bawermend" nîşan bida

6 *Die Faust Karriere, vom verzweifften Intellektuellen zum gescheiterten Unternehmer* (*Karîyera Faust*. Ji ronakbîrîyek şikmend ber bi karmendîyek serkeftî ve) Steidl Verlag Göttingen 2006

7 Di 1937ê de hatiye ava kirin

8 *Le divin marché (Bazara pîroz)*, Denoel, Parîs, 2007

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademir

www.sîmakurdî.org

Piştî êrîşa amerîkî ya li dijî Usama Bin Ladin ya ku qelsiyên artêşa Pakistanê lê eşkere kirin, Pakistanê xwest ku Dewletên Yekbûyî bide zanîn ku ew ê dused eskerên bi awayekî fermî li ser erdên wê ne, vekişîne. Ev tedbîr sembola têkiliyên bi xirecir ên di navbera Îslamad û Waşîngtonê de ye.

WASHINGTON DI NAVA ÇIRAVA AFGAN Û ÎHTIRASÊN XWE YÊN ASYAYÎ DE DIÇE Û TÊ

# Piştî mirina Usama Bin Ladin, Pakistan

JEAN-LUC RACINE *

Operasyona biserdegirtinê ya amerîkî ya ku şeva 1ê gulana 2011ê diqulibî ser 2yê gulanê, beşek ji wê perdeyê rakir ku li ser şerê di sî û tarîyê de bû; ew şerê di navbera rêxistinên îstixbaratê yên amerîkî û pakistanî de. Bêyî ku tevahîya sir û razan eşkere bike.

Sala 2004ê di bin birêveberîya **George W. Bush** de *Pakistan* kete kategorîya biîmtiyaz a "hevgirên mezin ên *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê* li derveyê *Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê* (NATO)", di vê komê de kêmtirî panzdeh neteweyan (di nav de Awûsturalya, Îsraîl û Japonya jî) hene. Piştî heft salan, êdî mirov ji xwe dipirsin ka rewşa rastîn ya têkilîyên amerîkî-pakistanî çi ye, herçend **Usama bin Ladîn** li bajarê garnîzonê ***Abbottabadê*** nêzî akademîya eskerî ya herî girîng a welêt hate kuştin jî. Li wê akademîyê ku berîya bûyerê bi hefteyekê fermandarê artêşa bejayîyê general **Aşfaq Parvez Kayanî** li pêşberî xwendekarên ciwan ên nû, îdîa kiribû ku "*wan pişta terorîstan şkandiye*". (1)

Birêveberê CIAyê **Leon Panetta** yekser axivî û got: Washingtonê berîya operasyona biserdegirtinê agahî neda rayedarên pakistanî, ji ber ku hingê van rayedaran dikarî "*bi agahdarkirina hedefê, wezîfe bixista tehlûkeyê*" (2), bi vî rengî biryar hat dayîn operasyoneke eskerî li nav welatekî serbixwe, bêyî ku destûra vî welatî were stendin, bê meşandin. Ji mehan ve dîyaloga dewamî ya di navbera herdu welatan de aloz bûbû. Eskerên amerîkî ji ber "bêkêrîya" desttêwerdana li mintiqeya eşîrî (3) ya bakurê ***Wezîrîstanê*** ya hempîşeyên xwe yên Pakistanê her diçû bêhtir nerazî dibûn. Ji ber ku ji vê herêmê şebekeya ***Heqqanî*** ku bixwe mîrateya ***mucahidînên afganî*** ye, li dijî eskerên ***NATO***yê yên li rojhilatê Afganistanê êrişan bi rê ve dibe. Îfadeyên ***Panetta*** û nexasim hêrsa ji 2yê gulanê ve ya di navbera eskerên pakistanî rabûyî û *Central Intelligence Agency* (CIA) de hîpoteza lihevkirineke veşartî ya di navbera her du alîyan de lawaz dikin. Li gor vê hîpotezê artêşa Pakistanê di bin zextê de, yan jî bêyî ku zext hebe, dev ji koza **Bin Ladîn** berda –ev koz êdî di çarçoveya têkilîyên nihênî yên ji bo destpêkirina dîyaloga di navbera ***Washington*** û ***Talîbanên afganî*** de, kevin û bêkêr bû.

Zimanê fermî yê Pakistanê hewl dide qanih bike ku hebûna lîderê ***El-Qaîdeyê*** ya ji zû de, encama şkestineke tevahîya rêxistinên îstixbaratê yên welêt e; yên ku di nav karê şopgerîna **Bin Ladîn** de bûn û ne bi tenê şkestina birêveberîya ***Inter Services Intelligenceya*** (ISI) wê ya yekser di kontrola artêşê de ye. Şefê ISIyê **General Ahmad Şuca Paşa** bixwe li pêşberî parlemanê bi gilî û gazin behsa şkestina tevahîya sîstema ewlekarîyê ya welêt kir û di ber re jî hukûmeta herêmî û polîsê xwecihî gunehbar kir. (4) Di vê navê de tu kes nikare bawer bike ku rêxistineke bi qasî ***ISI***yê xwedî hêz dikarîbû bi nasnameya wan kesan nizanibe ku li bajarekî garnîzonê, li avahîyeke pir li derdora xwe neguncyayî diman.

Maneya vê illeh ne ew e ku CIAyê agahîyên xwe li ber yên ***ISI***yê negirtine, bi taybetî jî berîya rê û şopa wî biçe ***Abbottabadê***, ji bo kontrol bike ku **Abu Ahmed el-Kuweytî** qasidê **Bin Ladîn** e. **El-Kuweytî** pakistanî ye, li Kuwêtê ji dayik bûye û çavkanîyeke li ***Guantanamoyê*** nasnameya wî daye zanîn. Ji 3yê gulanê pê ve, serokdewlet **Asif Elî Zardarî** pêşî di *Washington Post*ê de kêfxweşîya xwe derbirî: Wî bi bîr xist –û heqê wî jî hebû– ku terorîzmê li Pakistanê bi dehan hezar mirov kuştine û xwe bi xwe pîroz kir ji ber ku "*hevkarîya destpêkê ya Pakistanê ji bo naskirina qasidê El-Qaîdeyê, di dawîyê de gihişte encamê*". (5) Lê belê ji hingê ve rengê axaftinê guherî.

Hin rojnamevanên wêrek ew rîsk girtin ser xwe ku hesab ji artêşê bipirsin, (6) yan jî bi dengekî bilind ew pirs kirin ku gelek kes bi dengekî pir nizm lê difikirin: "*heke me nedizanî, em dewleteke bibinketî ne. Û heke me dizanî em dewleteke beredayî û serserî ne.*" (7) Bi her halî, ji bilî çend kesayetên bang kirin, ji nû ve li ser tevahîya stratejîya pakistanî were hizirîn, nîqaşa raya giştî ya ku ji alîyê desthilatê, piranîya birêveberên siyasî û çapemenîyê ve tê îfade kirin, pir bi lez vegeriya ser mijara hukumranîya neteweyî ji bo ku desttêwerdaneke amerîkî gilî û eşkere bikin. Pirsa durûtîyeke muhtemel a artêşê û yekîneyên wê yên taybet bi bayê bezê hat berteref kirin, ev jî bi kêrî ponijîn û lêhizirîneke kêmtir nerehet hat; a li ser qelsî û kêmasîyên avahîyên ewlekarîyê yên ku destûr dan komandoyên bi helîkopteran bîyanî di nav welêt de operasyonê bikin (û piştî pêkanîna wezîfeya xwe, bêyî zerer ji welêt veqetin).

Tiştekî pir kêmdîtî diqewime, artêş biryarê dide ku xwe bo parlemanê bide vexwendin. Lê belê rexneyên yekser ên çend parlemanteran –yên mîna parlemanterê ***Lîga Misilman a Pakistanî-Nawaz (PML-N)*** û lîderê muxalefeta li Meclisa Neteweyî (8) – ji danezana 13ê gulanê bi yekdengîyê hatî qebûl kirin, hatin rakirin. Vê danezanê "*çalakîya yekalî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê*" û herweha êrişên bi balefirên bê mirov ên amerîkî yên li mitiqeyên eşîrî jî şermezar kirin. Dîsa bi yekdengî parlemanê "*bawerîya xwe ya tam a bi hêzên parastina Pakistanê*" jî pirgêsinî kir. (9)

Li alîyê xwe, artêş serê xwe bêhtir bi eşkerekirina "*kampanya bêbextîyê ya li dijî Pakistanê hatî dest pê kirin*" diêşîne û ne bi bûna serokê ***El-Qaîdeyê*** li bajarekî garnîzon lê. Şefê ***ISI***yê pêşniyar kir ku îstîfa bike, lê belê ne li gor serokdewlet, ne li gor serokwezîr û ne jî li gor parlemanê hewcedarî bi îstîfaya wî hebû. Bi her halî, jixwe mumkin e di demeke kurt de kesekî din ji bo şûna wî bigire were wezîfedar kirin; lewra ew jixwe di dema dirêjkirina wezîfeyê ya îstîsnayî de ye. Komîsyona Lêpirsînê ya Serbixwe bi xwe ya ku prensîpa wê hat dazanîn, hê nehatiya saz kirin û erka wê jî hê nehatiye diyar kirin.

AYŞE KAZCI: **Bênav II**, kolaj, rengê pîgment li ser tûwalê, 80 x 100 cm

Em dikarin şik û gumanê ji asta berfirehîya hêz û erka wê bibin. Hin kesên niyetxirab xwe jê nahêlin û bi bîr dixin ku lêpirsînên berîya niha yên li ser kuştina serokwezîr **Liaquat Elî Xan** di 1951ê de û ya li ser kuştina **Benazir Bhutto** di 2007ê de tu encam nedabûn.
Tu kes li vir xwe naxapîne: Armanca van helwêstan berîya her tiştî li hemberî pirsên acizker û rexneyên ji derveyî welêt, xurtkirina "*rûmeta neteweyî*" ye. Birêveberê partîya sereke a muxalefetê ***PML-Nyê*** (ya ku li Pencabê hukûmet e û di hilbijartinên giştî yên sala 2008ê de ji 259 kursîyan 66 bi dest xistin) **Newaz Şerîf** bêguman bang kir ku xwezaya têkilîyên di navbera ***Îslamabad*** û ***Waşîngtonê*** de ji nû ve di ber çavan re werin derbas kirin, lê belê wî herweha xwest ku budceya artêş û rêxistinên îstixbaratê êdî li parlemanê were nîqaş kirin. Bi ser de jî wî bi bîr xist ku ne karê rêxistinên îstixbaratê ye, belê yê hukûmetê ye ku siyaseta derve ya welêt diyar bike. **Şerîfê** ku darbeyeke eskerî ew ji desthilatê dûr kirî, bi vî rengî pozîsyona xwe diyar dike. Eskerên ku rewşa wan bi taybetî hessas xuya dike bixwe, ji wan hat ku antî-amerîkanîzma li welêt xwedî giranî, ji bo berjewendîyên xwe bi kar bînin, hetta di nav beşeke artêşê de jî.

## Du qadên lîstika kişikê yên amerîkî

Wekî din ji bilî **Panetta** birêveberên amerîkî bi baldarî tevgerîyan da ku çarçoveya axaftinên xwe diyar bikin. Serokê DYAyê **Barack Obama** bi tenê behsa "şebeke"yan kir ku mumkin bû alîkarîya **Bin Ladîn** bikin û guman yan jî gunehbarîyên xwe hîç dest nîşan nekirin. Ew baş dizane ku wê bi hilbijartîyên komarxwaz, lê her weha yên demokrat –ku di nav wan de seroka Komîteya Îstixbaratê li Senatoyê **Dianne Feinstein** jî heye– re bê pêşberî hev; ev hilbijartî dixwazin fonên pir mezin ên didin Pakistanê (ji dehsalan û vir ve 20 milyar dolar, û gelek milyar dolar ji bo budceya bê jî tên pêş dîtin) bên qut kirin. Lê belê têkilîyên zehmet ên amerîkanî-pakistanî li ser du qadên lîstika kişikê pahn dibin ku ji bo dîplomasîya wê diyarker in: Dîplomasîya amerîkî nikare ne têkilîyên xwe bi tevahî bi ***Pakistan***ê re qut bike, ne jî ewle be ku bikaribe bawerîyê pê bîne.

Qada yekem a kişikê bêguman ya ***Afganistan*** û ***Pakistanê*** ye. Ji konferansa ***London***ê ya çileyê 2010ê û vir ve, fikra lihevhatina neteweyî ya ku ji alîyê serokdewletê afgan **Hamîd Karzaî** ve hatibû dest pê kirin, ji alîyê *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê* û hevgirên wê ve hat pêk anîn. Armanca zêdekirina hejmara eskerên amerîkî ya ku **Obama** biryara wê da, zexta li ser talîbanan e. Di heman demê de, wezîra karê derve **Hillary Clintonê** jî di sibata 2011ê de eşkere diyar kir ku sê xalên kilît ên hevdîtineke muhtemel a bi serhildêran re, ne şertên pêş ... belê armanc pêk dianîn: "*divê ew dev ji şidetê berdin, dev ji hevgirtina xwe ya bi **El-Qaîdeyê** re berdin û rêzê ji destûra bingehîn a afgan re bigirin. Ev in encamên ku ji her şêwaz hevdîtinê tên hêvî kirin.*" (10) Piştî kuştina **Bin Ladîn,** xala navendî di cîh de hat dugêsinî kirin: "*peyama em didin talîbanan weke xwe dimîne, belê bi dengvedaneke ku îro taybet e: Hûn nikarin li benda çûna me bimînin. Hûn nikarin me têk bibin. Lê belê hûn dikarin biryarê bidin ku dev ji **El-Qaîdeyê** berdin û tevlî pêvajoyeke siyasî ya pasîfîk bibin.*" (11)

Ev navend û dilê stratejîya dij-serhildêrîyê ye ku general **David Petraeus** pêşî li *Iraqê* û paşê li *Afganistan*ê da dest pê kirin; ew li Afganistanê hêzên *NATO*yê bi rê ve dibe (berîya ku di demeke nêz de bibe serokê CIAyê): Serhildêrên ku alîgirên bernameyeke neteweyî ne, ji terorîstên navneteweyî qut bikin. Weke prensîp, jiholêrakirina şefê ***El-Qaîdeyê*** yê bûyî weke markeyekê, divê hin tiştan hêsantir bike. Êdî divê bê zanîn ka tansîyona amerîkanî-pakistanî ya piştî operasyona 2yê gulanê wê li ber beşa duyem bibe asteng yan na: Zext li rêxistinên pakistanî bê kirin da ku tesîrê li talîbanên afganî bikin.

Lêkolînekê sala 2010ê nezelalîya têkilîyên di navbera talîbanan û parêzvanên wan ên pakistanî de derxist pêş: (12) Têkilîyên berfireh, –nûnerên ISIyê tevlî civînên Konseya Talîbanên afganî bûne, ya ku li ser erdê Pakistanê pêk hatiye– lê belê herweha ji bo hin fermandarên talîbanan ên ku ji hegemonîya *Îslamadê* 'of û zivêr bûne', têkilîyên zêde cih digirin. *Îslamabad* qet xwe jê venade ku alîyên pê re diaxive manîpule bike: Bîst rojan piştî konferansa *Londonê* ya çileya 2010ê ISIyê li *Karaçiyê* molla **Abdul Xenî Baradar** girt. **Baradar** weke kesê herî girîng ê duyemîn ê talîbanan tê nasîn û ketibû nav pêwendîyên neyekser ên bi **Kabîlê** re. Peyam zelal bû: Qet ne mewzûbehs e ku yekser di ser Pakistanê re were qevaztin û têkilî werin danîn, di serdemekê de ku xuya ye sala 2014ê (yan jî derengtir) li *Afganistan*ê serdema piştî *NATO*yê tê amade kirin.
Ji bo stratejîstên pakistanî armanca sereke ew e ku bandora welatê xwe li Afganistana siberojê misoger bikin. Li gor senaryoyeke bi vî rengî divê ***Peştû*** (% 40 serjimara ***Afganistan***ê pêktînin) ji nû ve li welêt hakim bin û têkilîyên bi talîbanan re di ser tevna **Heqqanî** û **Gulbeddîn Hekmatyar** (eskerê kal ê cîhada dij-sovyet) re têra xwe saxlem bin, da ku îdîayên heq ên li ser erdên ***Peştû*** ên li ***Pakistanê*** gur nebin.

Xwedîbandorbûna li *Afganistana* siberojê di heman demê de li wir bisînorkirina giranîya *Hindistanê* ye. Bi bipêşxistina pêwendîyên xwe yên bi Karzaî re û bi ji mêj ve destekkirina *Hevgirtina Bakur*, ji 2002yê ve destketîyên *Hindistanê* çêbûn. Wê bernameyên pêşxistina aborî û civakî pêk anîn û giranîya xwe da ser avahîsazîyên xwedî maneyên mezin ên sembolîk (avakirina avahîya parlemana afgan), binesazîyên stratejîk (riya ber bi Îranê ve û ji bilî ya Pakistanê, pêşniyazkirina rêyeke din a digihêje deryayê) û perwerdekirina elîtan (bûrsên ji bo xwendekarên afgan li zanîngehên Hindistanê). Deh rojan piştî kuştina **Bin Ladîn**, di serdana xwe ya li

www.kurdiskulturen.org

# Şerê di nav îslamê de

**Kabîlê** de serokwezîrê Hindistanê **Manmohan Singh** da zanîn ku ew ê alîkarîya xwe zêde bikin (ji deh salan û vir ve bêhtirî milyarek û nîv dolar). *Delhîya Nû* êdî xwe li gor prensîpa lihevhatina neteweyî sererast dike, ji hingê ve ew siyaseteke "*bê destwerdan û zorlêkirinê* (…) *ber bi Afgxanîstaneke serbixwe û biîstîqrar ve dibe, ku bi cîranên xwe re lihevhatî ye*" dişopîne. (13) Navê Pakistanê nehatiye bi lêv kirin, lê belê herkes di peyamê digihêje. Ev yek dîsa jî pêşîyê li Hindistanê nagire ku dîyaloga berîya demeke kurt ji nû ve destpêkirî ya bi Îslamadê re dewam bike.

Bi vî awayî, qada kişikê ya afgano-pakistanî (ji bo Waşîngton û aktorên din ên pêywendîdar) li ser qadeke duyem a kişikê xwe nîşan dide, ku ji ya pêşî bi gelekî firehtir e: Li ser qada Asyaya bi pêş dikeve. Du mentiqên mezin di nav vê ketinanavhevê de tên cem hev. Mentiqê şerê li dijî terorîzmê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di nav herîya afgano-pakistanî de asê kiriye. Waşîngton dixwaze ji nav vê herîyê bi şert û mercên bi rûmet û anor de derkeve. Lê belê ev armanc li ser wê ferz dike ku têkilîyên xwe yên bi *Îslamadê* re qut neke. *Konsepta AfPakê* (14) êdî di axaftinên fermî yên amerîkî de nayê bi kar anîn, lê belê ew hê jî konsepteke di cîh de ye: Ew Pakistanekê digire nav xwe; weha xuya dike ku her diçe bêhtir hem beşeke çareserîyê û hem jî beşeke pirsgirêkê pêk tîne. Dîsa jî rewşa hundirê welêt pir endîşeyan bi mirovî re çêdike. Tu tişt nîne ku misoger bike ku desthilata îcraker û çîna siyasî wê karibin paradîgmayeke nû ya stratejîk li ser eskeran ferz bikin. Ev paradîgma kêmtir pirsgirêkan diafirîne û ji bo xêrûberên tên payîn ên normalbûneke herêmî, bêhtir bi kêr tê, heman paradîgma ji kozên cografî yên welatekî hem hîmalayî û hem jî deryayî sûdê werdigire, ew welatê ku hem di navbera qutbên enerjîyê yên *Rojhilata Nêzîk* û *Asya Navîn* de ye û hem jî di navbera du hêzên bi pêş dikevin, *Çîn* û *Hindistanê* de ye.

Mentiqê duyemîn ê ku ji bo *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê* diyarker e, xwe dispêre hêzdarbûna Asyayê ya ku dînamîzmeke aborî û vebûneke li tevnên global ên bazirganîyê, fînansê û enerjîyê rê li ber vekir: Antîteza alozîyên jeopolîtîk û krîzên navxweyî yên ku ***AfPakê*** li nav hev dixin. Li wir siberoj tê diyar kirin. *Qesra Spî* divê bi berjewendîyên nakok wê pêk bîne. Li ser vê qada kişikê, nabe ku ew hesaban ji pîyonê hindistanî neke da ku Çînê asteng bike. Lê belê li ***AfPakê***, *Pakistan* li ser pirsgirêka *Keşmîrê* qerisî dimîne û fikara wê ew e ku *Hindistanê* ji tevahîya karûbarên afgan dûr bixe. Waşîngton wê karibe heta bi ku li gor vê yekê tevbigere, xwe eyar bike? Hemin, amadekarîyên hevdîtinan bi aktorên afgan re wê bêyî tevlîbûna *Delhîya Nû* pêk werin: Konseya Bilind a Aştîyê a Nav-Afgan, hevdîtinên sêalî pêk tîne û ev sê alî jî *Afganistan, Pakistan* û *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê* ne, û sibe dusibe jî bêguman nûnerîya talîbanan a li *Kendavê*. Lê belê ew dem wê bê ku pêşketin –heke hebin– ji alîyê konferanseke navneteweyî ve werin misoger kirin; di nav vê konferansê de divê ji bilî aktorên mezin ên navneteweyî herweha tevahîya cîranên *Afganistanê* yên yekser yan jî yên nêzîk hebin, ku di nav wan de *Îran, Hindistan* û *Çîn* jî hene.

Ji 2yê gulanê ve Çîn dengê xwe nake. *Pekînê* kuştina **Bin Ladîn** silav kir, lê bêyî dudilî pişta Pakistanê girt, hem jî desteka Pakistanê dayî şerê li dijî terorîzmê teqdîr kir, ew şerê "*ku li gor şert û mercên neteweyî* [yên xwe bi xwe] *bi rê ve dibe*". (15) Ji bo hin analîstên pakistanî dostanîya Çîna xurt destûrê dide ku siyaseta derve di ber çavan re derbas bikin: Pakistan divê navika xwe ya bi Amerîkayê ve girêdayî bibire û ji vê jî wêdetir koza xwe ya çînî û heta ya rûs bi kar bîne. Serokdewlet **Zardarî** yê ku 11ê gulanê di çarçoveya serdaneke fermî de li ***Moskova***yê bû, fikra gihiştina "deryayên germ" îfade kir, ku xewna kevin a çaran bû. Hefteyekê paşê serokwezîr **Yûsûf Şah Gîlanî** li Çînê bû. Çîn welatê herî zêde sîlehan difiroşe Pakistanê ye. Pekîna ku berjewendîyên wê yên aborî (yên zêde dibin) li Afganistan û Pakistanê û herweha li Asya Navîn û Rojhilata Nêzîk hene, soz da Pakistanê ku wê di demeke kurt de pêncî balefirên şer yên bêqisûrkirî yên tîpa ***JF-17*** bidiyê.

## Operasyonên bi hev re

Roja berîya biçe Pekînê, ango 16ê gulanê **Gîlanî** li Îslamabadê senatorê amerîkî **John Kerry** li xwe kir mêvan. Danezana hevpar îşaret bi girîngîya "*berjewendîyên neteweyî*" ya alîyan kir û daxwaza Pakistanê ya "*nûkirina hevkarîya tam a bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re*" nîşan da. Ya rastî, li pişt perdeya van alozîyên darîçav, dîyaloga dualî bi tevahîya leza xwe dewam dike. Di heman demê de wezîrê parastinê yê amerîkî **Robert Gates** da zanîn ku "*tu delîl nînin*" îşaret bi hebûna lihevhatineke bi dizî ya di navbera pakistanîyên payebilind û **Bin Ladîn** de bike. (16) Piştî sê rojan, nûnerê **Obama**yî yê ji bo *AfPakê* **Marc Grossman** ji bo amadekirina serdana **Clintonê** li Îslamadê bû, di heman demê de zilamê duyemîn ê CIAyê **Michael Morell** tevî ISIyê şertên operasyonên bi hev re yên paşerojê diyar dikirin.

Ango lîstika mezin dewam dike. Li ser kapasîteya hêzên siyasî yên pakistanî derbarê guherandina parametreyên ji alîyê fermandarîya giştî ve diyarkirî de, şik û guman hene. Fermandarîya giştî bi xwe karîbû careke din bi bahozê re rûbirû bimîne, beyî ku hêza xwe ji dest bide.

* Birêveberê lêkolînê li Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanistî (CNRS), li Navenda Lêkolîna Hindistan û Başûrê Asyayê ya Dibistana Lêkolînên Asta Bilind ên Zanistên Civakî (EHESS). Berhema wî ya dawî hat weşandin: "Géopolitique du Pakistan [Jeopolîtîka Pakistanê]", *Hérodote,* hejmar 139, 2010.

Tîrmeha 2007ê –artêşa ***Pakistan***ê êrişê dibe ser ***Mizgefta Sor*** a li ***Îslamadê*** ku stara îslamîstên întegrîst (hişkbawer) e. Çend meh piştre li herêmên eşîrî *"Tevgereke Talîbanan a Pakistanî"* kom bû. Siyaseta nezelal û nakok a serokdewletê hingê general **Pervez Muşeref** ê ku hedefa êrişên ji 2003yê û pêde bû, kir ku beşeke ji milîsên îslamîst ên ku ji alîyê rêxistinên taybet ên artêşê ve dihatin bi kar anîn, bibin dijbera desthilatdarîyê. Hin milîs redkirina wî ya fermî ya cîhadê qebûl dikin, ji ber ku komên qedexekirî dikarin di bin navên din de dîsa xwe saz bikin. Hinên din li ber dewletekê radibin ku ji 2004ê ve bi ***Hindistan***ê re dîyalogê dike û di nav "şerê li dijî terorê" de cihê xwe digire ku ***Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê*** ji 2001ê ve li ***Afganistan***ê bi rê ve dibe. Rejîmê gelek rayedarên payebilind ên ***El-Qaîdeyê*** dan dest amerîkîyan –lê ne şefên wê.-

Pakistan her diçe girantir berdêla stratejîya xwe ya bikaranîna komên îslamîst ên çekdar dide. Di xizmeta siyaseteke herêmî ya pir çalak de, wê di nav sîh salan de yan bixwe ev kom ava kirin, yan jî ew bi rê ve birin: ***Mucahidînên*** afganî ên dij-sovyet, serhildêrên ***keşmîrî*** yên koma ***Hizb ul Mucahidîn***; cîhadîstên pakistanî yên ***Leşkerê Taîba*** yên ketin ***Keşmîrê*** û li bajarên hindistanê êrişên terorîstî pêk tînin; talîbanên li medreseyan perwerdekirî ji bo ji nû ve kontrolkirina Afganistanê.

Demeke dirêj, şerê di nav Îslama pakistanî de *"şer û pevçûnên mezhebî"* ji nû ve derxistin pêş: Di salên 2000ê de tundrewên sunnî yên ***Leşkerê Cihagivî*** û yên ***Sîpahê Sahîba Pakistanê*** êrişên xwe zêdetir birin ser îbadetgehên şîiyan yên ku li gor hinan piştî şoreşa îranî ya sala 1979ê alîkarîya pereyan ji ayetullahan distand. Di nêz de dewreke nû wê çerxa xwe bigerîne. Radîkalbûna sunnî ya demeke dirêj ji ber armancên stratejîk musamehe nîşanî wê hat dayîn, mijûmorana tundrew û şervanên wê bi kêrî siyaseta desthilatdarîyê ya ber bi ***Hindistan*** û ***Afganistan***ê dihatin. Ev radîkalbûn êdî qismî ji kontrolê derket: Sala 2009ê eskeran şerê serhildanên li herêmên eşîrî û yên li ***Swatê*** kir û ji hingê ve bi pêlên êrişên xwekuj li bajarên mezin her sal bi hezaran mirov tên kuştin.

## Tebeqeyên navîn kuştina waliyê Pencabê pîroz dikin

Qonaxeke din tê derbas kirin, dema ku şerekî di nav sunnîtîya piranî bi xwe de, li şerê di navbera sunnî û şîiyan de zêde bû. Ev parçebûn li alîyekî ekstremîstên ultra yên îdeolojîya *dewbendî* a nêzî *wehabîtîya suûdî* ya ku general-serokdewlet **Muhemmed Ziya ul Heq** di salên 1980yê de piştgirîya wê dikir (1), li alîyê din îslama gelêrî û "durehîtîyên" wê tîne dijberî hev –ev "durehîtî" îslameke ku di encama têkilîya sedsalan de weke ku "bi nexweşîya" *hîndûtîyê* ketibe tê dîtin, îslameke sûfî ya ku li ser ***xas*** û ***qelenderan*** stranan dibêje û li ziyaretên wan duayan dike.

Bi vê çanda şiddetê ya ku terorîzma ***El-Qaîdeyê*** wê azad dike û radîkaltîya talîbanên pakistanî, ev ziyaret vediguherin hedefên êrişan: ***Data Darbar*** li Lahorê, yek ji cihên pîroz ên herî girîng ên ***Pakistan***ê (di tîrmeha 2010ê de 45 kuştî), ziyareta **Baba Ferîd** li ***Pencabê*** (di çirîya pêşîn de 6 kuştî), êrîşeke din li ***Dera Xazî Xan*** nêzî mintiqeyên eşîrî (di nîsana 2011ê de 41 kuştî) û hê gelekên din.

Û di dawîyê de qonaxa dawî: Qanûna ku kufrîyê ceza dike ya ku ji qanûna ceza ya ***Hindistana brîtanî*** ya sala 1860ê hatiye girtin, lê belê misêwa girantir bû heta ku bi cezayên sala 1986 û 1991ê gihişte îdamê. Bêyî ku bi rastî were pêk anîn, ev qanûn gelek caran hate îstîsmar kirin. Bûyera ku hat medyatîzekirin a xirîstîyana sala 2010ê cezayê girtîgehê lê hatî birîn a bi navê ***Asia Bibi*** (2) bû. Vê bûyerê kir ku reformatorên pakistanî ji bo betalkirina vê qanûnê bangê bikin –di nav wan de walîyê ***Pencab***ê **Seman Tasîr** û yekane wezîrê xirîstîyan yê hukumetê **Şabaz Bhattî** jî hebûn, ku bi dorê yek di çile yê din jî di adara 2011ê de hatin kuştin. Kujerê **Tasîr** parêzvanê wî yê şexsî bû. Piştî demeke kurt ji alîyê gelek bawermendên çîna navîn ve wê bihata pîroz kirin; ev endamên çîna navîn weha xuya ye ku di fedakarîyeke tundrew û nemusamahekar de wan nîşanan dibîne ku di nîzama civakî û siyasî de êdî nînin. Yên mewzûbehs êdî ne bi tenê ***dewbandî*** ne, belê herweha ***barelvî*** ango alîgirên sûfîzmê ne. Ji bo pakistanîyên lîberal qada gelemperîyê teng dibe, jê kêm dibe û di heman demê de hukûmet li ber radîkalan destên xwe bera ber xwe dide.

Pakistana ku di destpêkê de para bêhtir weke erdên soza wê ji wan re hatî dayîn ên misilmanên jêr-parzemîna ***Hindistan***ê hat danasîn, diviyabû bi awirê damezrênerê wê **Muhemmed Elî Cinnah** dewleteke demokratîk û musamahekar bûya. Îslam pir bi lez veguherî referansa damezrêner, biryara sala 1949ê ya ku li *Meclîsa Damezrêner* hat qebûl kirin weha dibêje: "*hukumranîya li ser tevahîya gerdûnê bi tenê xwedayê qadir e, yê ku desthilata xwe weke erk daye Dewleta Pakistanê*". Lê belê pirsa hê jî nezelal a têkilîya Îslam û netewe û korîtîya jeopolîtîk a ku destek da cîhada ji sînoran dibihure, bi xemsarî tovên *fitnê* reşandin, - şaşîyên xiraker yên kaosa ku civaka bawermendan hejand. (3) Şer hew bi tenê neteweyî ye, ew êdî êrişî netewe bi xwe dike. Îslama ku diviyabû welêt bike yek, dest bi parçekirina wî dike. Li ser vê mijarê jî divê paradîgma were guhertin.

J.-L.R.

1 Muhemmed Ziya-ul –Heq (1924-1988) fermandarê giştî yê artêşa bejî bû, di îlona 1978ê de bi darbeyeke eskerî bû desthilatdar. Îdeolojîya dewbendî ya pakistanî ya ku di salên 1880yê de li Hindistanê peyda bû, waezên îslameke li gor eslê xwe yê destpêkê didin ya ku ji bandorên çandî yên hindistanê hatiye pakij kirin; ev tevgera ku li Pakistanê ji ya li Hindistanê radîkaltir e, bi wehabîtîyê re kete yek cihokê. Cîhadîstên ji cîhana ereb hatî ji dema şerê dij-sovyetê yê li Afganistanê ve, ev wehabîtîya sedsala 18ê li Erebîstanê peyda bûyî li Pakistanê belav kirin

2 Ev jina ciwan piştî pevçûneke bi cîrana xwe re hate girtin

3 Gilles Kepel : *Fitna. La guerre au cœur de l'islam [Fitne. Şerê di nav Îslamê de]*, Gallimard, 2007

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

1 "General Kayani says militants' back broken (General Kayanî dibêje pişta milîtanan şkestiye)", *Dawn*, 23ê nîsana 2011ê

2 Ji ber vê berhemê hatiye girtin: Massimo Calabresi, "CIA Chief : Pakistan Would Have Jeopardized Operation (Şefê CIAyê: Pakistanê wê operasyon bixista tehlûkeyê", *Time*, 3yê gulana 2011ê, li ser malpera: swampland.time.com

3 Li Pakistanê herêmên eşîran li heft mintiqeyan hatine dabeş kirin

4 Editorial, "ISI's admission (qebûlkirina ISIyê)", *Daily Times*, Îslamabad, 15ê gulana 2001ê

5 Asi Ali Zardari, "Pakistan did its part (Pakistanê para xwe pêk anî)", *The Washington Post*, 3yê gulana 2011ê

6 Shahid Saeed, "Grab the Reins of Power (Girtina dest a hevsarên desthilatê)", *Dawn*, Karaçî, 5ê gulana 2011ê

7 Cyril Almeida, "The Emperors' Clothes (Cilûbergên împeretor)", *Dawn*, 6ê gulana 2011ê

8 Jane Perlez, "Denying Links to Militants, Pakistan's Spy Chief Denounces US Before Parliament (Înkarkirina pêwendîyên bi milîtanan re, Şefê ajanên Pakistanê li pêşberî parlemanê DYA derew derxist)", *The New York Times*, 14ê gulana 2011ê

9 Biryara li ser çalakîya yekalî ya hêzên amerîkî ya 2yê gulanê; biryara 44ê, rûniştina hevpar a parlemanê, 14ê gulana 2011ê. http://www.na.gov.pk/resolutions.html

10 Hillary Clinton, Discours à la mémoire de Richard Holbrooke (axaftinên ji bo bibîranîna Richard Holbrooke), Asia Society, New York, 18ê sibata 2011ê

11 Hillary Clinton, "Remarks on the Killing of Usama bin Ladin (notên li ser kuştina Osama bin Ladîn)", danezana wezareta karê derve, 2yê gulana 2011ê, www.state.gov

12 Matt Waldman : *The Sun in the Sky. The Relationship between Pakistan's ISI and Afghan Insurgents (Roja li ezmanan. Têkilîya di navbera ISIya Pakistanê û serhildêrên Afgan de)*, Crisis States Research Centre, London School of Economics, hezîrana 2010ê

13 Axaftina serokwezîrê Hindistanê di parlemana afgan de, Kabîl, 13ê gulana 2011ê

14 Li gor konsepta AfPak a ku ji alîyê Richard Holbrooke ve sala 2008 hat populerkirin, Afganîstan û Pakistan divê weke *yek* qada *bi tenê* ya şer werin dîtin. Piştî liberrabûna Îslamadê, rayedarên amerîkî vê peyvê êdî hema hema hîç bi kar nayînin

15 Jiang Yu, berdevkê wezareta karên derve, "China urges the world to back Pakistan in terror fight (Çînê bang li dinyayê kir da ku pişta Pakistanê di şerê li dijî terorê de bigire)". *Dawn,* 5ê gulana 2011ê

16 "Gates Says No Sign That Top Pakistanis Knew of Bin Laden (Gates got, tu nîşan nînin ku îşaret pê bikin ku haya rayedarên payebilind ên Pakistanî ji Bin Ladîn hebû)", *The New York Times,* 18ê gulana 2011ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

KUŞTINA ROJNAMEGEREKÎ...

# Rojnameger Syed Saleem Shahzad

WENDY KRISTIANASEN

Termê Syed Saleem Shahzad, ku bi awayekî rêk û pêk ji *Le Monde diplomatique* re dinivîsî, piştî du rojan ku ew li Îslamabadê bê serûşûn bûbû hat dîtin. Sê roj berîya wê birêz Shahzad di rojnameya *Asia Times* de gotarek li ser hevkarîyeke pêkan a navbera al-Qaîde û artêşa Pakistanê weşandibû. (1) Shahbaz roja yekşemê êvarê piştî ku ji nivîsgeha xwe derketibû daku di bernameyeke televîzyonê de beşdar bibe hatibû bê serûşûn kirin. Qirar bû ku wî di wê bernameyê de sebaret bi rapora dawîn a Rêxistina Çavdêrîya Mafên Mirovan (Human Rights Watch) nihêrînên xwe par ve bikirana.

Roja 1ê hezîranê rojnameya *The Independent* ev bûyer weha bi vê serenavê ''Rojnemagerê ku derdiket pêş ji alîyê muxaberata Pakistanî ve hat kuştin'' (2) ragihand:

"Şeva çûyîn, piştî ku termê rojnamegerê ku bal kişandibû ser têkilîyên angaştkirî yên navbera al-Qaîde û artêşa welêt, du roj piştî wendabûna wî ya li Îslamabadê hate dîtin, pêla êrîşeke hovane û kerbeke mezin Pakistanê hejand. Weha dîyar dibû ku li wî êşkence hatibû kirin û heta mirinê hatibû lê dan û termê wî avêtibûn ser zivilan."

"Çalakvanên mafên mirovan, ku Pakistanê wekî yek ji xeternaktirîn welatan ji bo rojnamegeran bi nav dikin, diyar kirin ku tê bawer kirin ku Syed Saleem Shahzadê 40 salî yê nûçegihanê Asia Times Online piştî weşandina gotareke sebaret bi êrîşeke serbazî ya li dij binkeyeke artêşa deryayî, ku di van demên dawî de pêk hatibû, ji alîyê rêxistinên îstîxbarê ve hatiye revandin. Birêz Shahbaz, ku berê jî ji alîyê Rêxistina Zanyarîya nav Servîsan-InterServices Intelligence (ISI) îfadeya wî hatibû girtin, derbarê êrîşeke pêkan a li dij xwe de karbidest hişyar kiribûn û her weha gefxwarina herî dawî jî aşkere kiribû."

Shahzad digel sê zarokên xwe yên piçûk û jina xwe li Îslamabadê dijîya. Di sermaweza 2006ê de ew û wergêrê wî ji alîyê Talibanê ve hatibûn "mêvan" kirin. Vê yekê ew derfet dabû wî ku birêveçûna navxweyî ya rêxistinên îslamî bi xwe bibîne.

Shahzad fermandarên sereke yên al-Qaîde û Talibanê nas kiribûn û bi wan re hevpeyvîn encam dabûn, ku di nav wan kesan de Sirajuddin Haqqani (fermandarê hêrî bi hêz ê Talibanê yê li Afganistanê), Qari Ziaur Rahman (fermandarê hêrêma Hîndu Kush a al-Qaîde/Talibanê) û Şêx Essa (rêberê Takfîrî yê al-Qaîdeyê ku li Wezîristanê dijî) (3) jî hebûn. Ji ber ku Shahzad karibû xwe bigihîne gelek kesên weha girîn wî karibû ku raman û mijarên a'melî yên al-Qaîde û Talibanê ji nav wan de çavdêrîyê bike.

1 Al-Qaeda had warned of Pakistan strike" ("Al-Qaîdeyê sebaret bi êrîşa li dij Pakistanê hişyarî da), 27ê gulana 2011ê

2 "Leading journalist 'murdered by Pakistani security service'"

3 Takfîrî: kesê li hember xwedê kufurbûyî

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

www.arsivalkurd.org

SÎH SALAN PIŞTÎ ŞER

# Dewletên Yekbûyî vedigere Vîetnamê?

XAVIER MONHÉARD *

Rapora veşartî ya bi navê "Têkilîyên Dewletên Yekbûyî bi Vîetnamê re, 1945-1967" ya ku derewên hikûmetên amerîkî li ser angajmana wan a di şer de eşkere kirin, êdî li raya giştî vekirî ye. Li aliyê xwe Hanoyê jî ev rûpel quliband û girt. Ya ji vê jî baştir, havîna bihurî tetbîqatên eskerî yên hevpar li cihê ku Glyên pêşî lê ketin ser erda Vîetnamê, pêk hatin...

Başûrê Vietnamê, nîv girava ***Cam Ranh***ê. Ba ava deryayê ya Çîna Başûr radike, ku li vir bi kurtayi jê re tê gotin "*Derya Başûr*". Rêyeke teng û fetlanokî ya bi têlên strî tengijandî, ta balafirgeha ku ji alî leşkerên amerîkî ve di dema herba Vietnamê de hatibû çêkirin. Qereqolên leşkerî, pircaran kesên qerase, ku zimanek hişk bikar tînin. Leşker û gumrukçîyên tembel û zexel. Li bendera leşkerî, mêvan ne-bi-xêr-hatin, ê bi rastî çi karê wan heye li van derana? Ev serê çend salan e, ev peravên ***Cam Ranhê*** vala ne.

Ev zexelî û gendelî dê biqede: di 31ê meha çirîya pêşîn 2010ê de, serokwezîr **Nguyen Tan Dung** da zanîn ku; ev cîh, ji nuha û pê ve dê mêvandarîyê ji keştîyên mezin yên hemû dinyayê re bike. Ji 2003ê û vir de nêzî deh keştîyên wan yên herbê hatin di vir re, di peravên dijminê kevn re derbasbûn. Bê çek û bê bagaj vê carê zarokên Apê Sam careke din, bi eşkere vegerîyan welatê **Apê Ho**, vê carê wek mêvanên bi qîmet, wek ku van salên şer yên ku ji alî pênc mazûvanên Qesra spî (1) ve hatibûn meşandin, ji alî hafizeya Vietnamîyan ve bi temami hatibû jibîrkirin. Van 20 salên dijwar bi xwîn û kelem ku di sala 1975ê de bi destxistina **Saygonê** ve qedîyan, wer diyar e hatine jibîrkirin, her weha ev ejderha ji ber ku ji alîyê welatekî hûrik û cûce têk çûbû, xwe rezîl dihesiband û kîn û rik girtibû, ji ber wê jî ambargoyeke ticarî ta1994ê li dar xistibû û nedihîşt tu alîkarîyeke navneteweyî bigihîje vî welatê hûrik û cûce.

## Keştîya dij-torpîdoyan a bi navê "USS John S. McCain" li Da Nangê li ser rêya xwe radiweste

Meha tebaxê 2010, cara yekem ji bo parastinê, dan û standin di navbeyna Amerîka û Vietnamê de dest pê kir. Di vê mehê de dîsa komûtanên vietnamî li deryayê gav dipîvan, li qiraxên ***Da Nang,*** li cîhê ku leşkerên amerîkî di sala 1965ê êrîş dest pê kiribûn. Keştîya ***George Washington***, ku sembola fîloya heftan û yek ji yanzde "porte avion"ên herî mezin ya Hêza Hewayî ya Amerîkayê (DYA) bû, di vê gavê de jî ***John S. McCain*** benderên Vietnamî şildikirin. Navê McCain, ku namzetê komariyan yê hilbijartinên 2008ê li hember **Barack Obama**, ji guh re xerîb nayê. Pîlotê bombaker an jî "*qesasê herbê-, mêrkujê cengê"* ku ew li xwe mukir hat û got ji ber viya jî pênc sal û nîv li Vietnamê di girtîgehêde ma. Paşîyê ji bona zahmetîyên ku di girtîgehê de kişandibû xelat danê û li Amerîkayê ji alî raya giştî ve wek qehreman hate îlankirin. Bi xêra vî navî di sala 1995ê de, Serokkomar **William Clinton** dikarî têkilîyên normalkirina navbeyna herdû welatan bide destpêkirin û serhişkên muhafezekaran iqna bike. Bi dilpakî, vietnamî jî jê kêfxweş bûn. Di wê gavê de, li bajarê ***HO CHI MINH***... Wêneyên Clinton di yek ji xwaringeheke zencîrî yê gelek navdar de cih girtine. Nuha jî jina wî, wezîra karên derve **Hillary Clinton** bi vê rêya meşandî kêfxweşîya xwe diyar dike. *"Me fam kir ku em ne bi çavên dijminên kevin, lê dost û hevkarên nû li hev mêze bikin."* Hikûmeta **Obama** amade ye ku têkilîyên Amerîka (DYA) û Vîetnamê bimeşîne pêvajoyeke hîn bilindtir. (2)

Ji ***Hanoïyê*** mirov mêzeke, nêzikbûna li gel amerîkîyan, encama lojîka aborîyê ye. Ji dema ku peymanên bezirganî yên bi hev re ku ji sala 2000ê de berdewam e, dan û standin û guhertin bi awayekî rêk û pêk her bilind dibe. Di sala 2000ê de, digel ku ev hecim li dora milyar dolarekê bû, di sala 2010ê de ev hecim derbasî 18,324 milyarî bû. Seroka *Daîreya Bezirganî ya Amerîkî* li Vietnamê, **Jocelyn Tran** xanim, hesabê xwe ji bo sala 2020ê li ser 35 milyaran çêdike (3). Mêzîna bezirganîyê ji alîyê ***Hanoï*** ve her li qezencê, li karê ye, firotinên ber bi Amerîkayê (DYA) bi esasî ji tekstîl, pêlav û mobîlyayê pêk tê, ev hecim di sala 2010ê de gehiştibû 14,784 milyar dolaran, ev jî teqabulî ji pênca yekî zêdetir, îxracata derve ya tevayî dike. Ya herî girîng: van têkilîyên xurt yên bi ***Washingtonê*** re, alîkarîya entegrasyona temamî ya sîstema navneteweyî kir. Di çileya sala 2007ê de ***Vietnam*** bû welatê 150. a endama ***Rêxistina Cîhanê ya Bazirganîyê.*** Ji wê demê ve serê mirov salane hezar dolar (hasilata milî ya xeyrî-safî) zêdetir bû, li gor agahdarîyên ***Banka Cihanê*** ev jî teqabulî statuya welatên bi hatinîyên navincî dike.

Li hember destpêka vê qezencê, vê halbaşîyê, divê ku li ser sê milyon kuştî, xanîyên wêrankirî, malbatên parçekirî yê dema şer, rûpel bê qelibandin. Ji bo vê jî xebateke dûr û dirêj ku li ser raweste bê li dar xistin mecbûr dibe. *"Piştî salên 1990ê, lêkolînerên vîetnamî dest pê kirin qîmeta peryoda 1957-1975ê li hember ya 1941-1945ê kêm bikin, ev jî, ji alî dîrokzan **Wynn W. Gadkar-Wilcox** ve hatîye tespît kirin. Di vê peryodê de, **Amerîkayê** bi **Vietminh** re hevkarî kiribû û gelek endamên **OSS*** (**Office of Strategic Services**) *ku pêşengên **CIA*** (**Central Intelligence Agency**) *tê hesibandin, şexsî xwe bi **Ho Chi Minh** ve girêdabûn. Dîrokzan di vê gavê de sînorên xebata xwe berfireh dikirin...û wek mînak xebat û belgeyên **Robert Hopkins Miller** ji xwe re wek çavkanî hesab dikirin. Navê çavkanîyê: **Dewletên Yekbûyî û Vîetnam, 1787-1941**, **Pham Xanh** eşkere dikir ku bal û mêla serokkomarê amerîkî **Thomas Jefferson*** (1801-1809) *ji bo medrebên birinca (riza) başûrê Vîetnamê gelek mezin bû. Herweha gelek ziyaret û seferên amerîkî ji bo Vîetnamê di destpêka sedsala 19ê de hatin pêkanîn"* (4)

Nîvê gel, temenên wan ji 26 salan kêmtir in. Şer tiştekî dûr xuya ye û Amerîka hîn bêtir sempatîk xuya dike. Ev ji alîkî ve ji ber dolarê û ji alîyê din ve fantazma ji bo "Xewna Amerîkayê" yanî zengînî. Sêzdeh hezar xwendevan, ku ev li Asîya Başûr-Rojhilat rekor e, li Unîversiteyên "ji Pasifikê wirdetir bi cîh bûne.

## Peymana li ser amadekarîya enerjîya nukleer a sivîl

Başûrê Vîetnamê bi taybetî di warê bikaranîna dolarê de gelek pêşde ye. Di meha Oktobera 2010ê de, avahîya fabrîkayeke dêwasa ya ***Mîkroproses Intel*** ku li derveyî bajarê ***Ho Chi-Minh*** bi cîh e, bû semboleke bedew: ev sîte, ya berhevanîna û testkirina herî mezin ya cîhanê ye û qîmeta wê li der-dora milyarek dolarî ye. ***"We are back in Saigon!"*** *"Em ji nûve vegerîyan Saygonê!"* ji îlona 2009ê û virde, li ser blogek sîteya vê şîrketê mirov dikare vê hertim bixwîne...

Car heye dilxweşî û dilxemgînî bi hev re dimeşin, Amerîka Yekbûyî di her fersendê de xwe wek berevana mafên bingehîn dide nasîn. Di sala 2010ê de, bîst û çar kes hatin girtin, çardeh kesan jî ceza xwar, sebeb jî ew bû ku; van kesan ramanên cûda li hember yên Partîya Komunîst parastibûn. Gelek ji wan bloger û rojnamevan bûn. Sefîrê amerikî **Michael W. Michalek**, di 10ê meha 12an de, li ***Hanoî,*** di konferanseke çapemanîyê de bi awayekî nazik beyan dikir û digot, *"bi xemgînî dikarim bêjim ku di sê salên di wazîfa min de, pêşketinên di warê mafên mirovan de bi awayekî wek hev pêk nehatin"*. Li alîyê din, bi awakî teze tê bîr anîn ku alîkarîya Amerikayê ji bo welatên **Ewropa Rojhelat** û *"şoreşên rengîn"* bawerîyê dişkîne û mirov dipirse: Gelo birêveberîya amerîkî, senaryoya alîkarîya "tevgereke pasîfîk" nake? Ku dikare bê maneya *rejîma Hanoyê û bi vî awayî nasname û çanda vietnamî ji holê rake.*

Lê ev bawerîyên çewt, îro wek bîranînên nefreteke kevn tê dîtin. Sala 2011ê, dikare tew bibe sala hevkarîya strtejîk ya di navbeyna her du welatan de. Peymana hevkarî ya nukleer a sîvîl hindik maye bête îmze kirin. Di vê peymanê de dan û standinên teknolojîk û pêşvebirinên kar û barên bingehîn, ev jî ji şîrketên amerîkî re derîyên bazarên nû û bi qezenc vedikin: Di bist salên pêşîya me de,vîetnamîyan dane ber xwe ku sêzdeh sentralên nukleer ava bikin ku kapasîteyên wan 16 000 MW derbas dike.

Di van peymanan de zengînkirina ûranyûmê ne qedexe ye ku bi eslê xwe ji bo programa nukleer ya leşkerî ye, ku amerîkî di halê normal de ji bo welatên din vê qedexe dikin û li ser wan zextê datînin ku vî mafê xwe bi kar neynin. Pisporên vî karî, van peymanên taybet û bi awantaj, bi yên ku di sala 2007ê de, bi ***Hindistan***ê re hatibûn çêkirin muqayese dikin. (5)

,

Analist **Brahma Chellaney** (6), serokê *"Centre for Policy Research de New Delhi,"* (Merkeza Lêkolînên Siyasî yê ji bo New Delhîyê), dibêje ku ev muqayese hinek mubalexe ye: *"Ji ber ku Hindistan ne endama ku peymana qedexekirina zenginîya Uranium (TNP) îmze kirine, ji ber vê jî li gor qanûna amerikîyan ji van mecbûrîyetên taybetî muaf e. Hukûmeta amerîkî, ji ber vê biryareke taybetî ji Kongreyê derbaskir. Lê rewşa Vîetnamê tiştekî din bû, wek endamê TNP, xwestineke bi vê cûreyê pêwist nîn bû, ji alîyê din ve ji ber ku Hindistan xwedîya çekên nukleer e, peyamanên bi hev re pêwist e bi awakî taybetî bên formule kirin."*

Di vê rewşê de, girîngî ne taybetmendîya peymana ye, lê hedefên pêşin *"**Amerîka** peymanên nukleer bi **Hindistan** û **Vîetnamê** re wek aleteke stratejîk û ji bo hevkarîyeke nêzîk bikar tîne"*. Ev e ramanên **Chellaney**. Ji ber vê, Vîetnam bi ihtimaleke mezin dê peymaneke baştir li gel welatên ku *"di warê nukleer de pêşde"* dikevin bi dest xe, li gel welatên ku nû programên nukleer yên sivil bikartînin. Tam tersê Emiratan, wek mînak: peymanên navbeyna Amerîka Yekbûyî û Erebên Emîratên Yekbûyî ku di sala 2009 de pêk hatibûn bi taybetî cîh dide devjêberdana mafên zengînkirina ûranîum a li ser axa xwe. Tam jî durûtî? Berdevkê hukumetê **Philip J. Crowley** bi kurtayî beyan dike ku *"Amerîka Yekbûyî, bazaran li gor şertan bi welat û herêman ve cûda cûda pêktîne"*. (7)

## "Rewşeke bi qasî lodeke hêkan nazik"

Li gor ***Washington***ê, qawetkirina têkilîyên leşkerî û hevkarîya nukleer xwedî hedefek e: Mezinbûna Amerikayê li Okyanûsa Pasifikê ji dest bernedin. Amerîka, tenê sala 2010ê, bi 6 hezar milyar dolaran çek firotin ***Taywan***ê; her weha têkilîyên xwe li gel hêzên taybetî yên *Endonezyayê*, "Kopassus" ve nû dikin, li gel ku beşdarî tevkuştina gelê ***Timor***ê û yên ***Papoazie*** bibûn; azadîya çûn û hatinê ya ***derya başûrê Çînê*** qedexe kiribûn, ev jî li ser navê "Berjewendîya Neteweyî ya Amerîkayê" dihat îfadekirin. Li gor madam **Clinton**; ku digel ***Koreya Başûr*** bi hev re operasyonên leşkerî li ***Derya Zer*** li dar xistin, da zanîn ku ger di navbeyna Çîn û Japonyayê de, ji ber giravên ***Diaoyu/Senkaku***, şerek dest pê bike dê alîkarîya Japonyayê bikin, ji ber ku di navbeyna wan de peymana du-alî ya parastinê heye. Piranîyên van tedbîran, ji bo ku nebêjin hemûyên wan, ji tirsa qawetbûna merhaleyek bilind ya Çînê tê: blindbûna Imparatorê Navîn, Çîn, bi awakî mekanîk qîmeta cîranên stratejîk yê cîranên Çînê li ber çavê Amerîka Yekbûyî mezintir dike.

Kovara ***"US Quadrennial Defense Review"*** ya 2010ê weha dibêje: ***Maleziya, Indoneziya*** û ***Vietnam*** hevkarên tam û potansiyel in di warê parastinê de. **Mr. Kurt Campbell**, alikarê sekreterê ***Asya şerqî û Pasifikê***, xwe bi awakî hîn bêtir eşkere dike û dibêje: *"Dema ku ez li dostên me yên Asya Başûr-Rojhelat mêze dikim, ez dikarim bi rehetî bibêjim ku perspektîf û musteqbela me ya herî xweş bi Vietnamê re ye."* (8) Ji bo amerîkîyan cardin dîyar e ku ev welat pîyonek e girîng e. Vê carê ne li hember komunîzmê lê li hember îhtimala berfirehbûn û mezinbûna Çînê ye.

Ev alaqa bê sînor deng dide. Ji sedsalan vir de, Vietnam di derdora girîneka Imparatora Navîn de digere û di yekdemê de dixwaze ji bala wî dûr be jî. Ji alîyê aborî bi awakî xurt pêve girêdayî ye, malên ji derva tên bi piranîya xwe ya mezin ji cîranê Bakur tê. Profesorê bi nav û deng yê universîteya ***Nouvelle-Galles*** li (Canberra Başûr), **Carlyle Thayer**, ku pisporê Vietnamê ye weha difikire: *"Derheqa Hanoî de, tu welat bi qasî Çînê hewqas ne bi tesîr e û ji xwe bawer nîne"*. (9) Di esasa xwe de, dîplomasîya Vietnamî, heta jê tê li welat û têkilîyên taybetî û berfirehî digere ku ji tesîra Çînê dûr bikeve, lê di eynê demê de, dixwaze bi Çînê re, cîranê xwe yê mezin têkilîyên xwe yên esasî û yên talî berdewam bike. Sefîrê berê **Dinh Hoang Thang** zahmetîyan înkar nake: *"Ger Vîetnam karibe Çînê îqna bike ku têkilîyên amerîkî û vîetnamî têkilîyên welatên din xera nakin, ev dê bibe serkeftineke mezin)."*

www.arsivakurdi.org

(10) Pratîka vê ji alî Amerîkayê ve jî hêsan nîne. **Brantly Womack,** profesorê têkilîyên navnetewî yê ***Unîversîteya Virginiayê*** û nivîskarê berhema -*Çîn û Vîetnam, siyaseta Asymetrîk*- (11) diyar dike ku: *"bi dûrketina Amerîkayê ya ji Asyayê û ji ber têkilîyên wan yên dubendî di navbeyna çi Çînê û çi Vîetnamê de, nefamkirinekê peyda dike û têkilîyan dike zorê".* Ji alîyê Çînîyan jî, tehdît carna xurt in: Rojnameya Gel, organa Partîya Komunîst a Çînê gotinên xwe venaşêre:*"Vîetnam, pêwist e bizanibe ku di navbeyna du hêzên mezin de,bi rewşa xwe ya xerab û hesas, lîstikeke bi rîsk dileyîze. Ger Çîn û Vîetnam bi çi sebebî dibe bila bibe bi rastî bi awayekî leşkerî bi hev kevin, tu hêz û balafirên tu welatî nikarîn ewlekarîya wan garantî bikin".* (12)

Di dawîya sedsala 20ê de, nelihevkirinek ji bo sinorên giravên bi navê ***Paracel û Spratleys*** di derya başûrê Çînê de peyda bû. (13) Bi vî halê ku qaweta xwe ya deryayî xurt kirîye jî, dîsa jî ***Hanoî*** nikare bi hêza deryayî ya ***Çînê*** re qayişê bikişîne. Lê belê, *"Vîetnam dixwaze ku zêdetir welatên din werin li deryaya **Çîna Başûr** angaje bibin, ev jî ji alîyê **Richard Bitzinger** ve, ku wek bisporê pirsên parastinê li **Asya Pasifik** tê nasîn hatîye gotin. Ev rewş, dikare parastina Vîetnamê qewî bike. Lê dîsa jî pêwistîya wî bi alîkarîyê heye da ku bikaribe kendava **Cam Ranh** û çûn û hatinên wê modernîze bike. Ez wisa difikirim ku **Hêza Deryayî ya Amerîkî** dê ji vî cihê stratejîk fêde bibîne, her weha hinekên din jî dikarin, lê tenê **Hêza Deryayî ya Çînî** dê li wir kêm be!"*

## Şerê sala 1979ê yê bi Pekînê re di nava dosyayan de wenda bû

Gelo, rojekê mirov dê karibe bibîne ku Amerîka li hember ***Imparatorê Navîn*** (Çîn) piştgirîya ***Vîetnamê*** bike? Îronî ew e ku ger mirov bîne bîra xwe, dema beyana serxwebûnê ya 2ê îlona 1945ê, Çîna **Mao Zedûng** welatê yekem bû ku ev komara ciwan ya demokratîk di zivistana sala 1950ê de nas kir, ***Yekîtîya Sovyet*** piştî dozdeh rojan Çînê taqîb kir... Bikare balansekê di navbeyna herdû welîyên xwe yên komunîst de peyda bike, ku paşê bûn dijberên hev, ne karekî hêsan bû. **Ho şî Mînh** û berdewamên wî ev yek bi qasî 25 salan bi awayekî ustadî meşandin. Alikarîya Sovyetê bi qedandina şerê sar dawî hat. Nelihevîyên navbeyna Vîetnam û Çînê, di dawîya salên 1970ê de bi eşkereyî dest pê kir, ev heta îro tabûya herî mezin ya sîyaseta derve ya Vîetnamê ye. Sî sal paşê jî îro ne hêsan e ku mirov zanibe bo çi şerê meha ***sibat û adara 1979ê*** dest pê kir û bi deh hezaran mirov hatin kuştin. Ne çapemanî û ne jî pirtûken dibistanan bahs dikin. Bi halekî fermî, îro bi ***Pekîn***ê re têkilî di mecrayeke baştir de dimeşin.

Tarix şanî da ku talûke, ji bo Vîetnamê, ku di nav hesabên jeopolîtîk yên navbeyna herdû cîranên bi hêz de heps bibe, kî dikare li **Hanoîyê** ji bîr bike? Dîplomat **Hoang Anh Tuan** nû beyan kir ku Vîetnam, *"belkî jî tenha welat e ku di dunyê de dest bi dan û stendinên dûr û dirêj bi Amerîka re kirîye... Digel ku bawerî û hevdûfêmkirin gelek pêşde çûbe jî, tu kes nikare ji ber nefamkirinên stratejîk û xeletîyan garantî bide ku her tişt ji nû ve xera nebe. Ji ber vê yekê, divê têkilîyên du welatan li ser wekhevîyê ava bibin, ji bo ku berdewam bin, ger ev têkilî bi ifadeya ku başîya herdû welatan, yanî ya Vîetnam û Amerîkayê bifikire hatibe dayîn dê herdayîm be û bi serkeve, bi şertê ku ne tenê fêda stratejîk ya Amerîkayê bifikire."* (14) Îşaret nuha başîyê şanî didin, lê despotîzma jeografîk (15) dikare her daîm qedera miletê Vîetnamê biguhere.

* Nûçevanê taybet yê LMd

1 Dwight Eisenhower (1954-1961), John Kennedy (1961-1963), Richard Nixon (1969-1974) û Gerald Ford (1974-1975)

2 Discours tenu à Hanoï le 21 juillet 2010 en marge d e la 43e rencontre ministérielle de l'Association des Nations de l'Asie du Sud-Est. *(Axaftina ku li Hanoîyê di 21ê Tirmeha 2010ê de bi munasebeta hevdîtinên Wezîran ya Yekîtîya Neteweyên Asya Başûr û Rojhelatê)*

3 *Tuoi Tre*, Hanoï, 20 décembre 2010

4 Wynn W. Gadkar-Wilcox, "An ambiguous relationship *(têkilîyek ecayîb)*: Impressions of the United States in Vietnamese historical scholarship, 1986-2009", *World History Connected*, vol. 7, n° 3, Washington, DC, oct. 2010

5 Lire Siddharth Varadarajan, " L'Inde éperdue de reconnaissance ", *Le Monde diplomatique*, novembre 2008. (Binêre; Siddharth Varadarajan, "*Hindistan kêfxweşî-serxweşîya jinûvenaskirî*")

6 Auteur d'*Asian Juggernaut. The Rise of China, India and Japan*, *(Bilindbûna Çîn, Hindistanê û Japonya)*, HarperCollins, New York, 2006

7 Cité dans Daniel Ten Kate and Nicole Gaouette, "US, Vietnam holds nuclear technology talks as suitors vie for contracts ", Bloomberg, 6 août 2010

8 Agence France-Presse, juillet 2010

9 Carlyle Thayer, " Vietnam's relations with China and the United States ", conférence donnée à l'Université des sciences sociales et humaines,Hanoi *(Têkilîyên Vietnam li gel Çîn û Amerîka Yekbûyî" konferansa Unîversîteya beşê ilmê sosyal û mirovî ya Hanoîyê*)10.12.2010

10 Entretien accordé à *VietNamNet* (publication électronique), *(Hevpeyvîn li gel Vietnam Net) (weşanên elekrinîk*) Hanoï, 17. 02. 2010

11 Cambridge University Press, New York, 2006. La citation provient de Brantly Womack, "The United States and Sino-Vietnamese relations", *(Axaftinên Brantly Womack, "Amerîka û dan û stendinên Çîn û Vietnamê) The Asia-Pacific Journal: Japan Focus* (publication électronique), 2008

12 Li Hongmei, "Vietnam advisable not to play with fire" *(Vietnam, nesîhet, bi agir neleyizin*), *People's Daily*, Pékin, 17 août 2010

13 Les Paracels sont occupés militairement par la Chine depuis janvier 1974, mais revendiqués par le Vietnam et Taïwan. La Chine, le Vietnam, la Malaisie, les Philippines et Taïwan occupent divers îlots des Spratleys (Brunei a émis des revendications mais sans envoi militaire). Pour une analyse des problèmes politiques et la recherche d'une issue,*(Giravên Paracels, ji alîyê Çînê ve ji zivistana 1974ê vir de hatîye dagirkirin, lê belê Vietnam û Taywan ji wir maf dixwazin. Vietnam, Malezya, Filipin û Taywan hinek giravên din dagirkirine li Spratleys. (Brunei heq dixwaze lê leşger naşîne). Ji bo analîzek çareserkirina pirsgrêkên sîyasî û lêkolîna peydakirina rêçekê*) *cf.* Stein Tønnesson, "China's coming change in the South China sea", *Harvard Asia Quarterly*, Cambridge (Massachussetts), décembre 2010

14 Hoang Anh Tuan, "Rapprochement between Vietnam and the United States: A response", *Contemporary Southeast Asia*, vol. 32, n° 3, Singapour, 2010

15 Carlyle Thayer, "The tyranny of geography: Vietnamese strategies to constrain China in the South China sea", International Studies Association, Montréal, mars 2011

Wergera ji fransî: Vehbî Aydin

AYŞE KAZCI: **Bênav**, çapa kevirî ya li ser kaxezê, 39 x 54 cm

# Li bin sîbera Çînê, dostaniyên Hindistanê

SAURAV JHA *

Tirsa ji hêza Çînê, Vîetnam û Hindistan kirin yek, Hindistan jî vê rewşê sûdê werdigire da ku xizmetên xwe yên eskerî û bazirganî pêşkêş bike.

*Aamaar naam tomaar naam – Vietnam Vietnam",* "Navê min, navê te –Vîetnam, Vîetnam!". Ev slogana ku dawîya salên 1960ê, nîvê salên 1970yê, bi zimanê bengalî dihate berz kirin, di heman demê de ji bo xwendekarên Kalkutayî banga çalakvanîyê bû da ku sedaqeta xwe bo xelkê Vîetnamê derbibirin û dijîtîya xwe ya li hember emperyalîzma Dewletên Yekgirtî nîşan bidin.

Îro, di çarçoveya heyî de, ku serdestîya mutleq a DYAyê ber bi xwarê ve diçe û hêzên serdest di nav çendîn bereyan de ji nû ve teşkîl dibin û herwiha li ser bingehê hevkarîyê her wekî li ser bingehê reqabetê, torên cihêreng têne bi rêk xistin, Hindistan û Vîetnam her du jî bêyî ku têkevine nav hevpeymanîyeke fermî, bere bere xwe nêzîkî DYAyê dikin.

Di heman demê de, her du dewletên navbirî dixebitin ku pêwendîyên xwe yên dualî baş û bi hêz bikin: Herçend girîngîya wan cuda be jî, van her du hêzan, ku xerîkî geşegirtina aborî ne, gelek berjewendîyên aborî û jeopolîtîk ên hevbeş hene.

Hindistanê bala xwe weke mînak daye ser sektora enerjîyê ya ***Vîetnam***ê, ku tê heye karîgereyeke xurt li aborîya wê bike. Gewre şirketên hindî yên enerjîyê, ku hertim li seranserê dinyayê li pey embarên nû ne, çav berdane ser rezervên gaza ***Vîetnam***ê yên li Behra Başûrê Çînê. Ji bo ***Hanoî***yê [paytextê Vîetnamê], veberhênanên şirketên hindî di warê teknolojî, rêvebirin û bazarkirinê de çavkanîya bisporîyê ne, ku bi xêra wan, ***Vîetnam*** mecbûr nabe bi rengekî qet'î muhtacî welatên rojavayî an jî ***Çîn***ê bibe. Herwiha, pirs û armanceke mezin a din ji bo ***Delhîya Nû*** (ku herwiha Hanoi jî pê re ye di vê yekê de) ew e ku nehêle ***Pekîn*** li Asyaya başûr-rojhilatî dest û desthelata xwe deyne ser tevahîya çavkanîyên mezin ên jêr-deryayî.

## Modernkirina artêşa deryayî

Berfirehbûna devera ku fîloya çînî lê çalak e –ku di vê çarçoveyê de li bendera ***Sanya***yê (Hainan) baregeheke deryayî ava kir– Vîetnamê mecbûr dike ku hêzên xwe yên leşkerî, bi taybetî hêzên xwe yên deryayî, nûjen bike. ***Hindistan*** di vî warî de hevkarîyê pêşniyar dike: Duristkirina keştîyên nû yên dabînkirina çekên êrişên deqîq, wek fuzeyên krûz ên supersonîk [fûzeyeke taybet] Brahmo, ku Çîn bi teknolojîya xwe ya îro nikare li dijî wan berevanîya xwe bike. Beramberî vê, fîloya hindî daxwazê dike ku bikaribe ji bo biserûberkirin û tehmîrkirina keştîyên xwe, bender û dezgehê duristkirin û tehmîrkirina keştîyan ya ***Vinashin***ê bi kar bîne.

## "Têkilîyên xwedî girîngîyeke pir zêde"

Vîetnamê herwiha qewareyeke mezin a techîzata leşkerî heye ku ji serdema ***Sovyet***an maye û dibe ku bixwaze ragirtin û nûjenkirina wê bispêre ***Hindistan***ê, lewre şarezatîya wan a di vê bareyê de ji ***Vîetnam***ê re aşkere ye. Herçend îro çekên ku ***Hanoi***yê heyamên dawî kirîne bi taybetî fabrîkasyona Rûsyayê bin jî; wek botên noqar yên ji cûreyê Kilo û tîp dîzel-elektrîk, ku hêj nû hatine daxwaz kirin, an jî firokeyên cengî yên Su-30. Dîsa jî tê heye ku Hindistana hevkar sibe bikare ji bo teqezkirina karîgerî û bikêrîya artêşa Vîetnamê, bi roleke diyarker rabe. Herwiha, hevpeymanîyên wiha digel çendîn welatên herêmê, bi taybetî digel ***Malezya***yê, firotina çekên rûsî li gelek bazarên girîng hêsan kiriye.

Şêwazeke din a alîkirina artêşa vîetnamê bo têketina sedsala 21ê ew e ku hêsankarîyê jê re bikin da ku tora îmkan û şîyanên pir-navendî yên berevanîyê rêk bixe, ku ev yek hingê çêdibe heke Hindistan îmkanên xwe yên endûstrîya înformatîk a pêşketî bixe xizmeta Vîetnamê. Jixwe wezîrê berevanîya Hindistanê **Arackaparambil Kurian Antony**, meha çirîya pêşîn, di seredaneke xwe de bal kêşa ser vê meseleyê û got: *"Hindistan girîngîyeke pir mezin dide pêwendîyên xwe yên digel Vîetnamê. Hazir e di warê teknîka înformasyonê û fêrkarîya îngilîzîyê de alî wê bike, herwiha ..."*

Heçî nûkleera sîvîl e, di vê babetê de jî Hindistan xwedana teknolojîyên girîng e ku Vîetnam jê bêpar e. Bo nimûne, reaktorên herî hûrik ên cîhanê, ku ji bo wan welatên tora wan a elektrîkê hêj berteng û bi kêmûkas e, destxweş û munasib in. Heke Vîetnam bixwaze ji çendîn hûrde-reaktorên wiha re meydanekê durist bike, hingê nakeve ber nerihetîyên kêşeya qutbûna elektrîkê li dû arizeyên teknîk an jî karûbarên ragirtin û tehmîrê, ku ev cûre qutbûn gelek zêde ne, gava toreke elektrîkê bi temamî girêdayî bi tenê reaktoreke xwedan-kapasîeteyeke mezin e.

Bi vî rengî, ji endazyarî heta elektrîkê û ji endûstrîya dermanan heta çandinî û karûbarên deryayî, hevkarîya di navbera her du welatan de geşe digire û danûstandinên ticarî beramber zêdetir dibin: Salên 2009-2010ê, ticareta wan digihe 2.36 milyar dolaran; pişka îxracata ***Hindistan***ê bo ***Vîetnam***ê muqabilî ji sedî 80yê vê ticaretê ye.

Çileya 2011ê, di civînekê de ku li ser pêwendîyên ticarî yên dualî li ***Kalkuta***yê pêk hatibû, sefîrê Vîetnamê yê li Hindistanê wiha got : *"Ez pê bawer im ku bi saya hewlên karsazên her du alîyan, pêwendîyên ticarî û veberhênan êdî her dê bihêztir bin û dê her bêtir geşe bigirin".* Herçend ev gotin di destpêkê de li ser pêwendîyên Vîetnamê digel wîlayeta ***Bengala Rojava*** û paytextê wê ***Kalkuta***yê bûn, di heman demê de jî sebaret bi rewşa pêwendîyên di rista her du welatan de derbirînek bûn. Diyar e pêwendîyên her du dewletan êdî hem di navbera aktorên taybet de toreke saxlem a danûstandinên aborî ye û hem jî girêdanên stratejîk ên neteweyî ne.

## Di gera li hêzeke dijber de

Digel vê hindê, halê hazir ev rêkeftinên Hindistanê digel Vîetnamê, bi tenê bersivek e ji bo doktirîna beramberîyê ya li hemberî Çînê. ***Pekîn***ê van heyamên dawîyê hêzên xwe yên leşkerî nûjen kirin û binesazî û techîzatên nû kêşa sertanserê sînorê Çîn-Hindistanê, ku vê yekê kozên meydanê girîngtir kirin. Herwiha, cîrana xwe li ser meseleya ***Keşmîr***ê nerihet kir, xwe nêzîkî ***Bîrmanî, Nepal, Bangladeş*** û ***Srî Lankayê*** kir, ku ev hemî ji Hindistanê veqetiyan e, û axirî "hevaltîya xwe ya qahîm" ya bi Pakistanê re hinek din saxlemtir kir. Hindistan bi yekcarî nerihet e ji têketina Çînê bo nav qadên hindek ji van dewletan, ji ber ku peyman û rêkeftinên wan li ser pêşxistina binesazîya benderan û firotina çekan e.

Pakistan berdewam mîsîlên çînî werdigire û xêrê ji teknolojîya nûkleer a Çînê dibîne. Bêguman haya ***Delhîya Nûyê*** ji van qewimînan heye. Hindek bisporên hindî, li dû têgihiştineke reqabetê, cextê lê dikin ku divê pêşniyara hilawistî ya dabînkirina mîsîlên balîstîk ên menzîlkurt (150 heta 350 kîlometre) ji cûreyê ***Prithvi***, bigihe netîceya xwe û rêkeftina vê yekê bê encam dan. Hindistan dikare bi rêya îstifadekirina ji jinûve vekirina baregeha hewayî-deryayî ya li kendava ***Cam Ranhê*** hizûra xwe ya daîmî li Behra Başûrê Çînê teqez bike. Ev yek vedigere ser şîyana Pekînê ku ***Delhîya Nû*** qanih bike ku ew projeyên benderan ên li ***Gwadara*** li Pakistanê, li ***Hambantota***ya li Srîlankayê bes hewl û kiryarên ticarî ne. Halê heyî, Hindistan divê qîma xwe bi rola palpiştîya ku Hanoi didiyê, bîne.

Nûjenbûna bilez a artêşa çînî û pêngava aborî ya girîng a vî welatî endîşeyan li ba cîranan peyda dike û dike ku şikê ji doktrîna wê ya "geşegirtina pasîfîk/aştîyane" bikin. Ji Hindistanê heta Vîetnamê di wir re heta Japonyayê, her yek xwe nezîkî DYAyê dike da ku li dijî Pekînê rawestin. Lê belê, welatên asyayî dibînin ku DYA hêzeke dûr û dûryan e û bes bihêzkirina pêwendîyên navbera welatên asyayî dê beramber kêşe û xetera li ber wan, bibe sedema îmkana peydabûna bersivekê. Di nav vê çarçoveyê de, hevpeymanîya hind-vîetnamê dikare li Asyayê ji bo îstikrarê bibe yek ji stûnên dahatûyê.

* Lêkolîner û goşenivîserê hindî, nivîskarê kitêba The Upside Down Book of Nuclear Power, Harper Collins, 2010.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

www.sivakurdi.org

## NÎQAŞA LI SER STALÎN

# Cinên Meydana Sor

JEAN-MARIE CHAUVIER *

Di çapemenîyê de, ev yek êdî qet nabe sedema gumanan: "Staline is back" ["Stalîn vegerîya"], **Putîn** *"bi lez û bez şeref li Yekîtîya Sovyetê û kulta Stalîn vegerand"*; jixwe, *"Putîn, Stalînê serdema Înternetê ye"* (1). Li Kremlînê, dengekî cuda olan dide. Serokkomar **Dmitri Medvedev** *"tawanên Stalîn"* bi bîr tîne (*Izvestia*, 7ê gulana 2010ê), ne weke serokwezîrê xwe, **Vladîmîr Putîn**. Şêwirmendê Kremlînê yê mijara Mafên Mirovan, **Mikhail Fedotov**, betalkirina nihênîbûna arşîvan îlan dike ji bo ku *"xatir ji totalîtarîzmê bê xwestin"* (Interfax, 1ê sibata 2011ê). Ji dawîya salên 1980yê ve, hefteyek nîne ku bêyî "diyarkirinên" nû derbas bibe. Konferans, medya û xelekên televîzyonê dozgerîyê dimeşînin. Berîya demeke kurt, rayedaran delîleke nû li dosyayê zêde kir: Qebûlkirina qetlîama **Katyn**ê ya 1940ê. Civakên ku wisa ji bo "rastbînîya" dîroka xwe xebitîne hindik in. Gelo em behsa heman welatî dikin?

Her weke rabihurîya sovyetî, şexsiyeta *Vojd* ("Rêber") şerekî peyv û nîşanan gur dike ku heta cesedê **Lenin** yê di mozoleya Meydana Sor de jî rihet nahêle. Muxalifên lîberal daxwaz dikin ku navên *"celadên"* komunîst ên hin şûn û warên giştî bên guherandin, yê **Rosa Luxemburg** jî di nav de, çunkî ew wê bi terorîzmê û destpêkirina şerekî navxweyî mehkûm dikin. (2)

Dîsa jî, "serdema sovyetî" ji **Stalîn** bi tenê berfirehtir e. Ji heftê û sê salên domdarîya wê, Stalîn bi tenê bîst û pênc salan "hukim kiriye". Sê salan piştî mirina dîktatorê sovyetî, 5ê adara 1953ê, **Nîkîta Khrouchtchev** di dawîya kongreya 20emîn a Partîya Komunîst a Yekîtîya Sovyetê de bi awayekî fermî tawanên wî şermezar kirin. Di kongreya 22emîn de, ew ji nû ve şermezar bûn û biryara derxistina cesedê **Stalîn** a ji cihê xwe li cem **Lenin** di mozoleyê de hat dan. Di dawîya salên 1960ê de, **Leonîd Brejnev** li ser wî tabûyek îlan kir. Ji 1985ê û pê ve, **Mîkhaîl Gorbatchev** bêstalînkirina duyem da meşandin. Wê veqetîyana ji bolşevîzmê û ji pîrozkirina Şoreşa Cotmehê bi xwe re anî. "Welatparêzîyeke dewletî" şûna adetên sovyetî girt. (3)

Piştî 1961ê, peykerên **Stalîn** ji holê rabûn, li derveyî ***Gori***yê, bajarê jidayikbûna wî li Gurcistanê. Li hezîrana 2010ê, serokkomar **Mikhael Saakachvîlî** li wir jî, peykerê wî herî mezin da rakirin. Wî her weha fermana dînamîtkirina abîdeya **Kutaisi**yê daye, ku ji bo bîranîna qehremanên sovyetî (ne tenê "rûs") yên şerê li dij Almanyaya nazî hatibû çêkirin. Qezayek çêbû û welatîyeke gurcistanî digel keça xwe di teqînê de jîyana xwe ji dest da. Li Ukraynayê, peykerekî ku komunîstan di 2010ê de li ***Zaporoje***yê dabû çêkirin, li dawîya kanûnê ji hêla "banderîstan" (4) ve hat xira kirin. Pevçûn li ser bîrdarî, bust, mûzeyan û yên mayî didomin.

FOTO: ADAGP

IVAN MESSAC: **Fantoma şoreşê** (1974)

### Lenîn û Trotskî carina li ser podyuma kesên *"ji Hîtler xirabtir"* şûna Stalîn jî girt

Çapemenî li dijî nû xuyakirina portreyên Stalîn û alên sovyetî di qada gelemperî de derket, lê di rastîyê de, bi tenê dijberên komunîst û gazî wan li ba dikin... Li gulana 2010ê, kevneşaredarê Moskvayê, **Yourî Loujkov**, xwest ji bo pîrozbahîyên *Serketinê* paytextê bi çend resmên "serfermandar" bixemilîne. Kremlînê destûr nedayê. Şaredarê demokrat ne stalînparêz e, lê wî tenê ev fikira berbelav diparast ku pîrozkirina gulana 1945ê bêyî **Stalîn,** dişibe behskirina şerê Ingilîstanê bêyî navê **Churchill** an jî Rizgarkirina Parîsê bêyî ku navê **De Gaulle** bê gotin. Her çi ala "sovyetî" ye ku li her 9ê gulanê di merasîmên *Serketinê* de li ba dibe û tê gotin kopya dilsoz a wê alayê ye ku 1945ê li ser ***Reichstag***ê hat bi cih kirin, qanûneke ku ***Duma***yê [Meclîsa rûsî] 2007ê qebûl kir, xwest stêrkeke spî şûna das û çakûçê li ser wê bigire. Serokkomar **Putîn** ev qanûn îmze nekir.

Li salên 1990ê, pirtûkên dijkomunîzmê her dever dan ber xwe. **Lenîn** û **Trotskî** carina li ser podyuma kesên *"ji Hîtler xirabtir"* şûna Stalîn jî girt. Lê belê, piştî ku *Komgirava Gulagê* ya **Aleksandr Soljenîtsyn** di bernameyên perwerdeyê de cihê xwe girt, gelo divê mirov matmayî bimîne ku dij-herikeke stalînhez derkeve holê? Niha, hin pirtûkên perwerdeyê ku Gulagê pişt guh nakin, behsa qencîyên "birêveberîyê" yên Stalîn û "hevdemkirinê" ku wî da meşandin dikin. Li cotmeha 2010ê, perwerdekar li konferans-nîqaşeke mezin hatin civandin û ji wan hat xwestin ku îlhamê ji "welatparêzîyeke" hê ne zelal bigirin.

Di vê nîqaşê de, du alîyên hişk reqîbên hev in. Li alîyekî, stalînparêz hene, di serî de Partîya Komûnîst a Federasyona Rûsyayê ya **Guennadi Ziouganov.** Ew pesnê sazkirina sosyalîst, pîşesazîkirina salên 1930ê didin ku *"bêyî wê, serkevtina li dijî Hîtlerî wê çênebûya"*, ew herweha pesnê şoreşa perwerdeyî, çandî û tenduristî, zêdebûna hêvîya jîyanê jî didin. Pêlên zordarîyê nayên înkar kirin, lê piçûk tên hesibandin û herweha parekî rewa tên dîtin. Bi mantiqekî teorîya komployan, "emperyalîzm", îstîxbaratên amerîkî, "sîyonîzma global û **Gorbatchev-Yakovlev-Yeltsîn** ên "xayîn" weke sucdarên "îmhakirina YKSSyê" tên dest nîşan kirin.

Alîyê parastinê bi awayekî bi kêrî **Borîs Yeltsîn** û **Egor Gaîdar** (rêberê "terapîya şokê") - ên *"ku YKSSê ji xela û şerê navxweyî rizgar kir"*- bê, bersivê didin vê gunehbarîyê. Derdorên demokrat-lîberal, çi nêzî desthilatê, çi nêzî muxalefetê, teror, xelaya 1932-1933yê (ku li Ukraynayê bi fermî weke jenosîdê tê nasîn), Gûlag, tekçûna 1941ê, texmînên qurbanan ên maksîmum ku ji Soljenîtsyn ve belav bûne, xuya dikin. Ew weha difikirin ku serkeftin "tevî" vî serokê hem xedar hem jî bêaqil û ne "bi xêra wî", hat bi dest xistin. Babetên bijare yên vê kampanyayê ev in : Stalîn berpirsê şerî ye û heta "teşwîqkerê" dagirkirina Hîtlerî ye. (6) Her çi pênc mîlyon esîrên ketî destê Almanan? Ew jî sûcê Stalîn e.

### "Stalîn hem şefê krîmînel hem dahîyê siyasî ye"

Li nav her du alîyan, sohbeteke jîrtir derdikeve. Anketên jêpirsînê nihêrînên dualî li ser rabihurîyê nîşan didin: Zordarî tên şermezar kirin bêyî ku hurmet ji fedakarîyên pêşîyên sazker an jî şervanan re neyê hiştin. Jixwe pirrengîya serdem û rewşên jîyayî, serbihurîyan jî ji hev dikin. Wêjeyeke ku raya giştî ya rojavayî pê nizane, vê yekê jî piştrast dike: Çîrokên herêman, înşaat û şirketan, serbihurîyên peyayan, karkeran, gazîyan, "***zekan***" (esîrên kampan), rojnivîs, lêkolînên li ser jîyana rojane û hişmendîyan. Ew behsa heyamên cihê dikin û carina wan ji hev dernaxin jî. Şahidên guherînên mezin kêm dibin, ne weke yên salên 1953-1985ê, ku hevnavên başbûn û istiqrarê ne. Ji nifşekî ta nifşê din, serbihurî, ne ji heman *"serdema sovyetî"* ne.

Boçûneke din a "jeosiyasî" rabihurîyê bi tenê li gor jidestan û bidestxistinên hêzê dinirxîne. Stalîn hem şefê krîmînel hem dahîyê siyasî ye: Rola wî ya li 1939ê û di dema şerî de bêyî pesn an dijûnan tê hesibandin. Ev analîza sartir rê dide nîqaşên li ser bûyerên rojane, ax û sînor, statûya dîrokî ya Rûsyayê û "jihevketina" ku tê gotin aniha wê dixe xeterê. Hedefên siyasî jî ji nû ve derdikevin holê. Rakirina qedexeya li ser arşîvan dikare bibe hincet ji bo gelek manîpulasyonan. Ev jî dibe fersendeke baş ji bo parçekirina enîya dij-Putîn...

"Hevdemkirin", leitmotifa [motîfa rehber] li gor modeyê bi rabihorîyê re olan dide. Terciheke lîberal, rojavaparêz, ewropî -ya ku serokkomar **Medvedev** di axaftinên xwe de diparêze- dê li hemberî aborîyeke seferberîya neteweyî ya bi mînaka çînî û fikira "ewroasyayî" biçe... Çi dibe bila bibe, ji bo başbûna reqabetkerîya rûsî li ser bazara cîhanî, pêşniyazên civakî yên biêş û dijwar pêwîst in, ku bi tişta rewşenbîrekî lîberal berê demeke kurt navê *"çîmentoya sosyalîst"* lêkirî re li hev nake, ev "çimento" wê fikirên rûsan req bike.

Ev jî feydaya derxistina **Lenin** a ji mermera mozoleya xwe ye, da ku dûrî goristana (sovyetî ya) Kremlînê bê defn kirin. Herweha, behsa xirakirina goristanê jî tê kirin û **Vladîmîr Jîrînovskî**, serokê Partîya Lîberal a Demokratîk a Rûsyayê ya pir neteweperest, bû berdevkê vê daxwazê. Di nîqaşeke televîzyonê de, wî Lenîn weke rûyê Xirabîya Mutleq şayesand (taswîr kir) (*REN TV*, 5ê gulana 2010ê). Mirî be jî, pejirandina wî li ***Meydana Sor***, wê bê wateya, desthilata sovyetî sax filitiye! Xwendekarekî 16 salî, ku sohbeteke wisa li ser "serokkomarekî berê " bê wate didît, da zanîn ku pirsgirêka wî nebûna pereyê ji bo mesrefên xwendinê ye. Pêşkêşvanê bernameyê jê pirsî ka binaxkirina Lenîn dê tiştekî biguherîne. Xwendekar bersiva *"Na"* lê vegerand. Gelo belaşbûna perwerdeyê di serê wî de bû? Jê nepirsîn.

* Rojnamevan

1 *Libération*, Paris, 3ê adara 2010ê; *Le Figaro*, Parîs, 7ê nîsana 2010ê; *Le Point*, Paris, 11ê cotmeha 2007ê. Herweha lê binihêrin *Time*, New York, 22ê kanûna 2009ê, *Forbes.com*, 16ê adara 2010ê, *Rossiaprofile.org*, 14ê gulana 2010ê

2 *Novaïa Gazeta*, Moskva, û komeleya "Memorial", 24ê çileya 2011ê

3 Bixwînin: "Nostalgies soviétiques et nouveau patriotisme d'état" ["Nostaljîyên sovyetî û welatparêzîya dewletê ya nû"] û "La Nouvelle Russie de Vladimir Poutine" ["Rûsyaya nû ya Vladîmîr Putîn"], *Le Monde diplomatique*, adara 2004ê û sibata 2007ê

4 Partîzanên Bandera yê kevneserokê Rêxistina Neteweparêzên Ukraynayî

5 Wek mînak bnr. li malpera stalînparêz *http///stalinisme.narod.ru*

6 Bnr. *Novaïa Gazeta*, 23ê sibata 2010ê

Wergera ji fransî: Simko Destan

# Di nav sirên sextekarîyên bacê de

GUILLAUME PITRON

Ev mesele bi krîza fînansa 2008ê re derket holê, ku banka *Global Trust* ya ***Liechtenstein*** û banka *Swîsreyî* ***UBS*** bi delavereyên xwe alîkarîya muşterîyên xwe yên ewropî û amerîkî dikir ku serweta xwe veşêrin. **Xavier Harel**, ji vê nuxteyê dest pê dike û lîstikên gemarî yên revandina pera û bacê analîz dike: Endustrîyek ku di nav de, heftê *"rêwîyên qaçax yên navneteweyî"* bi hev re qayişê dikişînin û li ser jîrbûn û rêyên zirav digerin, gelo çawa bikarin delavêreyan peyda bikin û xizmeta mîlyarder û şirketên navneteweyî bi cîh bînin. (1) Rojnamevanê ***La Tribune***, nivîskar gelek babet û cûreyên xapandinên fînansê, bikaranîna malzemeyên wan û aktorên wan yên tevlî vî karî bûne bi awayekî pedagojîk eşkere dike. Rast e, avakirina vê berhemê û hinek fikrên wê di nav tevayîya xwe de her tim lojîk û beraqil nîne, bi taybetî di beşên paşîyê de.

Lê belê, bi hilbijartina vê meselê, *"Beyana şer ya welatên G20, ya li hember welatên Beheştên Bacê"*, nivîskar, dê hêdî hêdî soz û derew û durûtîyên van berpirsîyar û rêveberên G20 derxe holê, ku tu lez û beza wan a guherîna sîstemê tuneye, ji ber ku di vê sîstemê de para qezencê ya herî mezin ya wan e.

**Jean de Maillard**, tam ji ber vê yekê êrîşî analîza vê sîstemê dike. Ev meraqdarê sûc û sûcdarên ekonomîk yên ku ji bê ûsûlîya bazarê pêk tên, ev hakimê fransî heta nuha sextekarî, li gel kapîtalizmê wek tiştekî marjînal qebûl dikir. Lê belê bi ***L'Arnaque*** " xapandin"ê, nivîskar, vê carê eşkere dike ku di nav ekonomîya bazarê de sextekarîyên navxweyî der tên. (2)

Rastî ew e ku; di nav xwe de ev sîstem neqanûnîyên nû belav dike: *"Saxtekarîyên sîstemê"*. **Maillard** van gotinên xwe dike nav çarçoveyeke dîrokî û dibêje: Bazara finansê, li ser spekulasyonên malên yekem- ihtiyac û zêdekirina şirketên ***"Ponzi"*** û pêşkêşê vê jî kesê li jora qotê piramîda saxtekarîyê runiştîye, ew jî **Bernard Madoff** e ku mîmarê bi nav û deng yê vî karî ye. Ev *"sucdarîya sîstemîk"*,di salên 2008-2009ê de bi krîza kredîyên *"subprime"* gihişt qonaxa herî bilind û digel ku ev yek gelek xeter e jî, lê kêm car tê ceza kirin. Ji ber vê sebebê berpirsîyarên raya giştî tu caran nikarin bersiveke maqûl peyda bikin. Ji ber ku dema *"sextekarîya legal"* dibe tiştekî normal, tu kes serê xwe bi krîzên berdewam naêşîne, ji dervayî kesên ku di deqîqa dawîn de tên hawarê! Yanî kesên ku bacê didin.

**Maillard**, di wê bawerîyê de ye ku divê sînorên di navbeyna heq û neheqîyê de ji nû ve bên resim kirin. Maillard, gelek pîstên nû ji bo bawerîyan pêşnîyaz dike. Pêşnîyazên wî gelek caran teorîk in û li ber tesbît û cidîyeta bûyerê, bê tesîr û bê mahne dimînin. Gelek mixabin ku, nivîskar analîzên xwe li gel tecrûbeyên xwe yên di warê hiqûqî û dadgehî de zengîntir nekiriye.

1 Xavier Harel, La Grande évasion. Le vrai scandale des paradis fiscaux, Les liens qui libèrent,*(Reva Mezin. Skandala rastîn ya welatên beheşta bacê, têkîlîyên azadekar)*, Paris, 2010, 315 r., 21 €

2 Jean de Maillard,L'Arnaque. La finance au-dessus des lois et des règles *(Xapandin. Fînans li jora qanûn û qaîdeyan)* Gallimard, Paris, 2010, 304 r., 18,50 €

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

www.arsivekurd.org

## DÎROKA JINÛVE BIÇEKKIRINA EXLAQÎ

# "Pêkve jîyan" wek çekê şerê îdeolojîk

THOMAS DELTOMBE *

"Biçekkirina exlaqî" ya ku îro ji bîr bûye, negihişte armanca xwe ya "guherîna dinyayê", weku Frank Buchmanê danerê wê lê dihizirî. Îdeolojî û rêbazên ku vê hereketa siyasî-dînî ya bi eslê xwe amerîkayî di heyama herî tund a şerê sar de didan ber xwe, bi bîr dixin ku sloganên pir nerm û xweşdivî yên wek "pêkve jîyanê", "dîyaloga civakî" û "xemxurîya bo kesên din" heye ku li ser zimanê serdestan veguherîne çekên tirsnak ên şerî.

*Smile 'til it hurts* : Bikene heta pê diêşî. Wiha ye navê belgefîlmeke taze ku li ser hereketa muzîkê *Up With People* (UWP) hatiye amade kirin. (1) Bizava UWP ku nîveka salên 1960ê li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bi rê ket, bi ciwanên amerîkayî yên hişê wan hatî serê wan xwe wek "hêzeke pozîtîf" da nasîn. Di her ahengekê de, birên ciwanên biserûber û bi cilûbergên rengîn, dibezîne ser sehneyê û neqaratên şên û şad lê digotin. *Sing Out! The Happy Song! Where the roads come together!* ("Bistrên bi dengê berz û qewî! Wê strana şad! Li cihê ku rê digihine hev!")

*Up with people*ê xewna civakeke lihev û şad û pirqewmî û aştîxwaz gewde dikir, lewma zû bû rewteke berbelav di nav cew û civatên rêveberan de. Stranbêjên ciwan ku derîyên platformên kanalên televîzyonan ji wan re lap vekirî bûn, çend şahî li Koşka Spî jî bi rê ve birin û çend fînalên Super Bowlê li dar xistin. Şirketên amerîkayî yên pir-neteweyî (Kodak, Exxon, Halliburton, hwd.) piştgirî didane kar û çalakîyên wan û bi xêra şîyana xwe ya aborî nûnerin ji wê rewtê diketine dû fetihkirina cîhanê daku ji Montrealê heta Madrîdê şadîya jînê –jîna "pêkve"– digel bigerînin, ji Ûrdinê heta Vatîkanê, ji Îrlandaya bakur heta Çînê.

Belgefîlma *'Smile til it hurts* neqaratên arambexş ên *UWP*'yê diqeşêre û nîşan dide ka girnijîna bi zorê camêrînîya/sexîtîya bi sponsor û numayîşên çak -hisêbkirî dibine sebebê çi nexweşî û nebarîyan. Bi taybetî hereketeke dîtir ji kûrika bîra jibîrkirinê dertîne, Moral Re-Armament (MRA), ku serkêşîya *Up with people*'ê dikir.

Kon û binetarên evê rewşa "biçekkirina exlaqî", ku salên destpêka şerê sar gelek baw û berçav bû, vedigerin salên 1910-1920ê, wan salên ku Frank Buchmanê (1878-1961) keşeyekî amerîkayî ji terîqta Lutherî, ku beramber sazîyên dînî bi ihtiyad bû û bengîyê ilmê psîkolojîyê bû, biryarê digire doktrîna xwe darêje. Navbirî qanih bûye ku mehremiyeta takekes û ferdan serçaveya kêşeyên dinyayê ye, lewma "cerahiya ruhî" pêşniyaz dike da ku "gunehan vebire û derxe". (2) Buchman, bi bawerîya ku gunehkar bes hingê "pak" dibe gava ku yekî din "tîne ser rêyê", wisa dihizire ku "vîrûsa pozîtîf" peyda kiriye ku ew vîrûs dê dawerive nav civakê, û dê bi rêya vepêşê cîhaneke hez û harmonîyê saz bike, lew li ser rûyê dinyayê her çi şûn û dewseke kêşe û dubendîyan jî, dê pak bibe.

Buchmanê dînnas ne ku kêm pragmatîk e. Wisa dihizire ku ji bo "guhorîna cîhanê" gelek baştir e mirov ji berpirsên xwedanpaye dest pê bike û wan bîne ser rêyê. Armanca wî ya pêşî: Zankoyên amerîkayî û îngilîzî –Princeton, Yale, Oxford, Cambridge, hwd.–, ku li wan deran teorîyên wî hem dibe cihê dilxweşîya ciwanên sernerm û hem jî gelek alîgiran ji ciwanên zîrek peyda dike. Di nav heyameke kurt de ev rewşa xerîb a navneteweyî bi navê "komên Oxfordê" tê nasîn û digihe ber Ewropayê, Afrîkaya Başûr, Awustralya û hwd.

Li her derê, mirîdên Buchmanî *house party*'yan (şahîyên li malê) bi rêk dixin, anku şahîyên kombûnên demkî ku di van şahîyên bi cew û hewayê "kirasê navmalê" de, mirîd îmana xwe saxlem dikin bi rêya guhdarbûna li hev û du *(care)* û bi rêya "parkirin"a *(share)* xwarin û karên navmalê û "te'lîmatên îlahî" ku li wan têne spartin û herwiha bi "guneh"ên ku xwe pê tawanbar dizanin. Lewre, her bi terîqetê mikurhatinê ye, anku bi rêya wê kêra tîj a me'newî, ku bawermend qirêja li ruhî venişti vedişo û dahatûyê bi rêçikên "guhorîna jînê" ve girêdide.

Komên Oxfordê di salên 1930ê de vediguherin. Heyama krîza mezin û dubendîyên dîplomatîk, terefdarên rewşê dibin berdevkên aştîya civakî û navneteweyî. Hereketa ku çîroka xwe ber bi babetên kêmtir dînî vedide (3), berê xwe dide nav bazarê û *storytelling*ê [çîrokbêjî/serhatîbêjî], herwiha hewl dide ku xwe li ber çavên serkêşên qenaetan û derdorên Hollywoodê şirîn bike. Buchman dibe kesayetekî medyatîk û nasyarê çendîn karsazên mezin yên wek Henry Ford û Harvey Firestone, herwiha birek sempatî jî lê peyda dibe beramber nazîzmê. Lê belê, pasîfîst e [alîgirê çalakvanîyeke aştîyane û dûr ji tundûtîjîyê], lewma meyla wî bêtir li ser biçekkirina "exlaqî" ya mirov û xelkan e, lewre bi ya wî cîhaneke nû dê bi vî rengî pêk bihê. Sala 1938ê Moral Re-Armament (MRA) dibe navê resmî yê hereketê.

### Pîyesa herî girîng ya ji keresteyê şerî hatiye durist kirin

Piştî ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê beşdarî şer bû, Frank Buchmanî hewlên xwe bêtir dane ser enîya nav welat: Malbat û şirket. MRAya ku di hunera numayişên propagandayî de hosta bû, pîyesek bi navê *The Forgotten factor* pêşkêşî karkeran kir, ku nirxê biraderîya berpirs û karkeran berz dikir. Harry Trumanê ku wê çaxê senarîst bû, bi şadî û peroş pêşwazî lê kir û got *"ev pîyesa herî girîng e ku ji keresteyê şerî hatiye durist kirin"*. Piştî 1945ê, terefdarên MRAyê bi bawerîya ku *"piştî serkeftina di şerî de divê di aştîyê de jî bi ser bikevin"* şarezatîya xwe îxrac kirin. Xwe nêzîkî karkerên tersaneyan ên Kanadayî kirin, xwe gihandine karkerên kanan ên Ruhrê û karkerên tekstîlê yên bakurê Fransayê da ku wan jî tev li vê "faktora jibîrkirî", hêmana "mirovî", bikin, ku bi ya wan bi tenê ew faktor dikare *"cihê şerê çînan vegire"*.

Aştîya civakî hingê ji hemû gavan elzemtir tê pêş çavan, ji ber ku dinya dişemite nav şerê sar. Ev dibe serdema zêrîn ê MRAyê, lewre lêhatîtir e ji bo vî cûreyê nû yê dubendîyan, cûreyê ku bêtir îdeolojîk û "psîkolojîk" e. Hereketa ku binemalên dewlemend pêwîstîyên wê yên darayî diqedînin û ku dewletên li dû têkbirina komunîzmê bi rengekî nihênî piştgirîyê didinê, dibe xwedanê du parçe milkê bêhed fireh: Yek, li ser dûrgeya Mackinacê, li ser gola Michiganê (Dewletên Yekbûyî) yê din li Caux-sur-Montreux'yê (Swîsre), li hotêleke kevin û luks heçko ji çîrokên perîyan derhatibe.

Her wekî heyama *house parties*, li wê derê jî cew û hewayekî semîmî zal e. Karker û polîs, sendîkavan û patron, xwendekar, rojnameger û arîstokratên ji her neteweyekê pêkve petatan diqeşêrin û derdikevine ser dikê daku nemana dijminatîya di navbera xwe de bi rengê numayişeke muzîkal an jî pîyeseke şanoyê derbibirin. Lê belê derket hole ku ev semîmiyet û nêzîkî lihevçêkirî ye: "sernermî" û "lêxweşbûn/lêborîn"a ku MRA bênavber pesnê wê dide, bes bi kêrî wê hindê tê ku herkesek cihê xwe yê di nav civakê de qebûl bike, û dike ku temamkerîya cudatîyan [cudatîya rol û payeyên civakî] bikeve qalib û gîyanê yeksanîyê.

Ev "pêkve jîyan"a ku hindî şirîn hind jî fasid e, ji Caux û Mackinacê deverên xewnî ji bo dîplomasîya hevterîb çêdike, ku xewn û armanca rasteqîne ya Frank Buchmanî bû. (4) Piştî ku MRA pê re digihe sala 1946ê Konrad Adenauerê şansolyerê dahatûyê yê Almanyayê li Cauxê biezimîne û dikare Robert Schumanê wezîrê karên derve yê Fransayê de'wet bike wir, MRA dilê xwe li xwe xweş dike ku bi vî rengî di lêknêzîkbûna Fransa û Elmanyayê de bûye xwedanê roleke diyarker. "Hewarîyên lihevhatinê" –weku Schumanî sala 1950ê ji wan re gotî– rola xwe ya di damezirandina Ewropayê de mezin dikin û peyama xwe ya "aştîyê" vediguhêzinin hemû deverên dinyayê: Bo Japonyayê, bo Qibrisê, heta bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ku li wê derê "lihevhatina nijadî" pêş dixin. Hevalbendên MRAyê ku hema di hemû biwaran de muhafizekar in, ji piranîya hevçerxên xwe kêmtir nijadperest in û li hember biryardarîya pêşengên reşik ên amerîkayî bi fikar in. Piştî lihevhatina neteweyan û çînên civakî, MRA di salên 1950yê de armanca berbendkirina dubendîyên "nijadî" dide ber xwe.

Dîsa heman faktor dikin ku ew Afrîkaya ku hingê xwe ji kolonîbûnê rizgar dikir, ji xwe re bike erdekî nû yê mîsyon û wezîfeyê. (5) Li wir, her wekî cihên din, endamên hereketê berê hewlên xwe bêtir didine ser elîtan. Li Tûnisê, serê xwe pê mezin dikin ku bi saya "xilaskirina" hindek nasyonalîstan ji "pêşhukmên wan ên derheq Frensîyan de, rêya serxwebûneke aştîyane danîne". Li Kenyayê, Jomo Kenyattayê ku dûre bû serokdewlet, ji bo MRAyê ku hingê ew baş binecî bûbû li Kenyayê razîbûna xwe derdibire. Heman tablo li Nîjeryayê, ku li wê Nnamdi Azikiwe jî, serokdewletê çend sal paştir, kevirê xwe danî. Heçî Kamerûn e, hereket li wê derê sefîrekî pir baş peyda dike: Charles Assaléyê kevne nasyonalîst û serokwezîrê heyamên paştir ku sala 1957ê di seredanekê de li Mackinacê "exlaqen bi çek bû".

AYŞE KAZCI: **Bênav**, rengê pîgment li ser tûwalê, 40 x 60 cm

Serkeftina MRAyê di nav elîtên afrîkayî de ne bi tenê ji ber wê hindê ye ku mifteya toreke bihêz a karîgerîya navneteweyî dide destê wan, belkî herwiha gotara hereketê bi dilê bendewarîyên bûrjûwazîya herêmî ye, ku ew bûrjûwazî bêtir hazir e desthelatê par bike digel kolonyalîstan û tercîha wê ne bidestxistina serxwebûneke rasteqîne ye. Hereketa ku ji kolonyalîstîyê zêdetir dijî-komûnîst bû, nexşeya civakeke nû ya afrîkayî pêş dixe ku reşik û spî dikarin tê de bi dostane "hevkarîyê" bikin. Wiha ye temaya fîlma *Freedom* ("Liberté"), ku MRAyê saz kiribû û li her çar kuncikên parzemînî belav kiribû.

### Li Afrîkayê, karakterê leşkerî yê kampanyaya "biçekkirina exlaqî" pir berbiçav e

MRA, di pişt sehneya biraderîya nijadî re bi taybetî çekên îdeolojîk pêşkêş dike ku xelkên xwe bînin ser rêya neokolonyal a di halê pêkhatinê de. Li Afrîkayê, karakterê leşkerî yê kampanyaya "biçekkirina exlaqî" pir berbiçav e. Li Kenyayê, mîralay Alan Knightê fermandarê brîtanyayî ye ku rêbazên hereketê (mikurhatinên aşkere, şano, fîlm...) bi kar tîne daku şervanên Mau Mau yên zindanîkirî ji rik û rêya wan veqetîne. Li Cezayîr û li Kamerûnê, teknîkên ku artêşa fransî di çerxa salên 1960ê de li hember nasyonalîst û xelkên sîvîl bi kar tîne, pir dişibin yên MRAyê. Û sebeb jî ew e ku navenda Cauxyê gelek caran wan bisporên şerê psîkolojîk ên fransî diezimîne ku jidil dixwazin tecrubeyên xwe digel hevpîşeyên xwe yên rojavayî "par bikin"...

Kongoya li jêr desthelata Belçîkayê ku dawîya 1960ê gihişt serxwebûna xwe, kurteya kar û kiryarên MRAyê li Afrîkayê dabîn dike. Di demekê de ku welat tûşî şerê navxweyî dibe, hereket tîmeke navneteweyî dişîne, ku ji kevne-şervanên Mau Mau, kevne mîlîtanên nasyonalîst ên afrîkaya-başûrî, sendîkavanên ewropayî û muzîsyenên amerîkayî pêk tê, daku şîretên "meslehet"ê bikin. Piştî çend salan, gava ku welat kete nav cew û hewayekî "aştîyane û pasîf", hereket dê fermandar û berpirsên kongoyî dewet dike Cauxyê û "bernameyeke nizamî ya rahênana exlaqî û menewî" pêşniyazî rayedarên herêmê dike. Herçend bernameneketibe fealiyetê, hereketê hêj jî dikarî xwe bispêre beşdarekî wê yê herî girîng, ku bi salan li Kongoyê bi cî bûbû: William Closeê cerrahê amerîkayî, doktorê şexsî yê Mobutu û serdoktorê artêşa Zaireyê [navê berê yê Kongoyê]. (6)

Mirina Frank Buchmanê danerê hereketa sala 1961ê, MRAyê dixe nav krîzeke ewqas kûr ku hereket dikeve ber rexneyên pir tûj. Hindek kes handerên wê yên rastî tînine jêr pirsiyaran, şikê ji serweta wê ya bêsînor û pêwendîyên wê yên muhtemel digel servîsên îstixbaratî yên amerîkayî dibin. (7) Di nav endamên hereketê bi xwe de jî dubendî û nerihetî rû didin. Rêberên qedîmî dixwazin ruhîyeta semîmî ya "komên Oxfordê" peyda bikin. Yên din bêtir li dû hewlên "binecihkirina aştî û aramîyê" û "dîyaloga kulturan" in. (8) Herwiha hindekên din ketine pey ciwankirina peyvên hinek demode, di demekê de ku *babyboomers*-ên rojavayî doza azadîya cinsî û aştîya bo Vîetnamê dikin. Bi vî rengî di sala 1965ê de *Up with people* serî hildide –ew leşkerê stranbêjên nizamî, ku çekê wangirnijîna geş a li rûyê wan e.

*Rojnamevan

1 Lee Storey, *Smile 'til it hurts. The Up With People story*, Storey Production, Dewletên Yekbûyî, 2009

2 Daniel Sack, *Moral Re-Armament. The reinvention of an American religious movement*, Palgrave, New York, 2009, r. 17

3 Hereketa Alcooliques Anonymes [Eraqxurên Bênav], ku sala 1935ê li Dewletên yekbûyî tê danîn, paşmayek e ji komên Oxfordê

4 Di pêşgotina xwe de ji bo çapa fransî ya kitêba Frank Buchman *Refaire le monde*

5 Philip Boobbyer, "Moral Re-Armament in Africa in the Era of Decolonization", Brian Stanley *Missions, Nationalism, and the End of Empire*, Grand Rapids: William B. Eerdmans Publishing Company, Cambridge, 2003

6 William Close bavê aktrîs Glenn Closeyê ye, ku ew bixwe îlhambexşa *Up with People*'yê bû berew dawîya salên 1960ê

7 Pistepist di sala 1989ê de tê pesend kirin gava ku endamekî pileberz ê CIAyê behs li "rêkeftin"eke bihurî ya di navbera bûroya wî û MRAyê de dike, ku bi ya wî, wê rêkeftinê hişt ku ew bikarin "*têkevin nav mêjîyê" gelek serekên ewropî û afrîkayî*. (Miles Copeland, *The Game Player. Confessions of the CIA's Original Political Operative*, Aurum Press, London, 1989)

8 MRA sala 2001ê bû *Initiatives of change[Inîsîyatîfa Guherînê]*

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

www.arsivakurd.org

## SÊYEMÎN "ÇAXA ZÊRÎN" A TELEVÎZYONÊ?

# "Televîzyona bikalîte" çawa rewşenbîr cezb kirin?

DOMINIQUE PINSOLLE Û ARNAUD RINDEL *

CREDIT PHOTO

Rêzefilmên televizyonan ên amerîkî yên ku ji demeke kurt ve weke heng û kêfa gelêrî tên dîtin, êdî statuya berhemê hunerî bi dest xistin. Di hinan ji wan de kesayetên kûr, wêrekiyeke fermî, dekûdolabên elaqedarî pirsgirêkên civakê hene. Temaşevanên xwende wan dineqînin, dibijêrin. Ew dîsa jî berhemên ku armanca wan fetihkirina bazarekê ne, li gor stratejiyeke kanala HBOyê li hev aniye.

*Îro, li Fransayê, hê jî ne mumkun e bê gotin ku mirov ji rêzefilmên televîzyonê hez dikin".* Herwisa bû nêrîna tahl ku berîya ji deh salan hinek zêdetir ji alîyê du parêzerên fransî ên herî pizot, **Alain Carrazé** û **Martin Winckler** (1) ve dihat eşkere kirin. Ji hingê ve, xuya ye rewş berevajî bûye. Rêzefilmên ku çapemenî dagîr kirine, dibin mijara semînerên zanîngehan û ya berheman; bi awayê ku bal tê kişandin ser kûrahîya wan a filozofîk. Mirov vê *"paşdeçûna ji nişka ve ya bîrbirinên bi hezaran kesên bidîplome di mijara televîzyonê de"* çawa îzah bike? (2)

Kokên tiştê ku êdî mumkin e jêre bê gotin *"televîzyona bikalîte",* digihîjin destpêka salên 1970yê, dema ku cîhazên qeydkirinê yên vîdeoyan, kanalên televîzyonên bikablo û yên peykan ji bo weşana nav malan dawî li yekdestîya torên mezin ên amerîkî ***CBS, National broadcasting company*** [NBC] û ***America broadcasting company [ABC])*** tînin. Ev herdu şirket êdî dev ji peydakirina temaşevanên girseyî yên mezin berdidin, û dikevin dûv armancên xisûsî, bi taybetî temaşevanên ciwan û bajarî. Ji bo wan, berhemên bi sewîyeyeke bilind a dibistanî û çandî tên amade kirin û bi taybetî, ew bi buhayekî pir maqûl tên pêşkêş kirin. **Garry Marshall** (hilberînerê rêzefîlma navdar *Happy Days*) wê ev tişt bianîya ziman: Dîsa jî "*zehmet e mirov xwe bigihîne van cure temaşevanan"*, ji ber ku mirov tenê "*bi xîtabkirina aqilê wan …û bi nîşandana tiştên ku ew ê li cihên din nebînin"* (3) dikare wan cezb bike. Pêwistîya memnûnkirina girseyek temaşevanên zehmet wê bûbûya duyemîn "çaxa zêrîn" a televîzyona amerîkî (li dû çaxa salên 1950yê). Li gor nêrîna hemû bisporan, rêzefîlma ***Hill Street Blues*** (1981-1987) dilê vê çaxa zêrîn e. Gelek guhartoyên vê jî derketin holê: *La Loi de Los Angeles*, *New York District, Les Ailes du destin, Profit, Homicide...*

### Lê temaşevanên xwende hê ne amade bûn ku karta xwe ya pirtûkxaneyan bi komandayeke televîzyonê biguherînin

Van cure rêzefîlman amator feth kirin, lê temaşevanên xwende hê ne amade bûn ku karta xwe ya pirtûkxaneyan bi komandayeke televîzyonê biguherînin. Divê em li bendê bin ku kanala bipere ya amerîkî ***Home Box Office (HBO),*** di dawîya salên 1990ê de, di warê rêzefîlmên bikalîte de bibe "referansek" ji bo ku nêrîna qadên rewşenbîran li hemberî televîzyonê bi awayekî radîkal biguhere. HBOya ku sala 1972yê dest diavêje vî karî, piştî çend ceribandinan, di salên 1990ê de bi awayekî xurt di warê hilberandina rêzefîlman de dest bi veberhênanê dike. Ji 1995ê û bi şûn de, budçeya salane ya ji bo programên orîjînal a vê kanalê ji 50 milyon dolaran derbasî 300 milyon dolaran dibe. (4) Ev kanal tercîh dike ku berê xwe bide qadên civakî yên ku heta hingê kêm eleqe nîşanî televîzyonê didin.

Ji bo pêkanîna vê yekê, bi bikaranîna hemû rê û rêzanên ku berê li mitbaxên *"televîzyona bikalîte"* hatibûn hilberandin û bi taybetî bi bikaranîna zimanekî xav, tazîtî û tiştên *"ji alîyê polîtîk ve nemunasib",* ew hewl dide xwe wek cureyekî negatîf a televîzyona ji rêzê bi cih bike. Ji ber ku berevajîya li hemberî şirketên mezin û piralî yên medyayê, li hemberî kanalên bikablo, qanûn ne ewqas hişk in, ew xwe hêsanîtir ji *"tabûyan"* xelas dikin. Encam pir bi lez derdikeve raser veberhênanan: Rêzefîlmên ***Sex and the City*** (1998-2004) û *Sopranos* (1999-2007) bala piştevanîyên temaşevanan û herwiha yên rexnegiran dikişîne ser xwe. Kovara ***New York Times***, di meha kanûna 2001ê de, dibe alîgira barana pesinan; barana ku çapemenîya jê re bikalîte tê gotin, dide ber lehîya xwe: *"Di vê mijarê de qet guftûgo çênebû : HBO …îsal tiştekî wisa pêşkêşî me kir ku ew mîna "çaxeke biçûk a zêrîn a televîzyonê bû"*. HBOya ku ji serkeftina xwe hêzê digire, dide ser şopa vê stratejîya biha: Wek mîsal, ji bo her beşa ***Deadwood*** (2004-2006) nêzî 4,5 mîlyon dolar tên xerc kirin, lê rêzefîlmeke wek ***Lost*** ku barekî giran e li ser pişta ***ABC***yê, qîma xwe ancax bi budçeyeke nêzî 2.5 milyon dolaran tîne.

### Dema reklam tunebin, wê ewqas mesref çawa bên fînanse kirin?

Dema reklam tunebin, wê ewqas mesref çawa bên fînanse kirin? Ji bo derxistina mesrefan, abonetî yekemîn çavkanîya fînansa ***HBO***yê ye. Hejmara aboneyan –di 1994ê de 19,2 milyon– di navbera 1995 û 2007ê de bêhtirî %50î zêde bû.

Îro, ev kanal, ku li zêdetirî 70 welatan weşanê dike, li tevahîya dinyayê xwedî zêdetirî 81 mîlyon aboneyan e (hemû kanalên wê yên di warê sînemayê de bispor, ***Cinemax***ê di nav vê reqemê de ne). Ev girêdayîbûna bi hejmara aboneyan, mecbûr dike ku ***HBO*** girîngîyeke taybet bide bazarkirin û kampanyayên promosyonî, ku ew ji bo van çalakîyan bi giştî ji şirketên mezin ên medyayê du qat zêdetir pere vediqetîne. Destpêka her rêzefîlmeke nû an jî sezoneke nû wek bûyereke mezin tê hesibandin û bi gelek afîş û danasînên televîzyonî tên anons kirin. Hemû jî bi awayekî pir kompleks tên amade kirin ji bo ku ew wek reklamên ji rêzê xuya nekin. Wekî **Zach Enterlin**, alîkar-serokê kanalê yê ji danasîna wê berpirs, li ser mijara rêzefîlma ***True Blood*** (di 2008ê de destpêkirî) binê van gotinan xêz dike: *"Dilê armancê (...) girseyeke temaşevanên agahdarkirî ye, yên ku wê hez nekin ne ji alîyê daxuyîneran ve wek ehmeqan bên dîtin, ne jî bi bendên stûr bên girêdan"*. (5)

### *Sopranos*a ku her hefte ji alîyê nêzîkî 11 mîlyon amerîkîyan ve tê temaşe kirin, "têkûz" bû

Ligel vê yekê, dîtina ku ***HBO***yê bitenê bi aboneyên xwe ve girêdayî ye, bersivê nade realîteyê, ku ev kanal bixwe jî bi awayekî hostane vê diparêze. Ji ber girîngîya mesrefên produksîyonê, yekemîn weşana bernameyekê ne zêde kafî ye ji bo ku ji veberhênaneke bi gelek mîlyon dolaran qazanceke mezin bê bi dest xistin. Ji ber vê yekê, qewlê jîyan û bikaranîna rêzefîlman, ku demeke dirêj bi weşana li ser ekranên televizyonê sînorkirî ne, divê bi awayekî maksîmûm bê dirêj kirin. Bi vî rengî ***HBO*** bi hêza saxhiştina produksîyonên xwe yên li bazarên duyemîn, dikare xwe li ser pîyan bigire. Îro bazarên duyemîn tê wateya firotina bo televîzyonên bîyanî, mafên ji nû ve weşandinê (girtina komîsyonan), bazirganîya DVD û vîdeoya ser daxwazê (ku ev hê ne pir pêşketî ye). Di tevahîya hilberînan de para hatinîyên girêdayî firotina ji nû ve ya naverokê di navbera 1998 û 2004ê de çar qat zêdetir bû, yanî ji %5ê derbasî %20ê bû (6), karê ji firotina berhemên muştaq jî di nav vî hesabî de nîne. Tevî ku bidestxistina reqemên net ên derbarê binyada diravî ya şirketê de gelek zehmet e jî (ku ev şirket îmaja xwe ya kanala hunerî diçîne û terza wê ji bazirganîyê bêtir însîyaqî ye), her tişt dest nîşan dike ku girîngîya bazarên duyemîn her diçe zêdetir dibe.

Di 2003yê de, mesrefa sê sezonên pêşîn ên rêzefîlma *Sopranos* bi temamî tenê ji firotana DVDyan hatibû bi dest xistin. Ku em werin ser rêzefîlma ***Sex and the City***, vê di 2004ê de ji yekemîn komîsyona xwe ya di weşana ***TBS*** û di ya gelek kanalên xwecihî de 350 mîlyon dolar qezenc kirin, di wextekî ku qezenca HBOyê digihîşt nêzîkî yek mîlyon dolaran. Girîngîya berfirehbûna bazarên temamker daxuyîneran gelek eleqedar dike. Rêveberê şirketeke amerîkî ya reklaman, di 2002yê de digot ku veberhênana pêkhatî ya ji bo rêzefîlma ***Sopranos***, ku her hefte ji alîyê nêzîkî 11 mîlyon amerîkîyan ve tê temaşe kirin, *"mukemel"* bû: *"Bangewazîyên bêhempa çêbûn. Temaşevan bênavber di televîzyonê de temaşeyî beşên vê rêzefîlmê dikin. Piştre ew DVDyên wê dikirin û careke din li wan temaşe dikin* . (7) Û herwiha, mirov dikare vê jî li ser zêde bike ku îmkana daxistina ji Înternetê, bipere an jî belaş (û derqanûnî) hebû.

### Ji bo HBOyê firotina berdewam ya bernameyan ji hejmara aboneyan girîngtir e

Firotina daîmî ya bernameyên ku *HBO* hildiberîne û diweşîne, ji bo HBOyê ji zêdebûna hejmara aboneyan girîngtir e. Berevajî reqîba xwe ***Showtime*** (hilberînera *Weeds* û *Dexter*), HBO di dawîya 2010ê de daketina hejmara aboneyên xwe jî dît, eynî wekî şirketa ***Cablevision Systems Corporation,*** xwedîya kanala ku bi awayekî qismî ji alîyê reklama ***AMC***yê ve (hilberînera *Mad Men* û *Breaking Bad*) tê fînans kirin. (8) Pêwistîya domandina telebê di bazarên temamker de ji ber vê ye. Helbet ev yek girêdayî navdarbûn û kapasîteyên bernameyan e, bernameyên ku bala kesên ne abone dikişîninû herwiha bi kapasîteyên xwe dikarin bibin berhemên *"kult"* ku ji alîyê *"fanatîkan"* ve wek bisihir tên dîtin an jî ji alîyê xwendewarên amator ên guftugo û rexneyan ve bi baldarî tên taqîb kirin. Ji bo vê yekê, bilindkirina *"nirxê"* van berhemên televîzyonê tiştekî pir bingehîn bû ; helbet lazim bû ev berhem biketana nav bazara çandî jî ku ji demeke dirêj ve ye berhemên sînematîk û edebî dibin mijara vê bazarê: Çapemenîya bispor a vî warî, derdorên wêje û sînemahez, beşên zanîngehan. (9)

Ji alîyê yek ji rêveberên berê yê HBOyê **Chris Albrecht** ve, stratejîya HBOyê bi *"bernameçêkirina xweser"* tê wesfandin, belê gotareke promosyonî jî hevaltîya vê stratejîyê dike. Ev gotar produksîyonên HBOyê wek berhemên hunerî pêşkêş dike, berhemên ku ji mantiqê televîzyona ticarî ya berbelav filitîbin. Slogana ku di navbera 1996 û 2009ê de dihat bi kar anîn bi serê xwe vê gotarê rave dike: ***"It's not TV. It's HBO"***. (*"Ev ne televîzyon e. Ev HBO ye."*) HBO her tim balê dikişîne ser serbixwebûna xwe ya ji reklamderan (di nav sîstemeke pir ticarî de bi veşartina tora têkilîyên xwe) û bi vî rengî ew xwe ji rexneyan xilas dike; rexneyên ku bi giştî ji alîyê komeke civakî ya dilxwazên gumanbir ve derbarê endustrîya medyayê de tên kirin û ev kom hêrsrabûyî li hember fikra ku berhemeke xeyalî karibe ji bo *"firotana wextê mejîyê amade"* bê bi kar anîn.

### Coşa "rêzefîlmhezkiran" bêguman xwepêşandana herî mezin a HBOyê ye

Hewesên HBOyê û kanalên din, ku heman çavkanîyê bi kar tînin, rastî coşa çapemenî û temaşevanan hatin, temaşevanên ku naxwazin bikevin rola teletemaşevan-serfkar. Li gor wan, teletemaşevan-serfkar eleqedarî amatorên produksîyonên girseyî ne. Îca bi vî rengî, êdî ne tenê temaşekirina televîzyonê, lê hezjêkirin û nirxandina berhemên xeyalî wê babeta pirsê be. Berhemên xeyalî ku ji alîyê civakî ve wek neparêzan ji alîyê polîtîk ve jî wek wêrek tên dîtin (*Treme*, *The Wire*). Analîz zanîneke kûr pêwist dike û di navbera bisporan de jî guftugoyan geş dike. Ha ji ber vê yekê ye **ku *New York Review of Books*** a biprestîj gelek rûpelên xwe ji rêzefîlma ***The Wire*** re veqetandin (10) û herwiha ***Ecole Normale Supérieure*** (Dibistana Bilind a Mamosteyan) rêzeke semînerên bi navê *"Fikirîna ligel rêzefîlmên televîzyonê"* li dar xist. Bi vê munasebetê di nav çend salan de ji çanda populer a rêzefîlmên ji rêzê cudatir, çandeke kûr a rêzefîlmên bikalîte derket holê.

Hin rêzefîlmên wek ***Sopranos***, ***Six Feet Under*** (2001-2005), ***The Wire*** (2002-2008), ***Treme*** (2010) û herwiha ***Boardwalk Empire*** (di 2010ê de dest pê kir) statuya giranbuhayên *"Hunereke heştemîn"* bi dest xist. Îro êdî ne tenê HBO wek temsîlkar tê dîtin, temsîlkara tiştê ku mirov dikare wek *"sêyemîn çaxa zêrîn a televîzyonê"* bi nav bike –serkeftina nû ya ***Mad Men*** rastî kêmbûna lezgînîya kanalê hat. Ev coşa *"rêzefîlmhezkiran"* bêguman xwepêşandana herî mezin a HBOyê ye, tevî ku marjînalên herî telebkar ên temaşevanên wê li sekinandina rêzefîlmên biîhtîras (wek *La Caravane de l'étrange*, di 2005ê de) rexne girtin û tevî ku hin dengên dijber, wekî yê derhenêr **Jacques Audiard**, li dijî kulteke rêzefîlman derdikevin. Ligel van gumanberîyan, ev kanal di nav temaşevanên xwe de promotor û amatorên dek û dolabên kompleks û kesayetîyên kûr peyda dike. Ev dek û dolabên kompleks û kesayetîyên kûr di forûmên ser xeta Înternetê û herwiha di semînerên zanîngehan de dibin mijara guftugoyên bêdawî.

*"Modêla HBOyê"* baş kar dike: Kanal di 2008ê de dezgeha herî berdar a împaratorîya **Time Warner** bû. Di nav tiştê ku wê bibûya *"Wal-Mart a çaxa agahdarîyê"* (11) de, wê cihekî mîna reyoneke luksê di bazareke mezin de girt. Ji dawîya salên 1990ê û şûn ve, kanalên din ên kabloyê jî ji bo rêzefîlman veberhênanê dikin û heman serfirazîyan bi dest dixin; tevî ku temaşevanên wan (di navbera yek û çar mîlyonan de) qet ne mîna temaşevanên bernameyên herî populer in (bernameyên populer dikarin bala bêhtirî 15 mîlyon kesan bikişînin ser xwe). Wekî din, ji bo ku bi awayekî girseyî bala reklamderan bikişînin, şirketên mezin yên medyayê ên sîstema hertzî karî bi awayekî serkeftî modêla rêzefîlma "bikalîte" pêk bînin (bi *Lost*, *Desperate Housewives*, *Dr House* û herwiha *Les experts*). Hêjayî gotinê ye ku ev yek bi zêdebûna hêza koma senarîstan pêk hat, çawa ku serkeftina wan a di greva 2008ê de ev tişt îsbat kir.

* Yê pêşî dîroknas û yê diduyê endamê Komeleya Acrimed e.

1 Alain Carrazé û Martin Winckler, *Les nouvelles séries américaines et britanniques*. 1996-1997, Les Belles Lettres, 1997, r. 5-6

2 Olivier Donnat, *Les pratiques culturelles des français à l'ère numérique. Enquête 2008*, La Découverte / Wezareta çand û komunîkasyonê, 2009, r. 95

3 Axaftina ji alîyê Jean-Jacques Jelot-Blanc ve di *Télé-feuilletons* de ragihandî, M.A. Editions, 1990, r.VIII

4 Gary R. Edgerton û Jeffrey P. Jones (Rêve.), *The Essential HBO Reader*, Zanîngeha Çapemenîyê ya Kentucky, 2008, r. 32. Ji xeynî jêwergirtina li dij, daneyên hejmaran ji vê berhemê hatine girtin

5 *PR News*, 4 tebax 2008

6 Marc Leverette, Brian L. Ott, Cara Louise Buckley (Rêve.), *It's not TV. Watching HBO in the Post-Television Era*, New York, Routledge, 2008, r. 59

7 http://www.usatoday.com, 12 sibat 2002

8 Associated Press, 4 mijdar 2010 ; *The Wall Street Journal*, 11 adar 2011

9 Davis Buxton, *Les séries télévisées. Forme, idéologie et mode de production*, L'Harmattan, Parîs, 2010

10 Lorrie Moore, "In the life of *The Wire*", *The New York Review of Books*, 14 cotmeh 2010, berg 57, hejmar15

11 Ev îfade ya rojnamevan Ken Auletta ye, ji berhema *The Essential HBO Reader*, *çavkanîya li jor navbihurî* hatiye girtin, r. 15

Wergera ji fransî: Aynur Bozkurt

www.arsivakurd.org

# ÇAND Û HUNER

*DestAR-Theatre, di Şanoya Kurdan de ji îdîayan bêhtir, girîngîyê dide jîyana ceribandinên teatral*

## Li Stenbolê şanoyeke kurdewarî: DestAR-Theatre

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Koma Şanoyê ya bi navê DestAR-Theatre di çirîya pêşîn a 2008ê de bi pêşengîya Mîrza Metîn û Berfin Zenderlioglu hate ava kirin. Li gor bilêvkirina wan, armanca sereke ya komê ne ew e ku di zûtirîn katê de lîstikan hilberînin. Armanc ew e ku di warê hunerî de hevîrtirşa komê bê strandin. Her wiha avakirina atolyeyeke ku bi awayeke teorîk û pratîk her kesê di nav komê de ber bi hilberînê ve dehf bide û atmosfereke afirîner pêk bîne jî, armanceke komê ye. Ji ber vê yekê koma navbihurî berîya her lîstikê, giranîya xwe dide/daye xwendinên psîkoanalîst û xebatên lîstikvanîya ceribandinî. Kom, di nav vê pêvajoyê de bi hunermendên ku di warê xwe de şareza ne; xebatên dans, deng, muzîk û rîtmê tevli xebatên xwe yên lîstikvanîyê dike û bi vî awayî hewl dide ku felsefeya lîstikvanê kemilî bi pêş bixe.

**Reşê Şevê** ku tevî kêşeyên jîyanî yên van atolyeyan û di encama hewcedarîyekê de derketiye holê, lîstika yekem a komê ye. Ji bilî vê lîstikê, kom xwedîyê lîstikên perdeyî yên bi navê '**Qeşmerên Apoletî**' û '**Cerb**' e jî. Koma ku zarok ji bîr nekirine, ji bo zarokên mexdûrên *Zagona Têkoşîna Bi Terorê* re (TMK) kurtelîstikeke bi navê '**Kevir**' û lîstikeke zarokan a bi navê '**Pisîka Belek**' hem bi kurmancî, hem jî bi tirkî pêşkêş kiriye. Şayanê gotinê ye ku endamên avakar ên komê, di nav **Teatra Jîyana Nû** û **Seyr-î Meselê** de -ku du hîmên bingehîn ên şanoya bakur in- salên dirêj ked dane û xebata şanoyê domandine.

DestAR-Theatre, di şanoya kurdan de ji îdîayan bêhtir, girîngîyê dide jîyana ceribandinên teatral. Dema ku kom vê yekê dike, armancekê dide pêşîya xwe ku di nav vê azmûnê de, tekstên xwe yên modern jî biafirîne. Kom bi xebat û hilberînên pêşkêş kirine û bi xebatên ku wê bike, dixwaze 'zimanekî sehneyê' yê xweser biafirîne, di wê bawerîyê de ye ku hestiyarîyên derbarê 'ziman û çandê' de jî, bêyî 'zimanekî sehneyê' yê modern, nagihêje armanca xwe û armancên xwe yên sereke li gor vê fikrê saz dike.

Mîrza Metîn û Berfin Zenderlioglu diyar dikin ku koma wan, bêyî ku azmûna şanoya kurd/şanoya kurdan a li Tirkiyeyê bê ji bîr kirin, dixwaze hilberînên cuda tev li vê azmûnê bike, di temaşevanan de guherandinan biafirîne, reng û hêz li şanoya kurdan bar bike û ya herî girîng jî diyardeyên gerdûnî lê zêde bike.

DestAR-Theatre, ji bo ku atolyeya xwe bi rê ve bibe, pêşandanan pêk bîne û ji bo ku ji şano û beşên cuda ên hunerê re sehneyê veke, ji xwe re mekanek kirê kir û navê wê kir '**Şermola Performans.**' Piştî xebat û hewldanên dûvedirêj û zehmet, hewcedarîyên vê mekana hunerî bi awayekî giştî hatin peyda kirin û ji nîsana heman salê û pê ve, bi pêşandana lîstikan û çalakîyên cihêreng mekan kete nav xebata hunerî.

Avakarên vê mekana hunerî, sedema avakirina Şermola Performansê bi van hevokan rave dikin: *"DestAR-Theatre, komeke wisa ye ku bi qasî du salan li Beyogluya Stenbolê, li salonên cihêreng ên provayê û sehneyên şanoyan de, bi awayekî koçerane xebatên xwe berdewam kiriye. Ji ber ku di maweyekî kurt de, xebat û çalakîyên komê zêde bûn û pê re jî mohra xwe li bin serkeftinên cuda xist, lêgerîna mekanekê xwe li me ferz kir."*

cBi vê armancê kom, piştî lêgerîneke demdirêj, li Beyogluyê daîreyeke ji 240 metrekare pêk hatî peyda dike. Ji ber ku daîreya hatibû kirê kirin, mîna kavilekê bûye, ji hêla madî, manewî û demî ve bi têra xwe zehmetî daye komê. Avakarên komê diyar dikin ku piştî xebata sê mehan, mekan ji xebatê re amade bûye. Şermola Performans vê gavê xwedîya sehneyeke 70 kesî, cafeyek, ofîseke xebatê û ji bo lîstikvanan jî xwedîya kulîsekê ye.

Hêjayê gotinê ye mekana ku ji hêla teknîka dengî, teknîka ronahîsazîyê û di warên din de xwedîya kêmasîyan e, bi halê heyî ketiye nav çalakîyan û ji bo jiholêrakirina van kêmasîyan hewldan berdewam in.

Gelo Şermola Performans navê xwe ji ku werdigire? Em hinek bala xwe bidin çîroka navê Şermolayê. Wekî tê zanîn, em Şermolayê ji kurteçîroka bi navê 'Şermola' ya ku di kitêba Helîm Yûsiv a bi navê 'Mirî Ranazin' de cih digire, dizanin. Ev kurteçîrok/serpêhatî di sala 1998ê de, ji hêla Teatra Jîyana Nû ve bi navê 'Komara Dînan Şermola' bûye lîstik û di warê xwe de bûye berhemeke bi têra xwe serkeftî. Şermola, li bajarokê Amûdê ya Rojavayê Kurdistanê navê girekî ye ku bi gor û dînên xwe navdar e. Ji vir û pê ve em bala xwe bidin gotinên Mîrza Metîn û Berfîn Zenderlioglu: *"Dema ku me mekanê xwe kirê kiribû, me dît, dişibiya goristaneke kavilbûyî û xerabe. Jixwe li vî welatî pêkanîna şanoyê dînîtî ye. Herwiha armancek jî ew bû ku em girêdana xwe ji rabirdû û kevneşopîya Şanoya Kurdî qut nekin."*

Şermola wekî sehneyeke performansê hatiye saz kirin ku ji tevahîya beşên hunerê re vekirî ye. Şermola Performans ku herdem feraseta hunera ceribandinî û gerdûnî ji xwe re kiriye bingeh, di nav hewldaneke wisa de ye ku bi taybetî guhên wê li ser şano û hunera kurdî ye û di çarçoveya vê guhdanê de, di nav keftûlefta geşkirina şanoyeke kurdewarî de ye.

DestAR-Theatre, bi lîstika 'Reşê Şevê' yekem koma kurdî ye ku bi awayekî fermî li sehneyeke şanoya dewletê cih ji xwe re terxan kiriye. Komê li Şanoya Dewletê ya Wanê lîstika xwe pêşkêş kiriye. Li hêla din, ji ber ku zimanê komê bi kurdî ye, di vê lîstika xwe de teknîka jornivîsa tirkî bi kar aniye û hewl daye ku potansîyela temaşevanên xwe berfirehtir bike.

Herçî lîstika 'Cerb' e, beşdarî li gelek festîval û çalakîyan kiriye. Piranî li Stenbolê, li gelek deveran derketiye ser dikê û di 27 pêşandanan de xwe gihandiye 2 hezar temaşevanan.

Lîstikê di sala 2010ê de, di çarçoveya xelatên 10emîn a Lionsê de, di beşê 'baştirîn lîstika nû ya xweser' de xelat wergirtiye. Li hêla din şayanê gotinê ye ku DestAR-Theatre bi vê lîstika xwe ji Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê alîkarîya hunerî wergirtiye.

DestAR-Theatre adara 2011ê, lîstikeke ku ji kurteçîroka Sadiq Hîdayet a bi navê 'Bebika li pişt perdê' hatiye veguhestin derxist ser dikê. Lîstika bi navê 'Bûka Lekî' ku ji hêla Mîrza Metîn ve hatiye nivîsandin û bi rê ve birin her şemî û yekşeman li Şermola Performansê derdikeve pêşberî şanohezan. Lîstik komedîyek e û behsa serpêhatîya evîneke absurd dike.

Di lîstika ku dramaturya wê Arjen Arzen, sazkirina wê ya muzîkê Dodan, dekor/kostumgerîya wê Metîn Çelîk, ronahîsazîya wê Alev Topal dike de, Berfîn Zenderlîoglu, Alan Ciwan û Sevgi Turan wekî lîstikvan cih digirin.

## "Zerê" 85 salî ye…

ALI GÜLER *

Fîlmê Zerê 85 salî ye… Gava derhênerê ermenî **Hamo Beknazaryan** yekemîn fîlmê kurdî **Zerê** kişand, sal 1926 bû. Sînema cîhanê jî hîna zarok bû. Zarokeke bê zar û ziman... Wê demê Tirkîye û Îranê jî sînema nû nas dikir.

Kurd jî wê demê bi sînemayê hesiyabûn û fîlmek kişandibûn. Wan salan sînema li cîhanê nû belav dibû. Li gelek welatan jî sînema nedihate nas kirin û ew endustrî negihabû wan deran… Gava her du birayên fransi yên bi navê **Auguste** û **Louis Lumiere** sînema keşf kirin, sal 1895 bû. Ev her du bira cara yekemîn li Parîsê li kafeya bi navê **Grand** fîlmek nîşan dan: *"Fîlm ji wêneyên reş û spî yên li dû hevdu rêzkirî, pêk dihat. Di vî filmê çend deqîqeyî de rêwî ji gara **Parîs**ê ji trênê peya dibûn û derdiketin derve. Ev nîşandan bû destpêka dîroka sînemaya cîhanê"* (1)

Zerê jî, 31 sal piştî vê tarîxê, sala 1926ê hate kişandin. Lê sînema hêj bê zar û ziman, reş û spî bû. Wê demê her çiqas li Tirkîyeyê çend belgefîlm hatibûne çêkirin jî, hejmara wan kêm bû. *"Li Tirkîyeyê filmê yekem sala 1919ê ji alîyê **Ahmet Fehim Efendi** ve hat kişandin. Navê vî filmî jî; **Binnaz** e."* (2) Rewşa sînemaya Tirkîyeyê jî bêguman ji têkilîya *osmanî* û *fransîyan* tê. Jixwe yekem car fransîyan sînema bir ***Stenbolê***.

Li ***Îran***ê van deman rewş hinek cuda ye. Her çiqas dewletek xwedi dîrok be jî, bandora olê serdest e. Sedem ev e ku li gor Tirkîyeyê sînema dereng dikeve vî welatî. Kamera cara yekem bi fermana **Şah** salên 1900ê ketiye Iranê. Wê demê ji bo **Şah** û malbata wî hinek dîmen hatine tomar kirin û nîşan dayîn. Lê fîlmek çêkirî gelek dereng çêbûye. Fîlmê bi navê ***"Hêşîn û Rebî"*** sala 1929ê ji alîyê **Avans Oganyats** ve hatiye çêkirin." (3) Ev bi me dide zanîn ku **Zerê** 3 sal berîya fîlmê çêkirî yê Îranê hatiye kişandin. Li Îranê jî wek Tirkîyeyê pêşengên sînemayê biyanî ne. Li wir jî ***rûsan*** serkêşî kiriye. Yekem fîlmê kurdî ***Zerê*** jî sala 1926ê bi derhênerîya **Hamo Beknazaryan** hat çêkirin. Ev film wek destpêka dîroka ***sînemaya kurdî*** tê qebûl kirin. Li gor vê tarîxê ***sînemaya kurdî*** 85 salî ye û xwedîya dîrokeke kevnar e. Lê mixabin ji ber egerên siyasî *sînemaya kurdî* jî wekî rewşa kurdan a giştî bi pêş neket. Di cihê xwe de ma. Herçiqas, dûre çend belgefîlm hatibin çêkirin jî, bazareke ***sînemaya kurdî*** tu deman çênebû. Salên 1960î û bi şûn de **Yilmaz Guney** derket holê, wî tiştên baş kirin. Lê ew jî şexsî ma.

Van çend salên dawîyê bi têkoşîn û bi rêxistinbûna kurdan çi li *Başûr* çi jî li *Bakur* be, ***sînemaya kurdî*** jî hêdî hêdî bı pêş dikeve. Di dema îroyîn de sînemaya kurdî di qada navneteweyî de ji xwe re cîhek girtiye û bi nasnameya xwe tê nas kirin.

### Di nav bêdengîyê de qêrîneke reş û spî: Zerê

Fîlm, di nav dîroka sînemaya kurdî de klasîkeke girîng e. Fîlm, cara yekem di çarçoveya projeya pêşketina hunera gelên ***Sovyetê*** de hatiye çêkirin. Senaryoya fîlmê **Zerê** bûyereke rast e û ji çîroka "***Qedera Zerê***" hatiye wergirtin. Fîlm, herçiqas bêdeng be jî, li gor şert û derfetên dema xwe gelek profesyonel e û heta îro jî wek berhemeke klasîk a *perdeya spî* tê qebûl kirin. Ev fîlmê reş û spî, li ser jîyana gelê kurd e, fotografîk e û dramatîk e. Mijar; her çiqas çîroka keçikeke êzidî be jî, di warê sosyolojîk de derhêner balê dikişîne ser jîyana feodalîyê û rejîma berê ya ***Çar*** û wê rexne dike. Fîlm, li ***Zozanên Elegezê*** li gundê ***Sarîbolaxê*** (Sovuxbulox) hatiye kişandin û nêzîki 500 kesan jî tê de lîstiye. Piranîya wan jî kurd in. Kom û hunermend û xebatkarên fîlm, nêzîkî du mehan dibin mêvanên kurdan û di nav wan de dijîn. Di fîlm de rola keça kurd ***Zerê*** jî ya lîstikvana navdar a ermenî **Mareto Tadevosian** e. Çîroka fîlm, di navbera **Zerê**, **Seydoyê şivan** û **Têmûr Beg** de derbas dibe. Lê di şexsîyeta van kesan de jîyana feodal û sîstema berê ya **Çar** jî bi zimanekî tûj tê rexne kirin. Dîmenên zilma **Têmûr Beg** a li ser gel, têkilîyên wî yên bi sazîya polîsan re û jîyana feodal dide nîşan. Li alîyê din di fîlm de dîmenên hezkirina sîstema nû ya Sovyetê tên xuya kirin. Jixwe senaryoya fîlmî jî li gor wê hatiye nivîsandin…

Lîstîkvana film: Mareto Tadevosian

Di fîlm de **Zerê** keçikeke xweşik û delal e. Delalîya gund e û dilketîya **Seydoyê şivan** e. Evîndarîya wan jî weke hemû keç û xortên gundan, li ser kanîyê dest pê dike. Kanîya gund ji bo her du evîndaran dibe cîhê hevdîtinê. Lê ev rewş zêde berdewam nake. Rojekê nav û dengê bedewbûn û delalîya **Zerê** diçe guhê **Têmûr Begê** xwedîyê pirjinan. **Têmûr Beg** bi darê zorê **Zerê** ji xwe re dixwaze û digire. Li gor çanda kurdan **Zerê** tê xemilandin û li hespê siwar dikin. Bi duhol û zirne ji malê derdixin. Li pêş çavên gundîyan tînin koşka **Têmûr Beg**. Ev dîmen li gor demê wiha tê şirove kirin; axayê desthilatdar, hêz û dewlemendîya xwe nîşan dide û li dijî herkesî doza mêrxasî û mêranîyê dike. Lê ev ji **Têmûr Beg** re namîne. Bûka bê dil **Zerê**, bi gotinên: ***'Ez te naxwazim!'*** axayê kurd şok dike. Ev gotin dibe sedema hovîtîya **Têmûr Beg**, ji hêrsan dixwaze **Zerê** û **Seydoyê şivan** ceza bike, herwisa dike jî. Wek sûcdar jî **Seydo** desteser dike. Dixwaze **Zerê** jî, li gor çanda êzîdîtîyê bê ceza kirin. **Têmur** axa dibêje: *'Zerê berê bi zilamekî din re (Seydo) razaye (bênamûs e). Gereke ew were ceza kirin.'*

Ev kiryar di vê çandê de tê wateya xiyanetê. Ji ber wê gereke **Zerê** li gor çanda kurdên êzîdî were ceza kirin. **Têmur** beg û hevkarên wî jî wiha tînin serê **Zerê**. Tînin ser û çavên **Zerê** bi tenîyê reş dikin, li ser kerê siwar dikin û di nav gund de digerînin. Gundî kom dibin, li **Zerê** nifira dikin, didin ber keviran, wê rûreş û şermezar dikin. Birayê **Seydo** yê piçûk **Xidir** û hevalên Seydo vê zilm û sitemê qebûl nakin, li hemberi **Têmûr Beg** serî radikin. Zerê û Seydo ji destên wan xilas dikin. Xidir li vir Têmûr Beg dikuje. Fîlm bi van dîmenan diqede. Ev dîmen nîşan dide ku fîlm, berhemeke perwerdeyî (dîdaktîk) ye. Di bingeha temaya fîlm de zilm heye, jîyaneke xerab û feodalî heye. Li alîyê din jî serhildan û neqebûlkirin jî heye. Ev jî nêrîna derhenêr nîşan dide…

Di fîlm de bûyereke trajîk jî diqewime; gava dîmenên rezîlkirina **Zerê** tê girtin, *"Jinên gund, êrişî ser lîstikvana ermenî **Mareto Tadevosian** dikin û wê şermezar dikin. Ji wan we ye ev bûyereke rast e. Lîstikvan û xebatkarên fîlmê Zerê bi zorê lîstikvana jin ji destê wan derdixin û 'Dibêjin ev ne bûyareke rast e, fîlm e.'* Wê gavê jinên gund, disekinin… " (4)

Fîlmê Zerê sala 1970yê ji alîyê *"Sînemevanê ermenî **Alexandir Spêndiarov** ve hatiye bi deng kirin. **Casimê Celîl**, **Cemîla Celîl** û **Keremê Seyad** jî di dublaja fîlm de kar kirine." (5)* Fîlmê kurdî **Zerê** heyanî îro li Ermenistanê, li Rûsyayê û li gelek deverên din ên cîhanê hatiye nîşan dan. Orjînala vî fîlmî nuha di arşîva *Wezareta Çand û Hunerê ya Ermenistanê* de ye.

**Kunyeya fîlmê**:
Nav: Zerê
Cure: Drama
Derhêner: Hamo Beknazaryan (1892-1965)
Lîstîkvan: Mareto Tadevosian,
M. Garagash, Avet Avetisyan Slo,
Olga Gulazyan, Nina Manucharyan
Nano, Hambartsum Khachanyan Kıdo,
Aram Amirbekyan Kilek, Sh. Amasi
Martirosyan Zurba, S. Gevorgyan,
N. Aghambekyan
Dem: 72 deqîqe
Sal:1926
Ziman: Kurdî

* Rojnamevan

1 Geoffrey Nowell Smith – World Cinema History (Dîroka Sînemaya Cîhanê)

2 Türk Sinema Tarihi Belgeseli (Belgefîlmê Dîroka Sînemeya Tirk)

3 Hamid Reza Sadr- Iranian Cinema a Political History (Dîroka Sînemaya Polîtîk ya Îranê)

4 Emerîkê Serdar: Çawa Kinoya Zerê Hatiye Kişandin (Riya Teze - 11. Cotmeh 1969)

5 Egîdê Xudo: Kîno Fîlmê Zerê hatiye Tezekirinê (Riya Teze - 19 Sibat 1972)

www.arsivakurdi.org

# Ferhengên Kurdî

JAN BADA

Ferhenga zimanê kurdî li gor nivîskarên kurd bi piranî bi *Nûbara Biçûkan* ya **Ehmedê Xanî** dest pê dike. ***Nûbara Biçûkan*** (Nûbehara/Nûbihara Biçûkan) bi şêweya helbestkî di sala 1683ê de hatiye nivîsîn û fêrkirina zarokan ji xwe re bingeh digire. **Ehmedê Xanî** xwastiye bi vê pirtûkê zimanê kurdî diyarî zarokan bike.

Ger em berhemên ku hin biyanî û mîsyoner li ser zimanê kurdî nivîsîne (gelek caran ferhengokek jî lê zêde kirine) nehesibînin, Ferhenga yekemîn ku bi şêweya ferhengê hatiye amade kirin, ferhenga bi navê ***"Kürtçe-Türkçe Sözlük"*** ya **Yusuf Ziyaeddin Paşa** ye. Ferheng di sala 1894ê de li Stenbolê hatiye çap kirin. Nivîskar ferhenga xwe mîna diyariya **Abdulhemîd** ji kurdî re (***El-Hediyye El-Hemidiyye fi'l-Lûgat El-Kurdiyye***) bi nav kiriye û weşandiye. Ev ferheng ji alîyê **Mehmet Emin Bozarslan** ve bi tîpên latînî ji nû ve hatiye wergerandin û rêzkirin û di sala 1978ê de di nav weşanên *Çira*yê de derketiye.

Ferhengnivîsîya zimanê kurdî ya bi tîpên latînî demeke dirêj qels û kêmberhemdar maye; bi zarav û alfabeyên din hin berhem piştî salên pêncîyê hatibin nivîsandin jî yan tîpwerger nebûne, yan jî zêde nehatine belav kirin. Ji alîyê din jî, gelekan xebata berî yên xwe dubare kiriye; lêgerîn û lêkolînên kûr nehatine kirin. Di navbera ferhenga **Yusuf Ziyaeddin Paşa** û yên ku bi lêkolînên berfireh hatine amade kirinê de zêdeyî 80 sal derbas bûne. Di vê navberê de bi zarave yan jî tîpên din hin ferheng hatine amade kirin *(Amin 1949, Mukrîyanî 1950-1955-1961-1966, Merdux 1955-57, Siabendov-Çaçan 1957, Kurdo 1960, Nebez 1960, Xal 1960-1964, Mahabad 1961, Cegerxwîn 1962, Bakaev 1962 ûwd.)* lê tîpwergera wan çênebûye; kurdên latînînivîs ji wan berheman bêpar mane. Berîya vê demê gelek akademîsyenên ewropî bi pirtûkên rêziman re li ser ferhengê jî xebitîne; ev dem dikare mîna dema berhemên lêkolînên kevin bê bi nav kirin, li ser wan gelek xebat çêbûne; mirov dikare di pirtûkxaneyan de van berheman bibîne, lê nikare bi dest bixe, piranîya wan j nû ve nehatine çap kirin.

Piştî salên heştêyê di ferhengnivîsîya kurdî de demeke nû dest pê dike. Gelek xebat temam bûne, çap bûne û bingeha gelekan jî, ji nû ve hatine danîn ku berhemên wan piştî salên 90ê ketine destên xwendevanan. Ji salên 1990ê bi şûn ve rê li ber ferhengnivîsîya kurdî vedibe, gelek berhem tên holê, pirsgirêka ferhengên gelemperî ya bi ziman û zaraveyên kurdî kêm dibe.

Navê hin ferhengnivîsan: **A. Balî**, A. Önen, **Abdulkadîr Ulumaskan**, Ali Seydo-Alî Gewranî, **Amîrxan**, Amîn, **Bakaev**, Baran Rizgar, **C. Alî Bedirxan**, Cîgerxwîn, **Çeko Kocadag**, D. Îzolî, **Diyar Bohtî**, Feryad Fazil Omar, **Gîw Mukrîyanî**, Hafiz Qazî, **Hejar**, Jemal Nebez, **J. Blau**, J. Espar, **Kamêran Botî**, Kamîran, **Lokman Abbas**, Malmîsanij, **M. Cemîl Seyda**, M. Lewendî-M. Aydogan-V.Tanrikulu, **M.L. Chyet**, M. Tanrikulu, **M. Taqî Ibrahîmpûr**, M. Xalid Gulî, **Mahabad û Nêçîrvan Qilorî**, Mistefa Gazî, **Mustafa Borak**, Mûnzûr Çem, **Nawzad Mohammad**, Qanatê Kurdo, **Raman**, R. Zîlan, **Salah Sadallah**, Shafiq Qazzaz, **Umîd Demîrhan**, Tewfîk Wehbî, **Torî**, Zana Farqînî, ûwd.

Piranîya ferheng gelemperî ne, li ser peyvên kurdî ne û li ser beşan bi têgehan kûr nabin. Di van salên dawîyê de hin ferhengên têgehan jî derdikevin; xebata koma **Kurmancî** ya *Enstîtûya Kurdî-Parîsê* jî divê bê gotin, ji ber ku hewldaneke komkirin û afirandina têgehî tê de heye. Mamoste **Cemal Nebez** yekemîn car hewl daye ku li ser têgehan raweste *(Nebez, Hendik Zarawayî Zanistî, 1960)*. Ji ferhengên gelemperî ber bi ferhengên têgehî hewldan hene, encama wan dikare di salên pêş de bêtir derkeve holê. Eger mirov çavlêgerînekê li ser dîroka berhemdarîya kurdî bike, dikare vê yekê binirxîne ku destpêk gelemperî be jî, ber bi beşkirina zanistî ve pêdeçûnek diyar dibe.

Ferheng ber bi rewşa têrbûnê ve ye, lê kêmasî di beşên leksîka û ansîklopedîyê de hene. Leksîkolojîya zimanê kurdî hîn di destpêkê de ye û di vî warî de li benda berhemdarîyeke sazîbûnê ye. Pirsa ansîklopedî û leksîkolojîyê ji karê yek bi yek şexsan bêtir, karê sazî, dezgeh, zanîngeh, dewlet û îradeya netewî ye, karê komîsyonên pîşeyî yên ji lêkolîner, akademîsyen û zanyaran pêkhatî ye. Herçiqas hewldan ber bi sazîbûna pîşeyî bixuyê jî, di vî warî de bingeheke hîn xurtir pêwîst e. Ji ber ku xebata raman, karê afiranderîyê li tenişta derfet û sazîbûnê, rewş û atmosfereke azad jî pêwîst dike.

Rewşa ferheng, leksîkolojî û ansîklopedîya kurdî ya gelemper û beşên pîşeyî li ser rêyeke rast dixuyê, dê gerekên xwe jî li ser vê bingehê bi cî bîne.

## Jîyan bi kurdî xweş e!

# NAVEROK

HEZÎRAN 2011


Li Kurdistana Bakûr struktura demografîk
**OSMAN AYDIN**
▶ R. 1

Paşxaneya xwepêşandanên başûrê Kurdistanê
**ARAS SOBER**
▶ R. 1

Bîrbirineke bêhiş
**SERGE HALIMI**
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Derbarê nifûsa cîhanê de tesbîtên xapînok
**GÉRARD-FRANÇOIS DUMONT**
▶ R. 6

Dema ku porê Çînê spî bû
**ISABELLE ATTANÉ**
▶ R. 7

Gerstêrkeke serjimara wê zêde?
**GEORGES MINOIS**
▶ R. 9

Dema ciwanên ereb
**YOUSSEF COURBAGE**
▶ R. 11

Li kevîya şer, Kurd asta daxwazên xwe bilind dikin
**ELIZABETH PICARD**
▶ R. 12

Li welatê Baskan aştî mimkun e
**BRIAN CURRIN**
▶ R. 14

Faust û sîmyaya kapîtalîst
**BERNARD UMBRECHT**
▶ R. 15

Piştî mirina Usama Bin Ladin, Pakistan
**JEAN-LUC RACINE**
▶ R. 16

Rojnameger Syed Saleem Shahzad
**WENDY KRISTIANASEN**
▶ R. 17

Dewletên Yekbûyî vedigerin Vîetnamê?
**XAVIER MONHÉARD**
▶ R. 18

Li bin sîbera Çînê, dostaniyên Hindistanê
**SAURAV JHA**
▶ R. 19

Cinên Meydana Sor
**JEAN-MARIE CHAUVIER**
▶ R. 20

Di nav sirên sextekarîyên bacê de
**GUILLAUME PITRON**
▶ R. 20

"Pêkve jîyan" wek çekê şerê îdeolojîk
**THOMAS DELTOMBE**
▶ R. 21

"Televîzyona bikalîte" çawa rewşenbîr cezb kirin?
**DOMINIQUE PINSOLLE Û ARNAUD RINDEL**
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23



## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB